

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ**  
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBÎYATA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**



**JİYANA SEYID ‘ELİYÊ FINDIKÎ Û DÎWANA WÎ**

**Muhammed İkbal DENİZ**  
**131302105**

**Şêwirmendê Tezê**  
**Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ**

**ÇEWLÎG – 2017**

T.C.  
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi



SEYİD 'ELİYÊ FINDIKÎ'NİN HAYATI VE  
DİVANI

Muhammed İkbâl DENİZ  
131302105

Tez Danışmanı  
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

BİNGÖL - 2017

## Tez Onay Sayfası İeriđi

Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğüne

Bu alıřma jürimiz tarafından Kürd Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Prof. Dr. Hasan İFTCİ

Üye : Yrd. Do. Dr. Hêmin Omar AHMAD

Üye : Yrd. Do. Dr. Ayhan TEK

Yedek Üye : .....

Yedek Üye : .....

Onay

Yukarıdaki imzaların, adı geen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

İmza  
Prof.Dr. Orhan BAŞARAN  
Enstitü Müdürü

## NAVEROK

<b>NAVEROK</b> .....	<b>I</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>VII</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>VIII</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>IX</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>X</b>
<b>TABLOYÊN TEZÊ Û LÎSTEYA PÊVEKAN</b> .....	<b>XII</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>XIII</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
Girîngî û Armanca Mijarê.....	1
Naverok û Rêbaza Tezê .....	2
Çavkaniyên Tezê .....	3
Rêbaza Lekolîna Helbestên Dîwanê û Amadekirina Ferhengê .....	5

## BEŞA YEKEM

### JIYAN Û BERHEMÊN SEYID ‘ELİYÊ FINDIKÎ

<i>1.1. JIYANA SEYID ELİYÊ FINDIKÎ</i> .....	10
1.1.1. Nav û Mexlesên Wî.....	10
1.1.2. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Wî .....	12
1.1.3. Şecere û Neseba Wî .....	13
1.1.4. Perwerde û Pîşeya Wî.....	14
1.1.5. Zarokên Wî.....	17
1.1.6. Wefata Wî.....	18
<i>1.2. BERHEMÊN SEYID ELİYÊ FINDIKÎ</i> .....	19
<i>1.2.1. Berhemên Wî yên ‘Erebî</i> .....	19
1.2.1.1. <i>Def‘u’ş-Şubuhât fi Neẓmi’t-Turrehât</i> .....	19
1.2.1.2. <i>Hewâşî ‘elâ Tefsîri’l-Qadî el-Beydâwî</i> .....	19
1.2.1.3. <i>Hewâşin ‘elâ Şerhi Dîwani’l-Cezerî</i> .....	19
1.2.1.4. <i>Risâletu’l-Lem‘e fi Î‘âdeti’l-Cum‘e</i> .....	20

1.2.1.5. <i>Risâletun fi Necâti Ebeweyn 'i-Nebî</i> .....	20
1.2.1.6. <i>Risâletun fi Cewâzi Def'i 'z-Zekâti Ilâ Benî Hâşim we'l-Muṭṭelib</i> .....	20
1.2.1.7. <i>Zûlfiqarû 'Elî fi Reqebeti Munkiri 'l-Istimdâdi mine 'n-Nebîyyi ew Welîyyin</i>	21
1.2.2. <i>Berhemên Wî yên Kurdî</i> .....	21
1.2.2.1. <i>Dîwan</i> .....	21

## BEŞA DUYEM

### VEKOLÎNA DÎWANA SEYID 'ELİYÊ FÎNDİKÎ

2.1. <i>Jî ALİYÊ TEŞE Û RUXSARÎ VE</i> .....	22
2.2.1. <i>Taybetiyên Teşeyî</i> .....	22
2.1.1.1. <i>Şiklê Tertîbê</i> .....	22
2.1.1.2. <i>Teşeyên Nezmê (Şiklên Nezmê)</i> .....	22
2.1.1.2.1. <i>Qesîde</i> .....	23
2.1.1.2.2. <i>Mesnewî</i> .....	24
2.1.1.2.3. <i>Ėzel</i> .....	24
2.1.2. <i>Taybetiyên Ruxsarî</i> .....	25
2.1.2.1. <i>Wezna 'Erûzê</i> .....	25
2.1.2.1.1. <i>Imâle</i> .....	26
2.1.2.1.2. <i>Med</i> .....	26
2.1.2.1.3. <i>Zihâf</i> .....	27
2.1.2.1.4. <i>Weşl</i> .....	27
2.1.2.2. <i>Qafiye (Serwa)</i> .....	28
2.1.2.2.1. <i>Cureyên Qafiyeyê</i> .....	29
2.1.2.2.1.1. <i>Ji Aliyê Hejmara Dengê ve Qafiye</i> .....	29
2.1.2.2.1.1.1. <i>Qafiyeya Lawaz</i> .....	29
2.1.2.2.1.1.2. <i>Qafiyeya Asayî</i> .....	29
2.1.2.2.1.1.3. <i>Qafiyeya Zêdebar</i> .....	30

2.1.2.2.1.1.4. Qafiyeya bi Cinâs( Serwaya Regezdozi) .....	30
2.1.2.2.2. Şemaya Qafiyeyê a Teşeyên Nezmê yên Dîwanê.....	31
2.1.2.2.2.1. Qafiyeya Qesîdeyan .....	31
2.1.2.2.2.2. Qafiyeya Mesnewiyan .....	31
2.1.2.2.2.3. Qafiyeya Xezelan .....	32
2.1.2.3. Redîf (Paşserwa) .....	33
2.2. JÎ ALİYÊ ZIMAN Û ŞÊWAZÊ VE .....	34
2.2.1. Ziman .....	34
2.2.1.1. Gotinên Pêşyan.....	35
2.2.1.2. Biwêj.....	38
2.2.1.3. Babdora Zimanên ‘Erebî, Farisî û Tirkî.....	39
2.2.1.3.1. Bandora Zimanê ‘Erebî.....	39
2.2.1.3.1.1. Ayet .....	41
2.2.1.3.2. Bandora Zimanê Farisî.....	41
2.2.1.3.3. Bandora Zimanê Tirkî.....	42
2.2.1.4. Cotpeyv û Dûbarekirina Dengan .....	44
2.2.2. Şêwaz (Uslûb).....	46

### **BEŞA SÊYEM**

#### **ÇEND HUNERÊN BELAĀETÊ JÎ DÎWANA SEYÎD ‘ELİYÊ FINDIKÎ**

3.1. BEYAN.....	50
3.1.1. Teşbîh (Şibandin) .....	50
3.1.1.1. Teşbîha Mufeşşel .....	51
3.1.1.2. Teşbîha Mucmel.....	52
3.1.1.3. Teşbîha Mu’ekked.....	54
3.1.1.4. Teşbîha Belîx.....	54
3.1.2. Isti‘âre .....	55

3.1.2.1. Isti‘âreya Kifşe .....	55
3.1.2.2. Isti‘âreya Nekifşe .....	56
3.1.3. Mecâza Mursel.....	57
3.1.4. Kinâye .....	57
3.1.4.1. Te‘rîz (Te‘rîd).....	58
3.2. BEDÎ‘ .....	59
3.2.1. Hunerên Lefzî .....	59
3.2.1.1. Telmî‘ .....	59
3.2.1.2. ‘Eks .....	59
3.2.1.3. Cinâs (Rêgezdozî).....	60
3.2.1.3.1. Cinâsa Temam .....	60
3.2.1.3.1.1. Cinâsa Sade (Cinâsa Besît) .....	60
3.2.1.3.1.2. Cinâsa Murekkeb.....	61
3.2.1.3.1.2.1. Cinâsa Mefru‘ (Cinâsa Pînekirî) .....	61
3.2.1.3.1.2.2. Cinâsa Nîvî (Cinâsa Nâtemâm) .....	61
3.2.1.3.1.2.1. Cinâsa Lâhik.....	62
3.2.1.3.1.2.2. Cinâsa Noqsan (Cinâsa Naqis) .....	62
3.2.1.3.1.2.2.1. Cinâsa Muterref.....	62
3.2.1.3.1.2.2.2. Cinâsa Muşewweş (Cinâsa Tevlihev) .....	63
3.2.1.3.1.2.2.3. Cinâsa Muherref.....	63
3.2.1.3.1.2.2.4. Cinâsa Xet (Cinâsa Xettî).....	63
3.2.1.3.1.2.2.5. Cinâsa Mukerrer (Cinâsa Muzdewic).....	64
3.2.1.4. Tezmîn .....	64
3.2.1.5. Iqtibâs .....	65
3.2.1.6. Aliterasyon (Hevtîpî).....	65

3.2.1.7. Tersî‘ .....	66
3.2.1.8. İştîqâq .....	66
3.2.1.9. Reddu’l-‘Acûz ‘Ale’s-Sadr.....	67
3.2.1.10. Tekrîr .....	68
3.2.1.11. Irsâla Mesel.....	69
3.2.1.12. Irsâd .....	69
3.2.2. Hunerên Wateyî.....	70
3.2.2.1. Tecâhula ‘Arif .....	70
3.2.2.2. Tenâsûb.....	70
3.2.2.3. Husnu’t-Te’lîl .....	71
3.2.2.4. Telmîh.....	71
3.2.2.5. Leff û Neşr .....	72
3.2.2.6. Muqabele.....	72
3.2.2.7. Tezâd (Dijtî).....	73
3.2.2.8. Sihra Helâl.....	74
3.2.2.9. Tefrîq .....	74
3.2.3. ME‘ANÎ.....	75
3.2.3.1. Nidâ’ .....	75
3.2.3.2. Istifhâm.....	75
3.2.3.3. İltifât.....	76
3.2.3.4. Teşxîs (Kesandin) û Intaq (Peyivandin) .....	77
3.2.3.5. Mubâlexe.....	77
3.2.3.6. Tecrîd.....	78
3.2.3.7. Î‘câz.....	78
3.2.3.8. Pirs û Bersiv.....	79



3.2.3.9. Îhâm .....	79
3.2.3.10. Terdîd .....	80

**BEŞA ÇAREM  
NAVEROK Ê MIJARÊN DÎWANA FINDIKÎ**

4.1. Temayên Helbestên Findikî .....	81
4.1.1. Dostanî .....	81
4.1.2. Tesewif û Zuhd .....	86
4.1.3. Mirin (Wefat) .....	91
4.1.4. Bid'et û Xurafe .....	97
4.1.5. Evîna Mecazî / Beşerî .....	99
4.1.6. Hin Nameyên Taybet Ku Mijarên Cuda Dihewînin .....	102
4.2. Li Gorî Mijarê Cureya Helbestên Dîwanê .....	109
4.2.1. Helbestên Lîrik (Kelecanî) .....	110
4.2.2. Helbestên Dîdaktîk (Şîretamîz) .....	115
4.2.3. Helbestên Satîrîk (Rexneyî/ Tenkîdî) .....	116
<b>ENCAM .....</b>	<b>119</b>
<b>TABLOYÊN TEZÊ .....</b>	<b>121</b>
<b>PÊVEK-1 .....</b>	<b>135</b>
<b>PÊVEK-2 .....</b>	<b>145</b>
<b>PÊVEK-3 .....</b>	<b>146</b>
<b>ÎNDEX .....</b>	<b>147</b>
<b>ÇAVKANÎ .....</b>	<b>153</b>

## KURTE

Seyid ‘Eliyê Findikî, di çarêka dawîn a sedsala XIXan û nivê yekemîn ê sedsala XXan de jiyaye. Wî di zaroktiya xwe de pêşî li cem bavê xwe dersên ewil xwendiyê û piştê jî li hin medreseyan herêma Botan perwerdehiya xwe domandiyê. Findikî îcazetên ‘ilmî jî standiyê û li deverên cuda seydatî kiriye. Xeynî Dîwana wî ya Kurdî 7 heb berhemên wî yên ‘Erebî jî hene ku ji wan 4 heb tenê gihîştine destê me.

Wî, bi vê dîwanê, xwe daye ser şopa helbestvanên klasîk ên berî xwe û berhemekê aniye pê. Dîwan bi giştî ji 792 malikan pêk tê. Ji aliyê teşeyê ve di dîwanê de 9 qesîde, 12 mesnewî û 31 xezel henin.

Di helbestan de wezna ‘erûzê bi serkeftî hatiye tetbîqkirin û hemî helbest ji 4 behrên ‘erûzê (hezec, remel, recez û muteqarib) û bi şeş qalibên wê yên cuda hatine nivîsîn.

Helbestên dîwanê ji aliyê belaxetê ve jî dewlemend in ku ji sê hemanên belaxetê (beyan, bedî‘ ve me‘anî), bi qasî 35-40 hunerên edebî hatine tesbîtkirin.

Findikî di avakirina helbestan de ligel ahengê, zimanekî zelal û fehmbare jî bi kar aniye. Di dîwanê de baweriyên gel, gotinên pêşiyên û xasma jî biwêj pir in. Ji bilî vê di helbestan de bikaranîna şewaza tehkiyeyê jî dide nîşan ku Seyid ‘Eliyê Findikî ji edebiyata gelêrî jî haydar bûye.

**Peyvên Sereke:** Seyid ‘Eliyê Findikî, Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Dîwan, Teşe û Naveroka Dîwanê.

## ÖZET

XIX. yüzyılın son çeyreği ile XX. yüzyılın ilk yarısında yaşamış olan Klasik Kürt Edebiyatı şairlerinden Seyid ‘Eliyê Fındıkî, küçük yaşlarda babasının yanında eğitim görmüş, daha sonra Botan bölgesinin çeşitli medreselerine giderek eğitimine devam etmiştir. İlmî îcazetler alan ve çeşitli yerlerde müderrislik yapan Fındıkî’nin Kürtçe Divanı ve 7 tane de Arapça eseri olduğu; fakat bu eserlerden 4 tanesinin günümüze ulaştığı bilinmektedir.

Klasik Kürt Edebiyatı geleneğinde başarılı şiirler kaleme alan şair, yazdığı Kürtçe Divanıyla kendinden önceki klasik şairleri takip ederek değerli bir eser ortaya koymuştur. Divanda yer alan şiirlerin tamamı 792 beyitten oluşmaktadır. Bu şiirlerin 9 tanesi kaside, 12 tanesi mesnevî ve 31 tanesi de gazel şeklindedir.

Şiirlerde aruz vezni başarılı bir şekilde tatbik edilmiş olup divanda yer alan bütün şiirler aruzun 4 bahrinin (hezec, remel, recez ve mutekarip) farklı altı kalıbıyla yazılmıştır.

Divandaki şiirlerin belâgat açısından da oldukça zengin olduğu görülmüş ve belâgatin üç unsuruna (beyan, bedî‘ ve me‘anî) ait yaklaşık 35-40 edebî sanat tespit edilmiştir.

Fındıkî’nin, şiirlerinde ahengin yanında açık ve anlaşılır bir dil kullandığı görülmektedir. Ayrıca şiirlerinde halk inançlarına, atasözü ve bilhassa deyimlere bolca yer vermesinin yanı sıra tahkiye üslûbunu da kullanmış olması, onun Halk Edebiyatı geleneğine de aşına olduğunu göstermektedir.

**Anahtar Sözcükler:** Seyid ‘Eliyê Fındıkî, Klasik Kürt Edebiyatı, Divan, Divanın Şekil ve Muhtevası.

## ABSTRACT

Seyid ‘Eliyê Findikî, who is one of the classical Kurdish poets lived between the last quarter of the nineteenth century and the first half of the twentieth century, was educated by his father and then went to the other cities of the Botan Region in his childhood. Findikî, who obtained scientific *icazahs* and served as a *mudarris* in the madrasahs, have a diwan and 7 Arabic works but only four of them reached today.

The poet wrote many prospering poems in the tradition of classical Kurdish poetry. He followed the predecessor poets and wrote many invaluable poems. The poems in his diwan consist 792 couplets. 9 of them are odes, 12 of them masnavi and 31 of them are gazelles.

The aruz prosody has been applied successfully and all the poems in the diwan were written with four *bahrs* of *aroz* (*hezec*, *remel*, *rezez* and *mutekarip*) and six diversified patterns.

The poems in the diwan are rich in terms of rhetoric and there are nearly 35-40 literary arts who belong to the three elements of rhetoric; *beyaan*, aesthetic and *meâni*.

The poems of Findikî have harmony and the language is clear and comprehensible. He includes folk beliefs, proverbs and especially idioms in his poetry and narrating style, therefore it can be observed that he is familiar with folk literature.

**Key Words:** Seyid ‘Eliyê Findikî, Classical Kurdish Literature, Diwan, The form and The Content of Diwan

## PÊŞGOTIN

Edebiyata Kurdî ya Klasîk xwedî dîrokeke kevnar e û li gorî dewra xwe jî helbestvan û berhemên nemir derxistine holê. Ji ‘Eliyê Herîrî bigrin hetta ‘Eliyê Findikî gelek helbestvanên klasîk berhemên hêja nivîsîne. Ji bo ku Edebiyata Kurdî baş bê fêmkirin divê ev berhemên klasîk bi vekolîneke xurt bîn vekolîn. Tenê bi lêkolîn û xebatan, em dikarin hay ji çand û dîrok û zimanê xwe hebin. Ji ber vê yekê me jî xwest ku em li ser van berhemên klasîk bixebitin û qîmeta wan bidin nîşanê xwendevan, lêkolîner û wêjenasan.

Di berhemên klasîk de dîwan ciyekî taybet digire. Lewra dîwan, him ji aliyê kemiyetê ve û him jî ji aliyê keyfîyetê ve berhemên din li paş xwe dihêlin. Gelek helbestvanên klasîk xwedî dîwan in û ew dîwan, ji hemî berhemên wî bêhtir edebî bûye û bêhtir şewaz û zimanê wî helbestvanî daye nîşan. Dîwana Seyid ‘Eli jî yek ji wan dîwana ye ku gihîştîye roja îro.

Ev xebata me ya bi navê Jiyana Seyid ‘Eliyê Findikî û *Dîwana Wî*, ji destpêkekê û çar beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de, em bi hurgilî li ser jiyana Findikî û berhemên wî sekinîn. Di beşa duyemîn de jî me cî da teşe û wezna helbestên dîwanê û ziman û şewaza wan. Em di beşa sêyem de li ser çend hunerên belaxetê ku di dîwanê de hatiye bikaranîn rawestiyên û me huneran bi hurgilî dahûrand. Di beşa çarem de jî me mijar û naveroka helbestan diyar kirin.

Dîwana Findikî, heta niha bi vekolîneke akademîk nehatiye vekolîn. Di vê xebatê de çapa şeşem ya dîwanê (*Dîwan*, weş. Nûbihar, ç.6., İstanbul 2012.) hatiye esas girtin. Helbest, him bi tîpên ‘Erebî û him bi tîpên Latînî hatine nivîsîn. Ji ber ku di alfabeya Kurdî ya Latînî de hin herfên ‘Erebî nayêne îfade kirin me ji alfabeya transkîrîpsiyona navneteweyî îstifade kir. Heta ji destê me hat me hemî rêbazên akademîk bikaranîn û dîwan nirxand. Ji ber ku helbest di eslê xwe de bi tîpên ‘Erebî hatine nivîsîn me helbest him bi tîpên ‘Erebî û him jî bi tîpên Latînî dan.

Di amadekirina tezê de me ji hin kesan sûd wergirt. Ji bo vê alikariyê em serî de spasiyên xwe ji malbata xwe re dikin. Piştî em ji bîrazîyê Seyid ‘Eliyê Findikî Mela Said Erzen û xwediyê Weşanxaneyê Nûbaharê Süleyman Çevik re spas dikin ku çî berhem û belgeyên destên wan de hebûn ji me re şandin. Piştî ji bo xwendina

peyvên ‘‘Erebî em ji Mustafa Altunbay re jî gelek spas dikin. Mamoste Şerif G zel, Zafer Aar, Mehmet Aslanoğulları   hei y n ku alikariya me kirine, em spasdare wan in. Mamoste Zahir Ertekin, H min Omar   Ayhan Tek her tim bi alikari   peşniyaz n xwe ve li cem me b n, em spasdare wan in j .

Em spasiy n xwe ji şewirmend  tez  Prof.Dr. Hasan iftci re j  dikin ku ji bo ev diwan baş b  l kol n   danas n, r    r baz n şan  me dan.

**Muhammed İkbal DENİZ**

**EWLİG – 2017**



## TABLOYÊN TEZÊ Û LÎSTEYA PÊVEKAN

<b>TABLO</b>	<b>RÛPEL</b>
<b>Tablo 1:</b> Rêza Qesîdeyên Diwanê û Hejmara Malikan	121
<b>Tablo 2:</b> Rêza Mesnewiyên Diwanê û Hejmara Malikan	122
<b>Tablo 3:</b> Rêza Xêzelên Diwanê û Hejmara Malikan	123
<b>Tablo 5:</b> Behrên ‘Erûzê û Hejmara Helbestên Dîwanê	125
<b>Tablo 6:</b> Tabloya Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan	126
<b>Tablo 7:</b> Redîfên ku di Halê Qertafan de ne	127
<b>Tablo 8:</b> Redîfên ku di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan de ne	128
<b>Tablo 9:</b> Rêz û Lîsteya Biwêjên Dîwanê	129
<b>PÊVEK</b>	
<b>Pêvek 1:</b> Ferheng	135
<b>Pêvek 2:</b> Destxeta Seyid Abdurrehman Erzen	145
<b>Pêvek-3:</b> Wênekê Dîwana Seyid ‘Eliyê Findikî	146

## KURTEBÊJE

a.s.	: ‘Aleyhi’s-Selam
amd.	: Amadekar
b.n.	: Berhema navborî
bnr.	: Binêrin
c.	: Cild
ç.	: Çap
DİA	: Diyanet İslam Ansiklopedisi
h.	: Hicrî
h.b.	: Heman berhem
h.n	: Heman nivîs
h.m.	: Heman meqale
hwd.	: Her wekî din
Hz.	: Hezretî
j.	: Jimare
m.	: Mîladî
r.	: Rûpel
s.	: Sal
s.x.l	: Selama Xwedê li ser be
TDK	: Türk Dil Kurumu
TDV	: Türkiye Diyanet Vakfı
wer.	: Werger
weş.	: Weşanxane



## DESTPÊK

Di edebiyata klasîk de dîwan yek ji berhemên herî girîng e ku hunermendiya helbestvan nîşan dide. Helbestvan ji bo ku huneran bikin, hemî îmkanên zimanê xwe bi kar tînin û bi vê rêyê wê tînine asteke bilind. Dîsa dîwan, ji ber ku ji aliyê teşe û cureyên helbestan ve li ser kevneşopiyekê ye û li gor rêbazekê tê nivîsîn jî pir hêja nin. Ligel van dîwan, heyama ku tê de hatiye nivîsîn jî dide nîşan û bi vî şiklî ew dibe wek neynikeke dîrokê.

Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de heta niha gelek dîwan hatine nivîsîn ku hinek ji wan winda bûne, hinek bi temamî negihêştine îro, hinek hatine çapkirin û li ser hinekan jî lêkolîn hatiye kirin. Heçî dîwanên ku li ser wan lêkolîn û xebat hatine kirin jî zehfên wan ne metodolojîk û zanistî ne. Lê em vê dikarin bêjin; piştî ku li başûr û bakûra Kurdistan hin beşên zimanê Kurdî hatin vekirin xebatên akademîk ên li ser Edebiyata Kurdî ya Klasîk geştir bûn ku ji van xebatan hinekên wan li ser dîwanên Kurmancî ne. Ev xebata me jî yek ji wan xebatan e ku li ser Dîwana Seyid ‘Eliyê Findikî ye.

### Girîngî û Armanca Mijarê

Di Edebiyata Kurdî ya klasîk de dîwan cihekî girîng digire. Dîwan cureyekî berhemên edebiyata klasîk e ku helbestvanê wê; ramanên xwe, hestên xwe, hal û rewşa xwe û halê dewra xwe bi wê tîne ziman. Helbet ku helbestvan wextê dîwanekê “çêdike” wê dîwanê bi qalib, wezn, rê û rêbazekê çêdike. Xeynî wê, ew bi bikaranîna gotin û peyvyan heman demê de hunermendiya xwe jî nîşan dide.

Dîwana Seyid ‘Eliyê Findikî jî yek ji wan dîwanan e. Ev dîwan her çiqas ne murettêb be jî dîsa teşeyên nezmê yê ku herî girîng wek; qesîde, mesnewî û xezelê dihewîne.

Dîwana Findikî ji aliyê naverokê ve jî pir girîng e. Wek hin dîwanên din ji aliyê mijar û temayê ve mehdûd nîne. Mijar û temayên ku hatiye bikaranîn jî rojane ne. Em di helbestan de dibinin ku muxatebên wî him mirovên xas in wek mela û seydayan û him mirovên ‘am in wek gundiyan. Zimanê dîwanê jî zelal û fehmbarek û herikbarek e, loma; ew di nava gel de pir bi rewac bûye û heta hinek beytên berceste jî

hatine jiberkirin. Ji ber van sedeman me xwest ku em vê dîwana navdar -ku 7 caran çap bûye- bi metodeke zanistî baş binirxînin û qîmeta wê nîşanê lêkolîner û gel û wêjenasan bidin.

### **Naverok û Rêbaza Tezê**

Ev xebata me ji destpêk, çar beş û encamekê pêk tê. Di destpêkê de armanç û plana tezê tê ravekirin; derbarê çavkaniyên sereke agahî tê dayin û li ser rêbaza tezê çend made tên rêzkirin.

Di beşa yekemîn de em li ser Jiyan û Berhemên Seyid ‘Eliyê Findikî sekinîn. Li vir, cihê ku Seyid ‘Eliyê Findikî lê bûye û muhîta ku lê jiyaye û perwerdehiya xwe domandiye me tespît kirin. Ligel van me behsa, xelîfetiya wî û îcazeyên ‘ilmî ka li ku sitandiye jî kirin. Di heman beşê de jî me hemî berhemên Findikî bi kurtasî ravekirin.

Me di beşa duyemîn de Dîwana Findikî him ji aliyê teşe û ruxsarî ve û him jî ji aliyê ziman û şêwazê ve vekola. Em pêşî li ser tertîba diwanê sekinîn. Piştê me yek bi yek teşeyên nezmê yên helbestên dîwanê wek qesîde, xezel û mesnewî pênasekirin û nimûneyên wan di dîwanê de tesbît kirin. Ligel van, me ji aliyê ruxsarê ve jî helbest nirxandin. Li vir jî me ji serî heta dawî wezn û qalibên helbestan tesbît kirin. Di binbeşek de jî me amûrên ‘erûzê wek med, imale û zihaf pênasekir û çend mînak ji helbestên dîwanê dan. Xeynî weznê em li ser qafiyeyê û redîfên helbestan jî rawestiyan û me qafiyeya her teşeyê nezmê bi tabloyekê nîşan dan. Redîfên dîwanê jî me yek bi yek tesbît kirin û nivîsîn. Piştê em derbasê ziman û şêwazê bûn. Li vir em li ser ziman û şêwaza Findikî rawestiyan. Me gotinên pêşiyên û biwêj yek bi yek tesbît kirin û him di helbestan de nîşan dan him jî wek lîste rêzkirin. Di binbeşek din de jî me di helbestan de hemanên ‘‘Erebî, Farisî û Tirkî dît û nîşan dan. Piştê me qala şêwaza Findikî kir.

Di beşa sêyem de em li ser hunerên belaxetê (beyan, bedî‘, me‘anî) sekinîn. Me hunerên yek bi yek pênase kirin û ji bo her hunerek me ji dîwanê çend mînan dan. Di encamê de em gihîştine bi qasî 35-40 huneran.

Herwiha di beşa çaremîn de jî me naverok û tema helbestên Findikî bi 6 sernava dabeş kirin. Di binbeşa duyem de jî me behsa cureyên helbestên Findikî kirin.

Di dawîya tezê de me ji bo dîwanê ferhengek amade kir. Me di dîwanê de çî peyv û navên taybet an jî yên ku kêmtên bikaranîn hebûn me li ferhengê kirin.

### Çavkaniyên Tezê

Çavkaniya sereke ya vê xebatê Dîwana Seyid ‘Eliyê Findikî ye ku ji aliyê Weşanxaneyê Nûbiharê ve heta niha 7 caran hatiye çapkirin. Me di vê xebatê de çapa 6an (*Dîwan*, weş. Nûbihar, ç.6., İstanbul 2012.) ku di sala 2012an de çap bûye esas girt. Wexta ku me 2013an de dest bi teza xwe kir hêj çapa heftem çap nebibû û çapên beriya çapa şeşem de jî hin kêmasî hebûn; ji ber vê yekê me jî çapa şeşem esas girt.

Diwan ji 52 helbestan û 331 rûpelan pêk tê. Di dawîya dîwanê de qesîdeyek heye ku Seyid Abdurrahmanê kurê Seyid ‘Eli ji Şêx Seyda re nivîsiye. Ji ber ku ev ne helbesta Seyid ‘Eli ye me ew jî dîwanê nehesiband.

Dîwan him bi tîpen ‘Erebî û him bi tîpên Latînî hatiye çapkirin. Lê xîsusên di nivîsa Latînî de pir kêmasî û xeletî hene. Xeynî vê yekê, di dîwanê de tê dîtin ku hin helbest di eslê xwe de malik in lê weke çarîna hatine tîpguhastin; ev yek jî di tesbîtkirina teşeyên helbestan de hin pirsgirekan derdixist. Ji ber vê yekê me nivîsa ‘Erebî eses girt û bi alîkarîya weznê jî me ev pirsgirek çareser kir.

Ji bilî van em gihîştine gelek çavkaniya ku li ser jîyan û berhemên Seyid ‘Eliyê Findikî hatine nivîsîn. Bêguman yek ji wan çavkaniya, pirtûka *Dünden Bugüne Erzen Ailesi*<sup>1</sup> ye ku ji aliyê biraziyê wî Mela Said Erzen ve hatiye nivîsîn. Me bi vê pirtûka hêja bav û kalê Seyid ‘Eli û şecera wî û eqaribên wî bi hurgilî nas kirin. Xeynî vê pirtûkê dîsa bi wasita Mela Said Erzen em gihîştine destxeta dîwana Seyid ‘Eliyê Findikî û berhemên wî yên ‘Erebî ku hinek hêj çap nebûne û hinek jî bi

---

<sup>1</sup> M.Said, *Dünden Bugüne Erzen Ailesi*, weş. Kilim, ç.1., İstanbul 2007. (Ev berhem ji 255 rûpelan pêk tê.)

navê *Mecmu'atu'r-Resâil*<sup>2</sup> di pirtûkekê de hatine weşandin. Dîsa pirtûkek bi navê *Kulliyât*<sup>3</sup> ku hemî berhemên Seyid 'Eli yên 'Erebî yên heyî di hundirand, me ji wê jî sûdwegirt.

Derbarê mijarê de em rastî pir gotaran jî hatin. Me ji wan gotaran ya Cüneyt Gökçe<sup>4</sup>, Serdar Sabuncu<sup>5</sup> û M. Zahir Ertekin<sup>6</sup> di amadakerina tezê de bikaranî. Tabî xeynî van çavkaniyan em rastî gelekî gotar û nivîsên dinê jî hatin. Lê emê wana yek bi yek di beşa çavkanî yê de bidin.



---

<sup>2</sup> Seyyid Ali Findikî, *Mecmu'atu'r-Resail*, amd. M.Said Erzen, weş. Ravza., İstanbul 2010. (Ev berhem jî 160 rûpelan pêk tê.)

<sup>3</sup> Es-Seyyid 'Eli El-Findikî *Şumme'l-Cezerî, Kulliyât*, amd. M.Said Erzen, 2010. Ev pirtûk weke berhevkarî ye ji 399 rûpelan pêk tê. Di pirtûkê de xeynê her sê rîsaleyên ku di *Mecmu'atu'r-Resailê* de çapbûne, kurtejiyana helbestvan a bi 'Erebî, şecereya wî, haşiyeye wî ya çapnebûyî û 44 heb nameyên taybetên ku pirî wan jî aliyê Seyid 'Eli ve hatine nivîsîn hene.

<sup>4</sup> Cüneyt Gökçe, "Seyyid Ali Findikî ve Divân'ı" *İbrahim Hakkı ve Siirt Uleması Sempozyumu*, weş. Beyan, İstanbul 2008.

<sup>5</sup> Serdar Sabuncu, "Seyda Seyyid Ali Findikî'nin Hayatı ve Tasavvufî Kişiliği", *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, c.8, j.1. Diyarbakır 2016.

<sup>6</sup> M.Zahir Ertekin, "Naveroka Helbestên Seyid'Elîyê Findikî", *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul 2012.

## Rêbaza Lekolîna Helbestên Dîwanê û Amadekirina Ferhengê

Di lêkolîna helbestên dîwanê de ev rêbaz hatin şopandin:

- 1) Ji ber ku dîwan bi metodekê zanistî nehatiye tîpguhestin me di vê tezê de him “*Dîwana Seyid Eliyê Findikî Çapa şeşem (Dîwan, weş. Nûbihar, ç.6., İstanbul 2012)*” û him jî destxeta Abdurrehmanê kurê Seyid ‘Elî esas girt.<sup>7</sup>
- 2) Ji ber ku di alfabeya Kurdî de hin herfên “Erebî nayêne îfadekirin me alfabeya transkirîpsiyona navneteweyî hilbijart:

### Alfabeya Transkirîpsiyonê

Tîp	Deng	Bi Tîpên “Erebî	Bi Tîpên Latînî	Wateya Peyvan Bi Tirkî
آ	a, â	آخر	âxir	son
ا	a	دار	dar	ağaç
	e	ام	em	biz
	i	بهار	bihâr	bahar
	î	ايرو	îro	bugün
ء	’	تتمل	te’emmul	düşünmek
پ	p	پير	pîr	yaşlı (kadınlar ve bitkiler için)
چ	ç	چند	çend	kaç, birkaç
ح	h	حمى	hemî	hepsi
خ	x	خون	xewn	rüya
ذ	z	ذليل	zelîl	alçak, denî
ص	ş	صحبت	şuhbet	sohbet

<sup>7</sup> Destxeta di destê me de ji 158 rûpelan pêk tê. Xeynî helbestên dîwanê, fihrista helbestan û kurtejiyana helbestvan a bi ‘Erebî jî tê de ye. Li gorî vê destxetê, di çapa şeşem de hin xeletî hebûn. Lê ji ber ku mijara me ne ew bû, me wan xeletiyan neda nişan.

ض	d/	ضربو مثل	derb û meşel	atasözü
ط	ṭ	طرس	ṭırs	korku
ظ	ẓ	ظرف	ẓıf	sahte
ع	‘	ساعت	sâ‘et	saat
غ	ġ	غربت	ġurbet	gurbet
ف	v	فخوارن	vexwarin	içmek
ق	q	قلق	qelq	hareket
گ	g	گمان	gumân	şüphe
و	w	وها	wiha	böyle
	u	تو	tu	sen
	û	زو	zû	acele
ه	h	هون	hûn	siz
	e	زیده	zêde	fazla
لا	la	بلا	bila	olsun, peki
	lâ	کلاف	kulâf	pençe
ی	y	یک	yek	bir
	ê	دریژ	dirêj	uzun
	î	مزگین	mizgîn	müjde
‘	Apostrof	بالدوام	bi’d-dewâm	sürekli

3) Ji bo mînakdayina her malikê, me jêrenotê de jimareya rûpela wan da. Bo mînak:

...  
 برا هشیار ببه تازه بنیره  
 ده تو بزانی کی میرکوکه کی میره

Birâ hişyâr bibe tâze binêre

De tu b’zanî kî mêrkok e kî mêr e<sup>8</sup>

<sup>8</sup> Seyid ‘Eliyê Fındikî, *Dîwan*, weş. Nûbihar, ç.6., İstanbul 2012, r. 313.

- 4) Me dawiya tezê de jî ferhenga diwanê nivîsî. Di amadekîra ferhengê de em bi gelemperî li ser peyvên ku kêr tînin bikaranîn rawestiyên. Me peyvên ferhengê weke peyvên helbestan bi transkripsiyonê nivîsî ku peyv xêlet neyên fêmkirin. Bo mînak:

**Ṭavî:** teyrok, zîpik.

**Te‘b:** westîn, betilîn, reht bûn.

**Te‘emmul:** fikirîn, baldayîn

- 5) Me helbest him bi tîpên ‘‘Erebî û him jî bi tîpên Latînî li hemberî hev nivîsîn:

...  
 دخوازن ژ بو وه وصا راحتى  
 كو هون قط نبينن تو جا زحمتى

Dixwâzin ji bo we wişâ **râhetê**

Ku hûn qeṭ nebînin tu câ **zehmetê**<sup>9</sup>

- 6) Di dîwanê de em pir rastî biwêjan hatin û me ew biwêj li gor alfabejê rêz kirin. Ji bo ku biwêj hêsan bê dîtîn jî me rêza helbest û malikên ku biwêj tê de ne nivîsîn:

Rêza Biwêjan	Rêza Helbestan	Rêza Malikan
B'hîle û du‘ezmanî	4	5
B'hostayî xwe j'xelqê biçin	19	16
Bêhnek ji cem camêrekî bê	6	2

- 7) Di helbestan de bêje an kombêjeyên ku di pênaseyê de têtên îfadekirin me stûr nivîsîn. Bo mînak:

Îbareyekê ku di rêzikek an hevokê de ye; mirov dawiya wê bîne serî, serê wê bîne dawî ew huner dibe ‘eks.

<sup>9</sup> Findikî, b.n., r. 295.

...

خوزی وی نه کسی ناسکی نه کس وی

لوی دی بمری کس نگری لسر وی

Xwezî **wî ne kesî** nas kî **ne kes wî**

Li wê dê bîmrî kes negrî li ser wî<sup>10</sup>

- 8) Di helbestan de gotinên ku lizuma ravekirinê dikirin me ew di jêrenotê de rave kirin. Bo mînak:

...

هزاران صلوات و هزاران سلام

ببارن "ولا ينقطع بالتّوام"<sup>11</sup>

Hezârân şelât û hezârân selâm

Bibârin "welâ yenqeî' bi'd-dewâm"<sup>12</sup>

- 9) Helbestên ku me ewila wê nenivîsîbûn me bi sê nuqteyan (...) nîşan dan.

- 10) Di dîwanê de hin helbest hebûn ku pir dirêjbûn. Ji ber vê yekê me wan helbestan kurtvebirî û dawiya wan bi sê nuqteyan (...) nîşan dan.

- 11) Me li gor wezna 'erûzê tîpên dengdêr ên dirêj bi kumik (^)nivîsîn. Bo mînak:

...

ام کتینه ناڤ کلافی قی دنیدا هی هوار

کنگی ام دی در کفن ژ دستی اقی پیرا غدار

Em ketîne nav kulâfê vê dinê **dâ** hey hewâr

Kengî em dê derkevin j' destê evê **pîrâ xedâr**<sup>13</sup>

- 12) Me navê berhemên 'Erebî li gorî xwendina 'Erebî nivîsî be û transkribe kiribe jî lê me li gorî rastnivîsa Kurdî nava bi tîpên mezin û daçek û qertafan jî bi tîpên biçûk nivîsîn:

<sup>10</sup> Findikî, b.n., r. 157.

<sup>11</sup> Bê sekn û aramî dewam bike.

<sup>12</sup> Findikî, b.n., r. 299.

<sup>13</sup> Findikî, b.n., r. 217.



Navê berhema “*Def‘ u’ş-Şubuhât fi Nezmi’t-Turrehât*” ango “*Hewâsi ‘elâ Tefsîri’l-Qađi el-Beydâwî*” em dikarin wek mînak bidin.

13) Di helbestên ‘Erebî de jî me li gorî rastnivîsa ‘Erebî peyv û revakan nivîsîn:

...  
" الا ياايها الاخوان مالى  
فقد مال الى الهجران بالى"<sup>14</sup>

"Elâ yâ eyyuhe’l-ixwânu mâlî  
Fe-qed mâle ile’l-hicrâni bâlî"<sup>15</sup>



---

<sup>14</sup> Ey hevalên min çima dilê min wiha ketiye nav durketinê.

<sup>15</sup> Fîndikî, b.n., r. 57.

## BEŞA YEKEM

### JIYAN Û BERHEMÊN SEYID ‘ELIYÊ FINDIKÎ

Jiyana Seyid ‘Eliyê Findikî ku bi ‘ilm û berhemên qîmetdar ve têr û tijî ye divê baş bê zanîn û ji wan berheman baş bê îstifadekirin. Ji ber vê yekê me di vê beşê de pêşî behsa jiyana Findikî kir piştê em derbasê berhemên wî bûn.

#### 1.1. JIYANA SEYID ELIYÊ FINDIKÎ

Piştî lêkolîneke dûr û dirêj em derbarê jiyana Findikî de gihêştine gelek çavkaniya. Me di çavkaniya de exlebî çend xala tesbitkirin. Emê niha yek bi yek wan xala binivîsin û ravebikin:

##### 1.1.1. Nav û Mexlesên Wî

Di serê dîwanê de helbestvan bi navê xwe destpêdike û herwekî xwe bi xwendevanan dide nasîn:

...  
"علی" رابه حتا کنگی تو غافل بی بقی رنگی  
بشو قلبی ژ فی ژنگی هره ری راست د جعدیدا

"Elî" rabe hetâ kengê tu xâfil bî bi ve rengê  
Bişo qelbî ji ve jengê here rêrâst di ce‘dê dâ<sup>16</sup>

Wek tê dîtin navê helbestvan ‘Elî ye. Lê ji ber hin taybetmendiyên, ew bi hin bernavkan jî tê nasîn.

[...] Ji ber ku li gundê Findikê jidayikbûye bi bernavka Findikî navdar bûye. Ji ber ku neseben bi wasita Hz.Hesen digihêje Pêxember(s.x.l) jî bernavka Seyid lê kirine. Piştî ku perwerdeya xwe ya medreseyê diqedîne û bi usûla medreseyê feqîyan di‘elimîne jî jê re Seyda tê gotin. Seyid ‘Elî di heman demê de îcazeta terîqetê jî

---

<sup>16</sup> Findikî, b.n., r. 17.

sitandiyê ku bi bernavka Şêx hatiye binavkirin. Lê bi vê bernavkê pir nehatiye nasîn[...]<sup>17</sup>

Seyid ‘Eliyê Findikî di helbestên xwe de pirî caran mexlesa ku bi navê xwe musemma ‘Elî; li gel vê kêr caran "Seyid ‘Elî" , "Seyd ‘Elî" û herwiha "' Elî Findikî" jî bikaraniye.

Mexles û navê xwe ne tenê di dawiya helbestê de nivîsiye; di serê helbestê û navenda wî de jî nivîsiye. Wek mînak ku di helbesta sihemîn de şazdeh malik hene û Seyid ‘Elî mexlesa xwe di malika çardehemîn de bikaraniye:

...

ای "علی" پشیا ته دا ریکی هیه گل کی بطرس  
صد امانت من لته دا تو نهچی بی کار و بار

Ey "'Elî" pêşyâ te dâ rêkî heye gelkî bi tîrs  
Şed emânet min li te dâ tu neçî bêkâr û bâr<sup>18</sup>

...

Helbestvan, caran jî bernavka seyide û navê xwe dide ber hev û ji xwe re mexles çêdike. Bo mînak:

...

"سید علی" نیژه دزانم چندی لفظی خونندی  
شبهی امثالان کو مشغولن بعلمی قیل وقال

"Seyid ‘Elî" nebje dizânim çendî lefzê xwendinê  
Şubhê emşâlân ku meşxûl in bi ‘ilmê qîl û qâl<sup>19</sup>

Hin caran jî mexlesa xwe nîsbetê navê gundê xwe dike. Bo mînak:

...

بده خاطری وان "علی فندکی"  
بگلکی قبول که ژ وی هندکی

---

<sup>17</sup>,Sabuncu, h.m., r.76

<sup>18</sup> Findikî, b.n., r. 221.

<sup>19</sup> Findikî, b.n., r. 93.

Bide xâtirê wan "Elî Findikî"

Bi gelkî qebûl ke ji wî hindikî<sup>20</sup>

Em dizanin ku Seyid 'Elî xeynî nav û mexles û bernavkên xwe bi paşnavê jî hatiye nasîn. Ji ber ku di sala 1934 an de qanûna paşnava derket paşnava Seyid 'Elî jî wek "Erzen" hatiye binavkirin. Di despêka dîwanê wiha behsa vê mijarê tê kirin:

[...]Dema ku Tataran<sup>21</sup> bi ser Beşdayê de girtin û işxal kirin, kalikên Seyid 'Elî koç kirin, hatin li Erzenê bi cih bûn. Niha ji Erzenê<sup>22</sup> re dibêjin "Xirabbajar". Ev gund dikeve navbera Misircê<sup>23</sup> û Qubînê<sup>24</sup>. Piştî demekê jî ji Erzen re "Xerzen" hatiye gotin. Dema ku qanûna paşnavan derket, mezinên wê heremê ji vê malbatê re paşnava "Erzen" hilbijartine da ku ev nav neyê jibîrkirin[...]<sup>25</sup>

Îro hêj jî ji bo nesla Seyid 'Eliyê Findikî û malbata wî wek ku me li jor jî got paşnava "Erzen" tê bikaranîn.

### 1.1.2. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Wî

Seyid 'Eliyê Findikî, di sala h.1309 (m.1892) de li nahiya Findikê<sup>26</sup> hatiye dinê. Navê dîya wî Mirarî Xanim û navê bavê wî Seyid Silêman e. Bavê wî jî alimek mezin bûye. Di malbata Findikî de pênc zaro hebûne ku Findikî zarokê duyem e.

Wek ku me li jorê jî got, kalikên Seyid 'Elî pêşî li Beşdayê bûne. Lê dema ku Tataran Beşda işxal kirin, kalikên Seyid 'Elî, meşhûr Molla Hesên el-Xetîbê kurê Seyid İbrahîm bi awayekî bi herdu zarên xwe yê bi navê Şêx 'Umer û Seyid Evdillah re koçê Anadolê dikan. Pêşî tî Erzenê û piştê jî ji êrişa Tataran direvin diçin nahiya

---

<sup>20</sup> Findikî, b.n., r. 243.

<sup>21</sup> Moxol.

<sup>22</sup> Erzen/Garzan/Xerzan: Nahiyekê Misircê (Kurtalan) ye ku îro jê re Yanarsu tê gotin.

<sup>23</sup> Misirc: Qezayekê Sêrtî ye ku bi Tirkî jê re Kurtalan tê gotin.

<sup>24</sup> Qubîn: Qezayekê Êlihê (Batman) ye ku bi Tirkî jê re Beşiri tê gotin.

<sup>25</sup> Findikî, b.n., r. 7.

<sup>26</sup> Findik: Berê nahiyekê Dihê(Eruh) bûye. Lê îro bûye gundekî Güçlükönakê ya ku qeza Şirmexê ye. Findik, bi kurmancî tê wateya fenerê. Demên berê ji bo ku rêwî rêya xwe bibînin her tim li ser tepeke gund fenerek (find) dihat vexistin. Ji ber vê yekê karwanan navê Findik lê wî gundê kirine.

Findikê û li wir dibine mêvan. Ji ber ku melayê wî nahiyê tune bûye, gelê nahiyê melatî teklifê wan herdu birayan dikan. Ew qebûl dikan û dibine melayê wê nahiyê. Herdu bira li wir cih dibin û dizewicin. Piştî demekê bi navê Şêx Hesên û Seyid Îbrahîm du kurê şêx ‘Umer tê dinê. Seyid Îbrahîm re jî bi navê Seyid Silêman û Seyid Seid du kurê çêdibin. Va Seyid ‘Elî kurê vî Seyid Silêmanê ye.<sup>27</sup>

Seyid ‘Elî, zaroktîya xwe li Findikê derbas kiriye. Piştîre jî bo tehsîla ‘ilmê ji Findikê derketiye û çûye hin gundan û bajêran. Di axiriya emrê xwe de jî li gundê Cinibir<sup>28</sup> ê jîyaye.

### 1.1.3. Şecere û Neseba Wî

Seyid ‘Elî ji pênc kurên Seyid Silêman ê duyemîn e. Neseba wî bi wasita Hz. Hesên digihêje Hz. ‘Elî. Em vê sîlsîleyê dikarin wiha rêz bikin:

1-Seyid ‘Elî, 2-Seyid Silêman, 3-Seyid Îbrahîm, 4-Seyid ‘Umer (ji Sêrtê) 5-Seyid Mela Hesên el-Xetîb, 6-Seyid Îbrahîm (ji Erzenê), 7-Seyid ‘Umer, 8-Seyid ‘Elî, 9- Seyid Hesên el-Cunî, 10-Şêx Mihemed, 11- Şêx Kemal, 12-Şêx Hesên el-Cunî, 13- Şêx Ehmed, 14- Şêx Mihemed, 15- Şêx ‘Alemuddîn, 16- Şêx ‘Îzuddîn, 17- Şêx Siraceddîn, 18- Şêx Necmeddîn, 19- Şêx Şemseddîn, 20- Şêx Nasreddîn, 21- Şêx Şehabeddîn, 22- Şêx Salih Zeynel‘abidîn, 23- Şêx Ferecullah, 24- Şêx Nasrullah, 25- Şêx ‘Evdillah, 26- Şêx Taceddîn Ehmed, 27- Cemaleddîn Yusif, 28-Şêx ‘Alemuddîn, 29-Celaleddîn ‘Elî, 30- Şêx Îmameddîn Hesên, 31- Şêx Îsak, 32- Şêx Îbrahîm, 33- Şêx ‘Evdilqadir Geylanî, 34- Ebu Salih Seyyid Musa Cengîdost, 35- ‘Evdillah, 36- Yehya ez-Zahid, 37-Mihemed, 38-Dawid, 39-Mûsa-II, 40- Evdillah-II, 41- Mûsa el-Cunî, 42- ‘Evdillah el-Mahd, 43- Hesên el-Musenna, 44- Hz.Hesên, 45- Hz. ‘Elî.<sup>29</sup>

---

<sup>27</sup> M.Said, *Dünden Bugüne Erzen Ailesi*, weş. Kilim, İstanbul 2007. r. 27.

<sup>28</sup> Cinibir: Gundekî Cizîrê ye ku îro jê re Yeşilyurt tê gotin.

<sup>29</sup> Erzen, b.n., r. 14, 250.

Seyid ‘Elî di malikeke xwe de ji ber ku ji nesla Hz. ‘Elî ye şîkrê Xwedê dike:

...

هزار حمد و ثناری ژ فی حالی  
کو باپیری منه او "شیری کرار"

Hezâr hemd û şenâ Rebbî j'vî hâlî  
Ku bapîrê min e ew "Şêrê Kerrâr"<sup>30</sup>

Dîsa di malikeke xwe de behsa lehengiya Hz. ‘Elî dike û dibêje ku ew ceddê  
te be qet ji kesekî netirse:

...

ای سید علی نبی نبی طرسا ته قطژ کسکی هبی  
"امام علی" جدی ته بی گرت دستکی دربی خیبری

Ey Seyd ‘Elî nebî nebî tîrsâ te qet j'keskî hebî  
"Îmâm ‘Elî" ceddê te bî girt destki deryê Xeyberê<sup>31</sup>

Di malika li jêr de jî dîsa xwe nisbetê Hz. ‘Elî dike û behsa nav û nîşana wî  
dike:

...

خدا بگره هرا ویرا نه برده  
نه طرسه جدی ته "خوی ذوالفقار"

Xudâ bigre hirâ-wêrâ neberde  
Neîirse ceddê te "Xweyzulfeqâr"<sup>32</sup>

#### 1.1.4. Perwerde û Pîşeya Wî

Seyid ‘Elî, zaroktîya xwe li Findikê derbas kiriye, pêşî li cem bavê xwe  
xwendiyê. Piştê jî Findikê derketiye û çûye gundê Harûnan. Li cem alimên wî gundî  
dersa serf û nehwe xwendiyê. Findikî li wir qederekê feqîti dike û piştê li gundê

---

<sup>30</sup> Findikî, b.n., r. 311.

<sup>31</sup> Findikî, b.n., r. 239.

<sup>32</sup> Findikî, b.n., r. 235.

Bafê<sup>33</sup>, li cem Mela Îsmaîl, li navçeya Kercosê<sup>34</sup> li cem Mela Necmeddîn, li navçeya Beşiriyê<sup>35</sup> li cem Mela Îbrahîmê Korikî<sup>36</sup> dixwîne. Piştî Seyid ‘Elî diçe Farqînê<sup>37</sup> û di Medreseya Behlul Beg<sup>38</sup> de li cem Miftî Seyid ‘Evdîrrehman, Mela Huseynê Kîçîk, Melâ Yaqûb û Mela Hamid heft salan ‘ilm tehsîl dîke û kitêbên ku di medreseyan de tê xwendin hemî diqedîne. Piştî jî îcaza xwe ji apê xwe yê Miftî Seyid ‘Evdîrrehman distîne.<sup>39</sup>

Seyid ‘Elî xeynî zimanê ‘‘Erebî meyla wî li ser zimanê Farisî jî hebû. Ji ber ku dersa farisî bi‘elime diçe cem Hecî Fettahê Hezroyî<sup>40</sup>. Him jî Hecî Fettah dersa farisî hildide û him jî dersa feraîzê<sup>41</sup> fêrî wî dîke.

Piştî ku vegeziyaye Findikê, demekê li cem apê bavê xwe Şêx Hesenê Findikî xwendiyê û him îcazeyek ‘ilmî jî wî standiyê him jî bûye zavê wî. Ev îcazeya ku ji Şêx Hesenê Findikî sitandiyê ji aliyê hukûmetê ve tehsîla mezin hatiye qebûl kirin û leşkerî nekiriye.<sup>42</sup>

Seyid ‘Elî piştî ku medrese qedandiyê îdî him li gundan melatî kiriye û dersa feqîyan daye û him jî ji fetwayên hemî herêma Findikê berpirsiyar bûye. Herwiha Findik bûye navenda ‘ilm û ‘îrfanê. Piştî li ser daxwaza axayên gundê Guvinan<sup>43</sup> Seyid ‘Elî û birayê xwe yê Seyid Mecîd li gundê Guvinan melatî dîkin. Piştê demekê axayên gund jî li cem wan dixwînin û ji bo î‘aşeya feqîyan dibin alîkar.

Yek ji gundên heremê jî gundê Senatî ye ku li ser teklîfa Şêx ‘Evdîllahê kurê Şêx Mihemed Nûrîye Dêrşewî, muddetekê li wir dersa feqîyan daye.<sup>44</sup>

Di sala 1927 an de Şêx Seydayê Cizîrê<sup>45</sup>, ji bo ders dayînê, wî dawetê gundê xwe kiriye û Seyid ‘Elî demekê dirêj li gundê Serdehlê<sup>46</sup> dersa feqî û zarokên mala

<sup>33</sup> Bafê: Gundekî Îdil a navçeya Şîrnexê ye ku bi Tirkî jê re Sulak tê gotin.

<sup>34</sup> Kercews an jî Kercos (bi Tirkî, Gercüş) bajarok û navçeyeke Batmanê ye.

<sup>35</sup> Beşîrî: Navçeyeke Batmanê ye ku bi Kurdî jê re Qubîn tê gotin.

<sup>36</sup> Korik: Gundekî navçeya Beşîrî ye.

<sup>37</sup> Farqîn: Navçeyeke Amedê ye ku bi Tirkî jê re Silvan tê gotin.

<sup>38</sup> Ji bo agahiyên zêdetir bnr. <http://www.silvanresimleri.com/silvan/id6.htm> (02.12.2016)

<sup>39</sup> Findikî, b.n., r. 7.

<sup>40</sup> Hazro: Navçeyeke Amedê ye.

<sup>41</sup> Ferâiz: Çaxeke ‘ilmê Îslamî ye ku li ser hiqûqa mirasa Îslamê disekine. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Ali Bardakoğlu, “Ferâiz” *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c.12, weş. TDV, İstanbul 1995.

<sup>42</sup> Findikî, b.n., r. 7.

<sup>43</sup> Guvinan: Gundekî Bâsa(Güçlükonak) ya navçeya Şîrnexê ye. 10 km durê Findikê ye.

<sup>44</sup> Serdar Sabuncu, h.m., r. 79.

Şêx Seyda daye. Mela Said Erzen di nivîsa xwe ya bi navê “Seyid Ali Findiki’nin Hayatı, Tasavvuf Anlayışı ve İlim Cepheleri” de dibê je ku ji wan feqîyan gelek alimên meşhur derketine.

Seyid ‘Elî herî dawî bi xwesteka ehlê gundê Cinibrê, destur ji Seydayê xwe distîne û dibe melayê Cinibrê. Findikî 25 salan li Cinibrê maye; ders daye û bi fetwayan meşxûl bûye. Ji ber ku Cinibir tenê sa’etek durê Serdehlê (gundê Şêx Seyda) bûye jî ev yek têkiliya navbera Seyid ‘Elî û Şêx Seyda zêde kêmkirîye. Seyid ‘Elî, heman demê de xelîfeyê Şêx Seyda jî bûye. Lewra jê him îcaza ‘ilmê him jî îcaza xelîfetiye standiye. Seyid ‘Elî ji Şêx Îbrahîm Heqîyê<sup>47</sup> Basretî<sup>48</sup> jî îcaza xelîfetiye standiye.<sup>49</sup>

Seyid ‘Elî, xeynî ‘ilmê dînî û tesewîfî di ‘ilmê edebî de jî asteke bilind de bû. Lewra qasê ku dîwakê edebî û giran çêbike ji edebiyatê, helbestê û belaxetê jî haydar e. Xisusen qesîdêyên wî di nava xelqê de gelekî bi qîmet in û gelekî jî belav bûne.

---

<sup>45</sup> Şêx Seyda di sala 1890î de li Cizîrê hatiye dinyayê. Bavê wî Şêx Umerê Zenganî piştî jidayikbûna Şêx Seyda bi şeş mehan di vegera ji hecê de li Ciddeyê wefat kiriye. Şêx Seyda xwendina pêşî li cem xalê xwe û postnişînê piştî bavê wî Şêx Ebdulhakîmê Dêrşewî kiriye. Piştî wefata xalê wî (1905) ‘ilmê xwe li cem birayê xwe yê Şêx Sîraceddîn xilas kiriye û ji wî îcazet standiye. Piştê wefata Şêx Sîraceddîn (1920) jî muderrîstiya medreseyê ketiye ser milê wî. Şêx Seyda wê demê îcazeyên pêşî dane Mela Silêmanê Hoserî û Mela Remezhan Botî. Ev îcaze teberûkên bi muhira postnişînê wê demê Şêx Mihemed Nûrîyê Dêrşewî hatine mohrkirin. Di wê demê de Şêx Mihemed Nûrî xelîfetiya terîqetê daye Şêx Seyda û piştî ku wefat kiriye (1924) Şêx Seyda bûye postnişîn. Piştî ku Komara Tirkîyeyê ava bûye û bûyera Şêx Se‘îd (1925) qewimiye û dergâh hatine girtin (1926) û Şêx Seyda jî wekî gelek şêxên dî ji welatê xwe bazdane û li Mûsilê bicih bûne. Piştî sê salan (1928) ku demên dawî li Şamê derbas bûbûn, Şêx Seyda vegeriya Cizîrê. Piştî vegera xwe zivistanan li Cizîrê û havînan li Serdehlê (carna li Hebler, Bişîr û Îzarê) benavber xebatên terîqetê domandiye. Şêx Seyda, ji Antaqya heta bi Qersê bi tevahî 33 xelîfe rakirine. Yek ji wan xelîfeyan jî Seyid ‘Eliyê Findikî bû.

<sup>46</sup> Serdehl: Gundekî Cizîrê ye ku bi Tirkî jê re Bağlarbaşı tê gotin.

<sup>47</sup> Şêx Îbrahîm Heqî: Şêxê terîqeta neqşibendîyê ye û di sala h. 1299/m. 1881 li gundê Basretê (İnceler) ku vabestê bajarê Şîrnexê ye jidayikbûye. Piştî Komara Tirkîyê koçê Sûriye dîke û li gundên Hilwe û Heddadê ku vabestê navçeya Qamişlo ne de îqamet dîke. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Serdar Sabuncu, h.m., r. 89.

<sup>48</sup> Basret: Gundekî Şîrnexê ye ku bi Tirkî jê re İnceler tê gotin. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Serdar Sabuncu, h.m., r. 89.

<sup>49</sup> M. Said Erzen, agahiyên ku derbarê Seyid ‘Eliyê Findikî de bi navê *Seyid Ali Findiki’nin Hayatı, Tasavvuf Anlayışı ve İlim Cepheleri* ku qasî 5 rûpela nivîsîbû da min. (19.10.2016) Ev agahî û gelek agahiyên din jî dîsa min ji vê nivîsê wergirtin.



### 1.1.5. Zarokên Wî

Seyid ‘Elî bi keça Şêx Hesenê Findikî re zewiciye. Sê kur û du keçên wî têne dinê. Kurê wî yê mezin Seyid Abdurrahman Erzen di sala 1929 de li Findikê hatiye dinê. Ji ber ku li Cizîrê mekteb tune bûye wî nexwendiyê. Li cem bavê xwe tehsîla ‘îlmê kiriye û îcaze standiyê. Ji ber ku meyla wî li ser nivîsa ‘Erebî hebûye li Cizîrê li cem Hecî Selîmê Xettat nivîsa destxetê hîndibe û dibe xettat. Demekê katibî ya Şêx Seyda kiriye. Jixwe Dîwana Seyid ‘Eliyê Findikî jî yekem car bi destxeta Seyid Abdurrahman Erzen hatiye nivîsîn. Niha li cem me him destxeta dîwanê him jî hin destxetên wî yên din mewcûd e. Seba ku diploma dibistanê bistîne li Mêrdînê dikeve îmtihanan û diploma xwe distîne. Dîploma xwe ya dibistana navîn û lîseyê jî li Amedê bi heman rewşê distîne. Li Cizîrê îmtihana melatîyê qezencdike û li amedê melatî dike. Demekê dirêj li cem Miftî Mahmut Bilge katibî dike. Piştê li Enqerê dikeve îmtihana miftîyê qezenc dike. Salek li Şîrnexê dibe miftî û piştê derbasê Cizîrê dibe û li wir bist sala miftîyê dike. Çar kur û sê keçên wî hene.<sup>50</sup>

Seyid Abdurrahman di sala 1986 an de ji tengejeya dilî wefat kiriye û li nêzî tirba bavê wî hatiye defîn kirin. Li ser kêlikê qebra wî ev malika bavê wî hatiye neqîşandin:

...  
مکه خانى اڤى خانى بنیره حالى دورانى  
محمد م مصطفى كانى هما قط ام دريژ ناكى

Meke xânî evê xânê binêre hâlê dewrânê  
Muḥemmed Mustefâ kânê hemâ qet em dirêj nâkî<sup>51</sup>

Kurê wî yê navîn Mesûm di temenekî biçûk de li gundê Cinibirê di sala 1950an de wefat kiriye.

Kurê wî yê herî biçûk Mehmet Baba jî di sala 1941an de li Findikê jidayikbûye û di medreseyan de xwendiyê. Demek dirêj melatî kiriye û piştê di sala 2000an de li Cizîrê wefat kiriye. Şeş kur û çar keçên wî hene.

---

<sup>50</sup> Me van agahiyan ji nivîsa Mela Said Erzen wergirtin.

<sup>51</sup> Findikî, b.n., r. 29.

Bi navên Zeyneb û Fatma du heb jî kêçên Seyid ‘Eliyê Findikî hene. Îro keça wî ya Zeyneb li Sêrtî medfûn e. Keça wî ya din Fatma jî li Cizîrê ye.<sup>52</sup>

### 1.1.6. Wefata Wî

Seyid ‘Elî di axiriya ‘emrê xwe de li gundê Cinibirê nexweş ketiye û qismî felc bûye. Piştî li mala kurê xwe yê Miftî Abdurrehman Erzen tedawîya wî hatiye domandin. 1ê Adarê sala 1968 an roja îne wî wefat dîke. Li Cizîrê, li cem Tirba Şêx Seyda li Taxa Qelê hatiye defîn kirin.<sup>53</sup>

Li ser tirba Seyid ‘Elî, ev beyta wî ya navdar hatiye nivîsîn:

...  
د دنیای هچی رابی فقیر و شیخ و آغابی  
ژ بر مرئی خلاص نابی د شرق و هم د غربیدا

Di dinyâyê heçî râbê feqîr û şeyx û âxâ bê  
Ji ber mirnê xilâs nâbê di şerq û hem di xerbê dâ<sup>54</sup>

---

<sup>52</sup> Gökçe, h.m., r. 481.

<sup>53</sup> Gökçe, h.m., r. 480.

<sup>54</sup> Findikî, b.n., r. 19.

## **1.2. BERHEMÊN SEYID ELIYÊ FINDIKÎ**

Findikî bi du zimanan berhemên cihêreng nivîsîne. Ji bo ku danasîna van berheman bi rêkûpêk be, emê van berheman li gorî zimanên wan di bin du serenavan de dabeş bikin:

### **1.2.1. Berhemên Wî yên ‘Erebî**

#### **1.2.1.1. Def ‘u’ş-Şubuhât fi Nezmi’t-Turrehât**

Li ser fikr û ramanê ye û bi zimanê ‘Erebî hatiye nivîsîn. Berhem, hemberê Wehabiya weke reddiyekî ye. “Ji ber ku Wehabî bi tundî hemberê têgiha tesewifê dertên û her derfetê de êrişê mutesewwifa dikin, Seyid ‘Elî vê berhemê ji wan re wek reddiye nivîsiye.”<sup>55</sup>

Biraziyê Seyid ‘Elî, Said Erzen jî dibêje ku ev berhem ji bo gumanên navbera ‘alima îzale bike ji wan re weke bersiv hatiye nivîsîn. Said Erzen dibêje ji ber ku ev berhem di destê me de tune ye nehatiye çapkirin.<sup>56</sup>

#### **1.2.1.2. Hewâşî ‘elâ Tefsîri’l-Qadî el-Beydâwî<sup>57</sup>**

Ev berhem ji haşiyeyên ku li ser Tefsîra Qadî el-Beyzawî hatîye nivîsîn ve pêk tên. Di berhême de 7 sureyên Qurana Pîroz hatine tefsir kirin. Di despêkê de ji Sureya Tewbê despêdike û bi Sureya Yunus (a.s.), Sureya Hûd (a.s.), Sureya Yusuf (a.s.), Sureya R’ed û Sureya Îbrahîm (a.s.) didome û bi Sureya Hicrê jî diqede.

Berhem di destê me de heye lê hêj wek pirtûkeke musteqîl nehatiye çapkirin.

#### **1.2.1.3. Hewâşîn ‘elâ Şerhi Dîwani’l-Cezerî**

Ev berhem ji hinek îzahatên ku li ser dîwana Melayê Cizîrî hatine nivîsîn ve pêk tê. Lê ev berhem îro di destê me de tune ye.<sup>58</sup>

---

<sup>55</sup> Sabuncu, h.m., r. 82.

<sup>56</sup> Erzen, h.n., r. 4.

<sup>57</sup> Ev berhem ji 42 rûpelan pêk tê û di *Kulliyâtê* de ji rûpela 318 destpêdike û di 360an de diqede.

<sup>58</sup> Erzen, h.n., r. 4.

#### **1.2.1.4. Risâletu'l-Lem'e fi Î'âdefî'l-Cum'e**

Ev kitêbekê fiqhê ye ku behsa î'adeya nimêja îne dîke. Li gorî mezheba şafîî piştî nimêja îne kirina nimaja nîvro bi cema'etî dîke.<sup>59</sup> Xeynî vê mijarê, di berhemê behsa hinek mijarên cuda jî tê kirin.

Di risaleyê de pêşgotinek û 5 beş henin. Ev risale di *Mecmû'atu'r-Resâil* ê de risaleya duyem e ku di navbera rûpelên 71an û 169an de ye.<sup>60</sup>

#### **1.2.1.5. Risâletun fi Necâti Ebeweyn'i-Nebî**

Ev berhem li ser î'tiqad û siyerê ye. Behsa dê û bavê Pêxember (s.x.l) dîke ku li ser ola musulmanî wefat kirine.

“Rîsale li ser fikra Wehabiya wek reddiye hatiye nivîsîn ku ew dibêjin dê û bavê Pêxember (s.x.l) di cenhemê de ne. Lê Seyid 'Elî dijberê vê fikrê derdikeve û dibêje ku ebeweynê Pêxember (s.x.l) dîkeve nav beşa yê ku nehatine teklîfkirin, ji ber vê yekê jî ew ehlê necat in.”<sup>61</sup> Ev risale di destê me de tune ye.

#### **1.2.1.6. Risâletun fi Cewâzi Def'i'z-Zekâti Ilâ Benî Hâşim we'l-Muţţelib**

Navekî berhemê jî “*El-Insâf fi Cewâzi'z-Zekati ile'l-Eşrâf*” e. Di *Mecmû'atu'r-Resâil*ê de risaleya sêyem e. Ji rûpela 131 ê destpêdîke û di rûpela 160an de diqede.<sup>62</sup> Behem ji 4 beşan û xatîmeyek û tenbîhek pêk hatiye.

Berhem ji aliyê naverokê ve li ser mebhesa dayina zekatê di gel eşrafâ dîke. Dibêje piştî hilweşandina dewleta Îslamî ku waridata Seyid û Şerifan hat birîn ji ber vê yekê caîze ku mirov zekatê bide wan.<sup>63</sup>

---

<sup>59</sup> Recep Özdirek, “Cumhuriyet Dönemi Cizre Bölgesi Din Âlimleri”, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul 2012, r. 712.

<sup>60</sup> Ev risale di *Kulliyatê* de jî ji rûpela 125an destpêdîke û di rûpela 193an de diqede.

<sup>61</sup> Şaban Karasakal, “Seyyid Ali Findikî ve Kâdî Beydâvî'ye Haşiyeleri”, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul 2012, r.310.

<sup>62</sup> Ev risale di *Kulliyatê* de jî ji rûpela 86an destpêdîke û di rûpela 124an de diqede.

<sup>63</sup> Özdirek, h.m., r. 712.

### **1.2.1.7. Zûlfiqarû ‘Elî fî Reqebeti Munkiri’l-Istimdâdî mine’n-Nebîyyi ew Welîyyin**

*Mecmu’atu’r-Resâilê* de risaleya yekem e. Risale ji rûpela 9an destpêdike û di rûpela 63an de diqede. Ji ber ku Wehabî hewarxwestina ji nebî û welî ya wek kufir û şîrk dihesibînin, Seyid ‘Eliyê Findikî jî vê risaleyê hemberê fikra wan wek reddiyekê nivîsiye.<sup>64</sup>

## **1.2.2. Berhemên Wî yên Kurdî**

### **1.2.2.1. Dîwan**

Seyid ‘Eliyê Findikî, xeynî kitêbên xweyên ‘Erebî kitêbeke Kurdî jî nivîsiye ku ew jî dîwana wî ya meşhur e. Ev dîwan ji ber ku zewqeke edebî di xwe de dihevine û zimanê wê Kurdî ye û hêsan e û exlebî li ser meseleyên mirovahî yên ku herkesê têkildar dike sekiniye, ji aliyê gel ve gelek hatiye xwendin.

Dîwan, ji aliyê kurê wî yê Seyid Abdurrahman Erzen ve pêşî weke destxet hatiye nivîsîn ku di vê destxetê de 51 helbest hene. 2 helbest bi ‘Erebî, helbestek farisî û 49 heb helbest jî bi Kurdî hatine nivîsîn. Helbesteke dîwanê jî piştî demekê hatiye dîtin û ji aliyê weşanxaneyê Nûbiharê ve tevê helbestên din hatiye weşandin. Çapa ku di destê me de ye jî ji 52 helbestan pêk hatiye. (*Dîwan*, weş. Nûbihar, ç.6., İstanbul 2012)

[...]Dîwana Seyid ‘Eliyê Findikî di nav weşangeriya Kurdî de cihekî xwe yê taybet heye. Lewre di demeke zû de hate çapkirin û ji ber tewecuha zêde di demek kurt de gelek caran hate çapkirin: (Çapa yekem Temûz 1999, Çapa duyem Adar 2000, Çapa sêyem Çileyê Paşîn 2004, Çapa çarem 2010)[...] <sup>65</sup>

Çapa pêncem 2011an, Çapa şeşem di sala 2012an û Çapa heftem jî di sala 2014an de çap bûye.

Lî gorî gotina Mela Said Erzen, çapa dîwanê a heştem jî li ber çapê ye. <sup>66</sup>

---

<sup>64</sup> Özdirek, h.m., r. 712.

<sup>65</sup> Adak, h.m., r. 475.

<sup>66</sup> M.İkbal Deniz: “Hevpeyvîn: Mela Said Erzen”, 19.10.2016, Stenbol.

## BEŞA DUYEM

### VEKOLÎNA DÎWANA SEYID ‘ELİYÊ FİNDİKÎ

#### 2.1. JÎ ALİYÊ TEŞE Û RUXSARÎ VE

##### 2.2.1. Taybetiyên Teşeyî

###### 2.1.1.1. Şiklê Tertîbê

Dîwana Seyid ‘Eliyê Findikî ji 331 rûpelan pêk tê. Di dîwanê de bi tevahî 52 helbest hene ku ji 792 malikan pêk tê. Findikî, di helbestên xwe de wek pîrî helbestvanên klasîk li ser rêza tîpên ‘Erebî neçûye. Wek mînak, di helbesta xwe ya yekem de her çiqas bi elfê ( ا ) dest pê kiribe jî bi tîpa yê ( ع ) dewam kirîye. (bnr. Tablo 1) Findikî tenê bi tîpên ا (a, ı), ر (r), ف (f), ل (l), م (m), ن (n) • (h,e), لا (la) û ي (y, î, ê) qafîye çêkirine. Dibe ku Findikî helbestên xwe exlebî ji bo ferbûna gel û şîretan nivîsîye; pir li ser vê rêzê neçûye û bêhtir giringî daye peyamâ helbestan.

Li gor rêbaza dîwaneke muretteb divê rêza teşeyên nezmê wiha be: qesîde, musemmet, xezel û qit’e.<sup>67</sup> Lê di Dîwana Findikî de ev rêza jî nehatiye şopandin. Di dîwanê de rêzeke mu‘eyyen ji bo qesîde, xezel û mesnewiyê tune ye. (bnr. Tablo 1, 2, 3, ) Ji ber vê yekê li gorî destxetên dîwanê jî em dikarin bêjin ku Dîwana Findikî ne muretteb (xeyrê muretteb) e.

###### 2.1.1.2. Teşeyên Nezmê (Şiklên Nezmê)

Di vê beşê de em li ser teşeyên nezmê sekinîn. Di Dîwana Findikî de teşeyên nezmê û hejmara wan wiha ne: 9 qesîde, 12 mesnewî û 31 xezel. Herwiha em dibînin ku helbestvan tenê bi van her sê cureyên nezmê helbest nivîsîne. Emê niha yek bi yek li ser van teşeyên nezmê bisekinin.

---

<sup>67</sup> İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Akçağ, Çap.3., Ankara 1995, r. 146.

### 2.1.1.2.1.Qesîde

Qesîde têgiheke edebî ye ku malika yekem di nava xwe de hemserwa ne û malikên din jî ji aliyê serwayê ve rêza yekem serbest e û rêza duyem jî bi malika yekem re hemserwa ne.<sup>68</sup>

Di dîwanê de em dibinin ku malikên yekem ên qesîdeya hemserwa nehatine nivîsîn. Ji ber ku helbestvan ji teşeyê bêhtir girîngî daye temayê dibe ku rêbazek wiha hilbijartibe.

Di edebiyata Kurdî de qesîde ji 15 malikan zêdetir tê nivîsîn û ji re sinorek tune ye. “Wek mînak *Behrînûr* a Mehwî ji 124 malikan pêk hatiye.”<sup>69</sup> Lê hin lêkolînerên Kurd, ji ber ku xeynî naverokê, ji aliyê hejmara malikan ve jî qesîde û xezelê ji hev cuda bikin; kêmê qesîdeyê û kêmê xezelê diyar kirine. Derbarê hejmara qesîdeyan de Dr. Marif Xeznedar û ‘Elaeddîn Secadî dibêjin ku qesîde, divê ji 18 malikan zêdetir bin.<sup>70</sup> Li gorî van agahiyan me helbestên ku di navbera 18 malikan û 53 malikan de ne wek qesîde hesaband.

Mijara qesîdeyan her çiqas bi giştî medh û sena Xwedê, Pêxember û pesinandina xelîfeyan û mirovên navdêr bin jî lê di sedsalên dawî de mijarên din jî ketine nav qesîdeyê ku em vê rewşê di qesîdeyên Kurdî de jî dibînin. Lê xeynî hejmara malikan cudahiyeke qesîdeyan jî heye ku di vegotinê de helbestvan zêde hestên xwe nayine zimên û mijareke serbixwe hildibêre.

Di dîwanê de bi tevahî 9 qesîde tê dîtin. Teşeya nezmê ya ku herî kêm hatiye bikaranîn qesîde ye. Gava ku em li qesîdeyên Findikî dinêrin, em dibinin ku qesîdeya herî kurt bi 18 malikan û ya herî dirêj jî bi 53 malikan nivîsiye.<sup>71</sup> Ji bo rêza qesîdeyên dîwanê û hejmara malikan (bnr. Tablo1.)

---

<sup>68</sup> Yekta Saraç, *Klâsik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, weş. Gökkubbe, Çap.9., İstanbul 2015, r. 21.

<sup>69</sup> Mela ‘Ebdulkerîmî Muderîs-Mihmedî Mela Kerîm, *Dîwanî Mehwî- Lêkdanewey û Lêkolînewey*, weş. Întîşarata Kurdistan, Çap.3., Sine 1385, r. 419.

<sup>70</sup> ‘Ezîz Gerdî, *Serwa- Lêkolîneweyekê Şîkarê Berawerde le Şî‘rê Kurdî*, weş. Wizareta Rewşenbîrî, Çap.1., Hewlêr 1999, r. 256-257.

<sup>71</sup> Hejmara malikên qesîdeyan di navbera 15-30 an de ye lê hin helbestvanên Kurd ev merc neşopandine. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku hin helbestvanên Kurd ji 15 malikan kêmîr jî qesîde nivîsîne.

### 2.1.1.2.2. Mesnewî

Mesnewî di edebiyata klasîk de ji teşeyên nezmê yên ku ji beytan pêk tên formeke herî zêde berbelav û naskirî ye. Wekî têgeheke edebî, mesnewî ew teşeya nezmê ya ku hemû beytên wê bi heman qalibê ‘erûzê tîn nivîsandin û her beyteke wê di nav xwe de hemserwa ye. Ji ber ku mesnewiyên de du misrayên her beytekê bi misra di nav xwe de hemserwa ne, ji vê cureyê re mesnewî hatiye gotin.<sup>72</sup>

Di dîwanê de bi tevahî 12 helbest hene ku bi teşeya mesnewî yê hatine nivîsîn. Mesnewiya herî kurt ya 45an e ku bi 4 malikan hatiye nivîsîn. Herwiha mesnewîya herî dirêj jî mesnewî ya 20an e ku ji 25 malikan pêk tê. Ji bo rêza mesnewiyên dîwanê û hejmara malikan (bnr. Tablo 2.)

### 2.1.1.2.3. Xezel

Xezel, wek têgeheke edebî şikleke nezmê ye ku malika pêşîn di nav xwe de, rêza duyem a malikên din jî bi malika pêşîn re hemserwa ne.<sup>73</sup>

Di edebiyata Kurdî de xezel bi piranî di navbera 5 û 15 (5, 7, 9, 11, 13 û 15) malikan de tê nivîsîn. Lê li gorî hin lêkolînerên Kurd ev hejmar hinek diguhere. Dr. Marif Xeznedar dibêje ku hejmara xezelan di navbera 3 û 7 malikan de ye; lê xezelên ku ji 7 malikan zêdetirin (12, 15 û 17) jî hene.<sup>74</sup> Li gorî van agahiyan me helbestên ku di navbera 5 malikan û 17 malikan de ne wek xezel hesaband.

Mijara xezelan her çiqas evîn, evîndarî û ‘eşq be jî lê di mijarên cur be cur de jî tîne nivîsîn. Li gorî van mijaran navê xezelan jî diguhere. Xezelên ku behsa kêf an izdiraba ‘eşqê dikin re xezelên ‘aşiqane, yên ku behsa zewq û sefaya dinê dikin re xezelên rindane, yên ku behsa hewesa gihîştina yarê dikin re jî xezelên şûxane tê gotin. Ew xezelên ku behsa tesewifê dikin re sûfiyane an ‘arifâne û yên ku fikr û ramanek didin, şîretan dikin an rê didin nîşan re jî xezelên hikemî an jî xezelên

---

<sup>72</sup> Abdurrahman Adak, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, weş. Nubihar, Çap.2., İstanbul 2014, r. 417.

<sup>73</sup> Saraç, b.n., r. 47.

<sup>74</sup> Gerdî, b.n., r. 256-257.



hekîmâne tê gotin.<sup>75</sup>Di dîwanê de xeynê du-sê xezelan, yên din xezelên sûfiyâne, ‘arifâne û hekîmâne ne.

Di dîwanê de em dibinin ku teşeya nezmêya ku herî zêde hatiye bikaranîn xezel e. Di Dîwana Findikî de 31 xezel henin. Xezela herî kurt ya 33an e ku bi 5 malikan hatiye nivîsîn. Herwiha xezelên herî dirêj jî ya 3an û 11an e ku ji 17 malikan pêk tên. Ji bo rêza xezelên dîwanê û hejmara malikan (bnr. Tablo 3.)

Xezelên dîwanê bi piranî di forma xezelên musemmet de ne, ji ber vê yekê mirov dikare weke çarîn jî binivîse. Lê me hemûyan wek malik nivîsîn ku weke çarînan an weke murebbe‘an neyên fêmkirin.

## **2.1.2. Taybetiyên Ruxsarî**

### **2.1.2.1. Wezna ‘Erûzê**

Di Dîwana Findikî de bi tevahî 52 helbest hene ku hemî jî bi behrên ‘erûzê hatine nivîsîn. Di helbestan de wezna ‘erûzê bi serkeftî hatiye tetbîqkirin û hemî helbest ji 4 behrên ‘erûzê (hezec, remel, recez û muteqarib) û bi 6 qalibên wê yên cuda hatine nivîsîn. Behra ku Findikî herî zehf bikaraniye behra hezecê ye ku 19 helbestan bi qaliba wê ya “mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / fe‘ûlun” û 9 helbestan ji bi qaliba wê ya “mefâ‘îlun / mefâ‘îlun/ fe‘ûlun”ê nivîsîne. Ji bo agahiyên zêdetir (bnr. Tablo 5.)

Di dîwanê de 5 qesîde (7, 15, 18, 27 û 37) bi qaliba mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / fe‘ûlunê; 3 qesîde (1, 2, 4) bi qaliba mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / mefâ‘îlunê û qesîdeyek (28) jî bi qaliba mustef‘îlun / mustef‘îlun / mustef‘îlun / mustef‘îlunê hatiye nivîsîn. Herwiha tê dîtin ku di qesîdeyan de behra herî zêde hatiye bikaranîn “behra hezec”ê ye.

Di dîwanê de 6 mesnewî (20, 23, 31, 45, 50 û 51) bi qaliba “mefâ‘îlun/ mefâ‘îlun/ fe‘ûlun” ê; 6 mesnewî (36, 39, 40, 44, 46 û 52) jî bi qaliba “fe‘ûlun/ fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûl” ê hatine nivîsîn.

---

<sup>75</sup> Saraç, b.n., r. 47.

Di dîwanê de 6 xezel (3, 4, 5, 8, 12 û 38) bi qaliba “mefâ‘îlun/ mefâ‘îlun/ mefâ‘îlun/ mefâ‘îlun”ê; 8 xezel (6, 13, 14, 25, 26, 34, 42 û 49) bi qaliba “mefâ‘îlun/ mefâ‘îlun/ fe‘ûlun”ê; 5 xezel (9, 16, 21, 33 û 35 ) bi qaliba “mustef‘ilun/ mustef‘ilun/ mustef‘ilun/ mustef‘ilun”ê; 10 xezel (11, 17, 19, 22, 24, 29, 30,32, 41 û 43) bi qaliba “fâ‘ilâtun/ fâ‘ilâtun/ fâ‘ilâtun/ fâ‘ilun”ê û xezelek (47) jî bi qaliba “fe‘ûlun/ fe‘ûlun/ fe‘ûlun/ fe‘ûlun”ê hatiye nivîsîn. Herwiha tê dîtin ku behra herî zêde di xezelan de hatiye bikaranîn “behra remel”ê ye.

Findikî her çiqas di bikaranîna ‘erûzê de serkeftî be jî lêbelê hin caran di tetbîqa ‘eruzê de wek helbestvanên klasîkên dî wî jî hin qisûrên ‘erûzê kirine.

Emê yek bi yek ji helbestên dîwanê mînakên bidin û behsa wan qisûran bikin:

#### 2.1.2.1.1. Imâle

Di ‘erûzê de dema ku kêteyek kurt (+) be û ji bo tetbîqa qalibê mirov wê dirêj(-) bike an dirêj bixwîne jê re îmale tê gotin.<sup>76</sup> Me îmaleyê bi “±” nîşan da. Bo mînak:

...  
 علی رونه ژ فی قلقى بکه صبری ببین زوقی

ننیره دولتتا خلقی چکو پاشی تو پی نایی

‘Elî rûnê ji vê qelqê Bike şebrê bibîn zewqê

+ ± - - / + - - - + - - - / + - - -

Nenêre dewletâ xelqê Çiku pâşî tu pê nâyê<sup>77</sup>

+ - - - / + - - - + - ± - / + - - -

mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / mefâ‘îlun

#### 2.1.2.1.2. Med

Esil wateya medê dirêjkirin û kişandin e. Di ‘erûzê de hinekî zêdetir dirêjxwendina kêteyên hevedudanî ye. Kîteyên hevedudanî ew kîte ne ku dawîya wan

<sup>76</sup> Saraç, b.n., r. 210.

<sup>77</sup> Findikî, b.n., r. 35.

an ji du dengên dengdar, wekî mest û eşq an jî piştî dengdêreke dirêj, hatina yek an jî du dengên dengdar, wekî yâr û dôst.<sup>78</sup> Me med bi “(+)” nîşan da. Bo mînak:

...

خدا کاری درمان کی فی دردی هه

کو دوستی بخي ناڤ واندا نهه

Xudâ kêrî derman kî vî derdê he

+ - - / + - - / + - - / + -

Ku dostî bixî nav wan dâ nihe<sup>79</sup>

+ - - / + - - / (+-) - /+- -

fe'ûlun / fe'ûlun / fe'ûlun / fe'ûl

### 2.1.2.1.3. Zihâf

Di 'erûzê de waxtê ku kêteyek dirêj(-) be, mirov wê ji bo qalib kurt (+) bixwîne ew dibe zihaf.<sup>80</sup> Me zihâfê bi “ž” yê nîşan da. Bo mînak:

...

لكو دی بیته زانین حالی سیدا

بتعریف و بیانا وک مه لالی

Li ku dê bête zânîn hâlê Seydâ

+ - - - / + - - - / ž - -

Bi te'rif û beyânâ wek mi lâli<sup>81</sup>

+ - - - / + - - - / + - -

mefâ'îlun / mefâ'îlun / fe'ûlun

### 2.1.2.1.4. Weşl

Wesl bi wateya peyvî gihêştin û girêdanê. Di arûzê de jî dema ku bêjeyek bi tîpeke dengdar dawî bûbe û bêjeya pey re jî bi tîpeke dengdêr destpê kiribe li wir herdu bêje bihev re tîn xwendin.<sup>82</sup> Yanî herwekî ew herdu bêje digihêjne hev ku em ji vê gihêştinê re wesl dibêjin.

<sup>78</sup> Saraç, b.n., r. 211.

<sup>79</sup> Findikî, b.n., r. 329.

<sup>80</sup> Saraç, b.n., r. 208.

<sup>81</sup> Findikî, b.n., r. 67.

<sup>82</sup> Saraç, b.n., r. 208.

Me li jêr cihên ku wesl tê de heye bi “=>” nîşan dan:

دزانم از خویبکم میو و هیژیر  
من و تشتی ژ خو زیده هنده عالی

Dizânim ez xweyî kim mêw û hêjîr  
+ - - => / + - - - / => - -  
Min û tiştê j'xwe zêde hinde 'âlî<sup>83</sup>  
+ => - => / + - ± - / + - -  
mefâ'îlun / mefâ'îlun / fe'ûlun

#### 2.1.2.2. Qafiye (Serwa)

Qafiye bi kurtasî li dawîya du risteyan de dûbarekirina dengan e. Bêjeyên ku tê de dûbarekirina dengan hebe divê an bixwe an jî wateya wan ji hev cûda be.<sup>84</sup>

Di helbestên klasîk de qafiye cihekî taybet digire. Lewre qafiye him di helbestê de ahengê ava dike him jî teşeya nezma helbestê nîşan dide. Di dîwanan de her helbestekê exlebî bi herfeke qafiyeyê dawî dibe. Bi vê herfê em şemaya qafiyeyê jî tesbît dikin. Wek; aa-xa-xa-xa an aaab, cccb, dddb û hwd... Pirî helbestvan bikaranîna herfa qafiyeyê de li ser şopa elifbaya 'Erebî çûne. Yanî pêşî bi herfa “ا” elifê destpêkirine û piştê jî bi herfa “ى” yêyê helbestên dîwanê qedandine. Lê ji bo Findikî em nikarin vê bêjin. Lewra wî her çiqas di destpêka dîwanê de bi herfa “ا” elifê qafiyê çêkiribe jî lê piştê bi herfa “ى” yê, “ا” elif, “ى” yê, “ل” lam, rê “ر”, fê “ف” û hwd. domandiye. Di dîwanê herfa ku herî zêde hatiye bikaranîn herfa ی (y, î, ê) ye ku ev herf di 22 heb helbestan de bûye herfa qafiyeyê. Ji bo agahiyên zêdetir (bnr. Tablo 6.)

Wek mînak; di helbesta li jêr de tê dîtîn ku herfa qafiyeyê bi “ê” dawî buye:

...  
ام داغ کرن بداغا پزا ام کزخاندن وک رزا  
قبحت چه بو اف بو جزا ابواه ژ دردی غربتی

<sup>83</sup> Findikî, b.n., r. 67.

<sup>84</sup> Saraç, b.n., r. 257.

Em dâx kirin b' dâxâ pezâ em kezixândin wek rezâ

Qibhet çi bû ev bû cezâ eywâh ji derdê xurbetê

فی غربتی ام پیر کرن بی رأی و بی تدبیر کرن

باث و برا ام ژبیر کرن ایواہ ژ دردی غربتی

Vê xurbetê em pîr kirin bê re'y û bêtedbîr kirin

Bâv û birâ em j' bîr kirin eywâh ji derdê xurbetê<sup>85</sup>

### 2.1.2.2.1. Cureyên Qafiyê

#### 2.1.2.2.1.1. Ji Aliyê Hejmara Dengê ve Qafiye<sup>86</sup>

Em dikarin qafiyeyê ji aliyê hejmara dengê hevşibî ve di bin 4 serenavan de dabeş bikin: 1. Qafiyeya Lawaz, 2. Qafiyeya Asayî, 3. Qafiyeya Zêdebar û 4. Qafiyeya bi Cinâs.<sup>87</sup>

#### 2.1.2.2.1.1.1. Qafiyeya Lawaz

Di peyvên biqafiye de tenê ji aliyê dengê dengdêr ve hevşibî hebe jê re qafiyeya lawaz tê gotin.<sup>88</sup> Wek mînak:

...

چرا هنده تو بی فکری نزانى قى توى بمرى

لسر خو بیهنکی بگری وکی یخسیری حبسیدا

Çirâ hinde tu bêfîkr î nizânî qey tuwê bimrî

Li ser xwe bêhnekî bigrî wekî yexsîrê hebsê da<sup>89</sup>

#### 2.1.2.2.1.1.2. Qafiyeya Asayî

Di peyvên biqafiye de tenê ji aliyê dengê dengdêr û dengê dengdar ve hevşibî hebe jê re qafiyeya asayî tê gotin.<sup>90</sup> Wek mînak:

<sup>85</sup> Findikî, b.n., r. 125.

<sup>86</sup> Di hin çavkaniyan de weke “ji aliyê biyadê ve qafiye” tê binavkirin. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. İsmail Durmuş, Mürsel Öztürk, İskender Pala: “Kafiye” *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c.24, weş. TDV, İstanbul 2001. r. 149-153.

<sup>87</sup> Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, weş. TDK., Çap.4., Ankara 1997. .r. 86-91.

<sup>88</sup> Dilçin, b.n., r. 86.

<sup>89</sup> Findikî, b.n., r. 23.

...

چکو تو پر نه گوهداری دکى توبه بصد زارى

ژ صبهى نابه ايقارى تو تى جاردى بشونيدا

Çi ku tu pur ne guhdâr î dikî tewbe bi sed zârî

Ji subhê nâbi êvârî tu tê cardî bi şûnê dâ<sup>91</sup>

### 2.1.2.2.1.1.3. Qafiyeya Zêdebar

Di peyvên biqafiye de ji sê dangan zêdetir hevşibî hebe jê re qafiyeya zêdebar tê gotin.<sup>92</sup> Wek mînak:

...

مه جرباندن گلى ژ دوستان نه شاگرتى بلى ژ هوستان

برنگ بون وک گلى بوستان خزام وشهان بهاوارى

Me cerbandin gelek j' dostan ne şâgirtî belê j' hostan

Bi reng bûn wek gulê bostan xezam weşhan bi hâwârî<sup>93</sup>

### 2.1.2.2.1.1.4. Qafiyeya bi Cinâs( Serwaya Regezdozî)

Peyvên bi cinâs ku ji aliyê nivîsê û teleffuzê ve weke hev bin lê ji aliyê wateyê ve cuda bin jê re qafiyeya bi cinâs tê gotin.<sup>94</sup> Wek mînak:

...

امى دى ژى قبن لى هيدى هيدى

تو قى نقلى بلبكى مه بکه هيدى

Emê dê jê vebin lê hêdî **hêdî**

Tu vê neqlê bi libkî me bike **hêdî**<sup>95</sup>

<sup>90</sup> Dilçin, b.n., r. 87.

<sup>91</sup> Fındikî, b.n., r. 19.

<sup>92</sup> Dilçin, b.n., r. 89.

<sup>93</sup> Fındikî, b.n., r. 43.

<sup>94</sup> Dilçin, b.n., r. 89.

<sup>95</sup> Fındikî, b.n., r. 291.

Di helbesta li jor de peyva hêdî a yekem di wateya “aram”ê de hatiye bikaranîn a duyem jî bi wateya “xelat”ê de hatiye bikaranîn. Nivîsandina peyvan yek in lê wateyên wan cuda ne.

#### 2.1.2.2.2. Şemaya Qafiyeyê a Teşeyên Nezmê yê Dîwanê

Emê niha yek bi yek li ser qafiyeya teşeyên nezmê ku di diwanê de hatiye bikaranîn rawestin:

##### 2.1.2.2.2.1. Qafiyeya Qesîdeyan

Şemaya qafiyeyê, weke hemî qesîdeyan dî, rêza yekem serbest e û ya duyem biqafiye ye. Tertîba qafiyeya qesîdeya yan aa-xa-xa-xa, ... yan jî xa-xa-xa-xa, ... ne.<sup>96</sup> Bo mînak:

x \_\_\_\_\_ hişyâr  
a \_\_\_\_\_ zemânî

x \_\_\_\_\_ şîrîn  
a \_\_\_\_\_ werânî

x \_\_\_\_\_ telîs in  
a \_\_\_\_\_ şivânî

x \_\_\_\_\_ xelq  
a \_\_\_\_\_ duxanî

x \_\_\_\_\_ qirîn e  
a \_\_\_\_\_ bânî

##### 2.1.2.2.2.2. Qafiyeya Mesnewîyan

Şemaya qafiyeyê, weke hemî mesnewîyan, her malik di nav xwe de biqafiye ye. Tertîba qafiyeya mesnewiyê, aa-bb-cc-dd-ee, ... ne.<sup>97</sup> Bo mînak:

a \_\_\_\_\_ Ilâhî  
a \_\_\_\_\_ menâhî

<sup>96</sup> Saraç, b.n., r. 21.

<sup>97</sup> Saraç, b.n., r. 79.

b \_\_\_\_\_ şâfi  
b \_\_\_\_\_ kâfi

c \_\_\_\_\_ Iblîs  
c \_\_\_\_\_ lîs

d \_\_\_\_\_ hişyâr  
d \_\_\_\_\_ kâr

e \_\_\_\_\_ bimînin  
e \_\_\_\_\_ bibînin<sup>98</sup>

### 2.1.2.2.2.3. Qafiyeya Xezelan

Şemaya qafiyeya xezelan weke qesîdeyan e ku rêza yekem serbest e û ya duyem biqafiye ye. Tertîba qafiyeya xezelan aa-xa-xa-xa... ne.<sup>99</sup> Bo mînak:

a \_\_\_\_\_ zîbâxişâl  
a \_\_\_\_\_ dînbetâl

x \_\_\_\_\_ şîrînkêlâm  
a \_\_\_\_\_ suâl

x \_\_\_\_\_ im  
a \_\_\_\_\_ Zulcelâl

x \_\_\_\_\_ im  
a \_\_\_\_\_ hîlâl

x \_\_\_\_\_ vexwâr  
a \_\_\_\_\_ wisâl

x \_\_\_\_\_ dilberê  
a \_\_\_\_\_ erzûhâl

x \_\_\_\_\_ bînitin  
a \_\_\_\_\_ mâl<sup>100</sup>

---

<sup>98</sup> Findikî, b.n., r. 169.

<sup>99</sup> Saraç, b.n., r. 47.

<sup>100</sup> Findikî, b.n., r. 165.



### 2.1.2.3. Redîf (Paşserwa)

Piştî serwayê û di dawiya misrayan de ji her cure tekrarên ku tên kirin re paşserwa (redîf) tê gotin.<sup>101</sup> Di redîfê de qertaf û bêjeyên ku têne dubarekirin, divê peywira wan a di nav hevokêde jî wek hev be.

Redîf, di helbestên Findikî de weke qertaf, bêje an jî weke kombêjeyan xuya dike. Me di dîwanê de nêzî 30 heb rêdîfên ku di halê qartafan de ne dîtîn. Redîfên ku bi vî awayî di helbestên dîwanê de cih girtine me di Tablo 7 de nîşan dan.

Çend mînak ji bo rêdîfên ku di halê qartafan de ne:

...  
هونن شقانی امتی کو هون بخو خوهر کن خطی  
جاهل دی چیکن حیجتی ژپی وه بین ترت و بلا

Hûn in şivânê ummetê ku hûn bi xwe xwehr kin xeţê  
Câhil dê çêkin hêcetê j'pey we bibin tert û belâ<sup>102</sup>

...  
اگر ظاهرده او دوستن د باطنده تنی بوستن  
حمی یک کیش و یک بوستن ژ وان دور به بهشیاری

Eger zâhir de ew dost **in** di bâţin de tenê post **in**  
Hemî yek kêş û yek bost **in** ji wan dûr be bi hişyârî<sup>103</sup>

Di dîwanê de redîfên ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de bû jî gelek rastî me hatin. Me di dîwanê de nêzî 40 heb jî redîfên bi vî awayî hatiyê nivîsîn, tesbît kirin. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Tablo 8.

Çend mînak ji bo rêdîfên ku di halê bêje an kombêjeyan de ne:

...  
حبيب و نازدارا من طيب و گلزارا من  
چوا بيتن هدارا من نبی حاضر لميدانی

---

<sup>101</sup> Adak, b.n., r. 399.

<sup>102</sup> Findikî, b.n., r. 201.

<sup>103</sup> Findikî, b.n., r. 41.

Ĥebîb û nâzidârâ **min** tebîb û gul‘uzârâ **min**  
Çewâ bêtin hedârâ **min** nebe ĥâdir li meydânê<sup>104</sup>

...  
قی غربتی ام داغ کرن ژ قلب و جگر نساغ کرن  
بی پرد و بی جاغ کرن ایواہ ژ دردی غربتی

Vê xurbetê em dâx **kirin** j’qelb û ceger nesâx **kirin**  
Bêperde û bêcâx **kirin** eywâh ji derdê xurbetê<sup>105</sup>

## 2.2. JÎ ALİYÊ ZIMAN Û ŞÊWAZÊ VE

### 2.2.1. Ziman

Samî Tan, di nivîseke xwe de bi sê pênaseya ziman pênase dike: “1-Ziman, navgîna ragihandinêye, mirov bi riya dangan hest û ramanên xwe radigihînin hev, 2-Ziman dergûşa hemû afirandinên mirovan e, dergûşa çandî ye, 3- Ziman nîşaneyên nasnameya hevpar e.”<sup>106</sup>

Em xisûsen di berhemên edebî de dibînin ku ziman çî di afirandina berheman de be çî di xemilandina vegotinê de be, pir bandoreke mezin li ser edebiyatê dike. Helbestvan û nivîskar bi xêra zimanê xwe dide nasîn û taybetmendiyên xwe kifşe dike. Em li gorî zimanê helbestvan û nivîskar, wan û berhema/ên wan dinirxînin û cih didin wan.

Helbestvanê Kurd, Seyid ‘Eliyê Findikî jî ji ber ku Kurd bûye bi zimanê zikmakî dîwana xwe nivîsiye. Em dibînin ku di dîwanê de xeynî du menzûmên ‘Erebî û menzûmeke Farisî hemî menzûm bi Kurdî (Kurmancî) hatine nivîsîn. Di helbestên wî yê Kurdî de jî bandora zimanê ‘Erebî, Farisî û Tirkî pir kêr in.

---

<sup>104</sup> Findikî, b.n., r. 97.

<sup>105</sup> Findikî, b.n., r. 125.

<sup>106</sup> Samî Tan, Rêzimana Kurmancî, weş. Enstituya Kurdi ya Stenbolê, Ç.3., Stenbol 2015. r.

Ji ber ku di dîwanê de mebest ji lîrîzmê zêdetir şîret û rexne ye; zimanê dîwanê jî sade û fehmbare e. Ev yek fehm kirinê hêsan dike û yekîtîyê bi xwendevana ve peyda dike. Xeynî vê yekê, îfadeyên henekî ku hin caran bi kar anîne jî balkêş in.

Şîretên miellif ku gelek caran li nefsa xwe dike jî taybetiyeke pir girîng e. Helbesta xwe ya yekemîn û rêzên wî de dibêje: “Elî rabe heta kengê / Tu xafil bî bi vê rengê” derbarê mijarê de mînakeke balkêş e. Di helbesta wî ya duyemîn, sêyemîn, çaremîn, pêncemîn, hevdehemîn û bîst û nehemîn de jî heman rewş tê dîtin.

Emê niha li ser hin hemanên ku zimanê helbestvan xurt û dewlemend kiriye bisekinin:

### 2.2.1.1. Gotinên Pêşiyên

Gotinên pêşiyên an gotinên mezinan dî dîrok û çand û zimanê neteweyek de pir cihekî bi taybet digire.

[...]Bîwêj û gotinên pêşiyên, derbarê dad û dîrokê, çand û zanîne, felsefe û ferasetê, edet û toreyan de, derbarê psîkolojî û aboriya civakê de, agahiyan didin. Asta wêje û hunerê, asta rêveberî û sebra gel bi me didin ronîdarkirin. Kesayetiya civakê diyar dîkin[...]<sup>107</sup>

Me di helbestên Seyid ‘Elî de ji dehan zêdetir gotinên pêşiyên dîtin. Emê niha li jêr bi mînakan van gotinê pêşiyên nîşandin:

...  
وك على زانت کسی جامك ژ هجرانی قحوار  
"ساعتك دورا فراقی پرتره ژصالا وصال"<sup>108</sup>

Wek ‘Elî zânit kesî cîmek ji hicrânê vexwâr  
“Sa’etek dewrâ firâqê pirtir e j’şâlâ wişâl”<sup>109</sup>

<sup>107</sup> Mustafa Borak, *Ferhenga Bîwêjan*, weş. Enstîtuya Kurdî, Çap.1., İstanbul 2005, r. 8.

<sup>108</sup> Sa’etekî durketin li gorî mirov wisa dirêj e ku ji saleke gihêştinê pirtir e. Ev gotin di nav gel de bûye wek derb û mesel.

<sup>109</sup> Findikî, b.n., r. 167.

...

"ژ کسرا دنیا نابی ملکی باقی" <sup>110</sup>

هون نابیزن گلو باقی مه کانی

"Ji kes rā duniyā nâbê mulkê bâqî"

Hûn nâbêjin gelo bâvê me kânî <sup>111</sup>

...

نبیژ از حافظم بی دست و پیمه

"جمالا هرکسی بقلب و لسانه" <sup>112</sup>

Nebêj ez hâfiz im bêdest û pê me

"Cemâlâ herkesi b'qelb û lisân e" <sup>113</sup>

...

گلك كس تيدا غرانه دماچون مانه پوشمانه

فقط بوری ژ دس وانه "کسی چونای بشونیدا" <sup>114</sup>

Gelek kes têda xirrâne demâ çûn mâne poşmâne

Feqet borî ji des wâne "kesê çû nây bi şûnê dâ" <sup>115</sup>

...

فائدا علمی عمل کرنه اگر نه چند پره

"دارابی فیکی و سه فایدا وی هیچه" ای دلال <sup>116</sup>

Fâidâ ‘ilmê ‘emel kir ne eger ne çend pere

"Dâra bê fêkî û sih faydâ wê hîç e" ey delâl <sup>117</sup>

<sup>110</sup> Ev gotina pêşiyên di eslê xwe de wek "dinya ji kesî re namîne" ye. Lê gotinên pêşiyên ku wek vînin jî henin: "Dinya ji kesî re nabe yar" an "dinya siya darê ye ji kesî re nadomîne."

Tê dîtîn ku di her sê gotinan de jî temaya hevpar fanîbuna dinê ye.

<sup>111</sup> Findikî, b.n., r. 139.

<sup>112</sup> Ev gotina pêşiyên behsa girîngiya dil û zimanê dike. Dibêje ku başbûn û çêbûna mirovan vabestê keyfiyeta dil û zimanê wan e.

<sup>113</sup> Findikî, b.n., r. 109.

<sup>114</sup> Ev gotina li gel fanîbûna dinê tê gotin. Wexta ku yek dimire carek di nayê dinê.

<sup>115</sup> Findikî, b.n., r. 21.

<sup>116</sup> Dara bê fêkî û sih bê qiymet e. Mirov jî ku feyde nede yê dora xwe herwekî wek darek bê sî û bê ber e.

<sup>117</sup> Findikî, b.n., r. 93.

...

هر کس نزانته حال چیه "یی تیر چه هاژ یی برچیه"<sup>118</sup>

پرسی بکن ژ یی دیتیه ایواه ژ دردی غربتی

Herkes nizânit hâl çi ye "yê têr çi hâ j' yê birçî ye"

Pîrsê bikin j' yê dîtîye eywâh ji derdê xurbetê<sup>119</sup>

...

"دزی ژ کلها دبت" اف هاتیه گوتن<sup>120</sup>

شطه لدرنا دنیری قیله وی بن

"Dizî j' kelhâ dibit" ev hâtye gotin

Şeşe l' dernâ dinêrî vêle wê bin<sup>121</sup>

...

"دما عیش تمام بو زوالا وی تی"<sup>122</sup>

وها هاتیه دیتن لگور عادتی

"Demâ 'îş temâm bû zewâla wê tê"

Wihâ hâtye dîtîni li gor 'âdetê<sup>123</sup>

...

ای علی تو خوش دبیژی لی بلی نییژی تو

"گوتنا خالی ژ کرنی هیچه وک خون و خیال"<sup>124</sup>

Ey 'Elî tu xweş dibêjî lêbelê nâpêjî tu

"Gotinâ xâlî ji kîrnê hîç e wek xewn û xeyâl"<sup>125</sup>

...

"ژ راستی سراستی تیتته شونی"<sup>126</sup>

افه عادت خدایی مه ژ بری دا

<sup>118</sup> Ev gotina pêşîyan ji wek "yê têr haj yê birçî tine" tê gotin. Di vê gotinê de mebest ew e ku yê bê xem tu car halê ê bixem fêm nake.

<sup>119</sup> Findikî, b.n., r. 127.

<sup>120</sup> Dizî ji kela dibe. Di vê gotinê de dibêje ku mirovek çiqas baş û çêtir be jî mirov ewlehiya xwe pê neyne. Lewra kela ewqas qewî û girtî ne jî lê pîrî caran dîzî li wir çêdibin.

<sup>121</sup> Findikî, b.n., r. 315.

<sup>122</sup> Ku tişteke gihîşte asta herî bilind piştê ber bi xirab bûnê ve diçe.

<sup>123</sup> Findikî, b.n., r. 241.

<sup>124</sup> Gotina ku emel pê neyê kirin wek xewn û xeyalan e ku hebûneke wan tine.

<sup>125</sup> Findikî, b.n., r. 95.

<sup>126</sup> Ji rastiye durustî çêdibe.

“Ji râstiyê serâstî têtê şûnê”

Ev e ‘âdet Xudâyê me j’berê dâ<sup>127</sup>

...

دیبینی بهن بیهن عیش تی خرابتر  
"حجی ساله دیبیزی خوزکا پاره"<sup>128</sup>

Dibînî bêhn bi bêhn ‘îş tê xirâbtir

“Heçî sâl e dibêjî xwezka pâr e”<sup>129</sup>

### 2.2.1.2. Biwêj

Biwêj komeke peyv in ku ji aliyê gel ve hatine pejirandin, pirtirîne wan ne li ser wateyên xwe yê rasteqîn in, di wateyeke mecazî de têne bikaranîn, jêderka wan nayê zanîn, gelemperiyê nakin û rewşeke cihê îfade dikin.<sup>130</sup>

Seyid ‘Eliyê Findikî di dîwana xwe de ji gotinên pêşiyên bêhtir biwêjan bikaraniye. Dîwana wî ji aliyê biwêjan ve gelek dewlemend e. Ev jî hêza zimanê wî xurt kiriye û gotinên wî bêhtir xemilandiye.

Emê wek mînak helbesta bi navê “Hewar e Hey Hewar e Hey Hewar e”<sup>131</sup> bidin ku ev helbest ji aliyê biwêjan ve pir balkêş e:

...

هواره هی هواره هی هواره  
نزانی اهلی وقت "ام کرنه صاره"

Hewâr e hey hewâr e hey hewâr e

Nezânê ehlê weqt “em kirne şar e”<sup>132</sup>

...

ژ دستى وان نزانن ام چواکن  
خبر ناچن "گوھی وا وک دیواره"<sup>133</sup>

<sup>127</sup> Findikî, b.n., r. 55.

<sup>128</sup> “Heçî sale dibêje xwezka par e.” Ji ber xirab çuyina rewşek mirov ku her tim dema borî bifikire û xweziya xwe pê bîne.

<sup>129</sup> Findikî, b.n., r. 233.

<sup>130</sup> Abdulkadir Bingöl, *Gotinên Pêşiyên û Biwêj*, Weş. Na, İzmir 2014, r. 6.

<sup>131</sup> Findikî, b.n., r. 233.

<sup>132</sup> Jê sarbûn: Ji tiştê an mirovek acizbûn.

<sup>133</sup> Guh wek dîwarbûn: Ji mirovê ku qet guh nadin tiştê û têkilê gotina mirov nabin re

Ji destê wan nizânin em çewâ kin  
Xeber nâçin “guhê wâ wek dîwâr e”<sup>134</sup>

...

نزانن او نزانن كو نزانن  
كى كارى وا "ژ رىاوان بينى خواره"<sup>135</sup>

Nizânin ew nizânin ku nezân in  
Kî kêrê wâ “j’ riyâ wan bînî xwâre”<sup>136</sup>

Me biwêjên ku di dîwanê de hatine bikaranîn, bi hejmara helbestan û bi hejmara malikên wan wek alfabetîk rêz kirin. Ji bo agahiyên zêdetir (bnr. Tablo 9.)

### 2.2.1.3. Babdora Zimanên ‘Erebî, Farisî û Tirkî

#### 2.2.1.3.1. Bandora Zimanê ‘Erebî

Di dîwanê de piştê zimanê Kurdî, zimanê ku herî zêde hatiye bikaranîn zimanê ‘Erebî ye. Helbestvanên klasîk di helebestên xwe gelek caran bi zimanê muxtelif nivîsîne ku ev jî meziyeteke ji bo wan. 2 heb helbestên Findikî bi temamî ‘Erebî ye û helbesteke wî jî bi ‘Erebî destpêdike lê bi Kurdî didome. Helbestên ku ‘Erebî ne ji aliyê weşanxaneyê Nûbaharê ve li Kurdî hatiye wergerandin.

Me li jêr malikên ku tê de gotin û hevokên ‘Erebî hene daye:

...

"الا يا ايها الاخوان مالى"  
"فقد مال الى الهجران بالى"<sup>137</sup>

“Elâ yâ eyyuhe’l-ixwânu mâ lî  
Fe-qed mâle ile’l-hicrânî bâlî”<sup>138</sup>

---

dibêjin.

<sup>134</sup> Findikî, b.n., r. 233.

<sup>135</sup> Ji rê xistin: Mirov ku yekî ji rêya nebaş vegeîne an ji tiştek nebaş bide alî jê re wisa

dibêjin.

<sup>136</sup> Findikî, b.n., r. 233.

<sup>137</sup> Ey hevalên min çima dilê min wiha ketiye nav durketinê.

<sup>138</sup> Findikî, b.n., r. 57.

...

گلك گريام د دنيا لدوستكى پاك

"لعلی آخذ منه جمالی" <sup>139</sup>

Gelek geryâm di dinyâ l' dostekî pâk

"Le 'ellî âxizu minhu cemâlî"<sup>140</sup>

...

"فلم اظفر بمقصودی الى الان"

"اقولو قولی هذا ما بدا لی" <sup>141</sup>

"Fe-lem ezfer bi-meqsûdî ile'l-ân

Eqûlû qewlî hâzâ mâ bedâ lî"<sup>142</sup>

...

هزاران صلوات و هزاران سلام

ببارن "ولا ينقطع بالدوام" <sup>143</sup>

Hezârân şelât û hezârân selâm

Bibârin "we-lâ yenqetî' bi'd-dewâm"<sup>144</sup>

...

"فهل انتم على ما نحن فيه" <sup>145</sup>

گلو یان ام تنی کتنه فی حالی

"Fe-hel entum 'elâ mâ neħnu fihî"

Gelo yan em tenê ketme vî hâlî"<sup>146</sup>

Ûeynî van malikan em dizanin ku helbestvan du helbestên xwe jî seranser bi zimanê 'Erebî nivîsîne.

---

<sup>139</sup> Dibe ku ez jê bedewbûna xwe hildim.

<sup>140</sup> Findikî, b.n., r. 59.

<sup>141</sup> Ez heta niha negihêştîme meqseda xwe / Gotina min ê gunçawê fikra min ev e.

<sup>142</sup> Findikî, b.n., r. 59.

<sup>143</sup> Bê sekn û aramî dewam bike.

<sup>144</sup> Findikî, b.n., r. 299.

<sup>145</sup> Ev îbare tê wateya " hingê gelo hûn jî li ser rêya min in?"

<sup>146</sup> Findikî, b.n., r. 61.



### 2.2.1.3.1.1. Ayet

Xisûsen helbestên dînî û tesewîfî de ji ayet û hedîsan pir iqtîbas tê kirin. Li gor helbestvanan ev hunereke û hêza vegotinê xurt dike.

Di dîwanê de em du cihan de rastî ayetan hatin:

...

كو "اکملتو" <sup>147</sup> ریکر خدایی مجید  
د ناڤا صحابان بو شاهی و عید

Ku "ekmeltu" rêkir Xudâyê Mecîd

Di nâvâ şehâbân bû şâhî û 'îd<sup>148</sup>

...

فقط "لا تقنطو" <sup>149</sup> صبرا مه پیتی  
چه مزگینه ژ رب لایزالی

Feqet "lâ teqnetu" şebra me pê tê

Çi mizgîn e ji Rebbê lâ yezâlî<sup>150</sup>

### 2.2.1.3.2. Bandora Zimanê Farisî

Di Dîwana Findikî de tenê helbesta 14an bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn. Ew helbest jî ev e:

درین دنیا کسی بی غم نباشد  
اگر باشد بنی آدم نباشد

Di vê dunyâya han kes bêxem nîne

Eger bê xem be Benî Âdem nîne

غم آنست کی از یاران شدم دور  
غمی زین در جهان مهتر نباشد

Ûemâ min ew e ku ji yâran dûr bûm e

Di cîhan de xemek j'vê meztir nîne

---

<sup>147</sup> Min kemiland. (Ayeta ku Xwedê Te'ala dibêje min dînê we kemiland.)

<sup>148</sup> Findikî, b.n., r. 241.

<sup>149</sup> Ayeta ku dibêje "hêviya xwe nebirin."

<sup>150</sup> Findikî, b.n., r. 69.

خدا داند کی من در دل چه دارم  
ولی چیزی بدست من نباشد

Xudâ zâne ku derdê dilem çi ye  
Belê tişteke di destê min de nîne<sup>151</sup>

...

### 2.2.1.3.3. Bandora Zimanê Tirkî

Di Dîwana Findikî de em rastî peyv û qertafên Tirkî jî tên. Bo mînak:

...

ژ "آلتون" چای ته صوندوق هر تژی بی  
نصیبی دوستانی ته و مه ژی بی

Ji "altun" çay te şundoq her tejî bî  
Neşîbê dositânî te'w me jî bî<sup>152</sup>

...

زبشی لبر چم و نانی گنم  
کو حاضر بییتن "بنمدر بنم"<sup>153</sup>

Zebeşê li ber çem û nânê genim  
Ku hâzîr bibîtin "benimdir benim"<sup>154</sup>

...

نصیبسز شبهی من نینه ژ هجری من جگرخوینه  
بلتفا خوه تو بیربینه افی عبدی دریزانی

Neşîbsiz şubhê min nîn e ji hicrê min ceger xwîn e  
Bi lutfâ xwe tu bîr bîn e evî 'ebdê derîzânê<sup>155</sup>

...

وظیفایا خو نکى راست و دروستى  
بلا کى بت دبت او کس جزالى

<sup>151</sup> Di vê helbestê de malika yekem ya Se'dîyê Şîrazî ye ku Seyid 'Elî wek iqtibas jê wergirtiye. Eslê vê helbestê Farisî ye lê ji aliye weşanxaneyê Nubaharê ve li Kurdî hatiye wergerandin.

<sup>152</sup> Findikî, b.n., r. 223.

<sup>153</sup> Watêya wê ya bi kurmancî "ya min e ya min"

<sup>154</sup> Findikî, b.n., r. 327.

<sup>155</sup> Findikî, b.n., r. 99.

Wezîfa xwe nekî râst û durustî  
Bilâ kî bit dibit ew kes cezâli<sup>156</sup>

...

ته نیری عیسی وان عیشک کمال سز  
نه هیژایه کو هنده لی جفانه

Te nêrî 'îşê wan 'îşek kemâlsiz  
Nehêjâ ye ku hinde lê civân e<sup>157</sup>

...

انصاف سزا ام راکرن لبلان و دشتا کار کرن  
مه چند دلال و نداکرن ایواه ژ دردی غربتی

Înşâfsizâ em râkirin l' bêlân û deştâ kêr kirin  
Me çend delâl windâ kirin eywâh ji derdê xurbetê<sup>158</sup>

...

مه هیفی ژ وه نکن گازند و لوما  
برا چندی برایه "باشقه" بازار

Me hêvî j' we nekin gâzind û lomâ  
Birâ çendâ birâ ye "başqe" bâzâr<sup>159</sup>

...

اوی فضل و کمال چو در ژ حدی  
حتایی وک مه ژی بونه بلالی

Ewî feđl û kemâl çû der ji heddê  
Hetâ yê wek mi jî bûne belâli<sup>160</sup>

...

ژ مهینیرا دخوازم بیکی "باشقه"  
دلی من گلکی پبقایه جوانه

---

<sup>156</sup> Findikî, b.n., r. 65.

<sup>157</sup> Findikî, b.n., r. 113.

<sup>158</sup> Findikî, b.n., r. 127.

<sup>159</sup> Findikî, b.n., r. 195.

<sup>160</sup> Findikî, b.n., r. 67.

J' mehîne râ dixwâzim yêkî “başqe”

Dilê min gelkî pêvâ ye ciwân e<sup>161</sup>

Di hin helbestan de jî em rastî peyva nobeçî (nöbetçi) û hîleçî (hileci) jî hatin.

#### 2.2.1.4. Cotpeyv û Dûbarekirina Dengan

Di zimanan de hin bêje hene ku ji bo ku vegotinê bihêztir bikin û wateya îfadeyê xurt bikin bi bêjeyên wekê xwe, nêzî xwe yan jî dijberê xwe re tên bikaranîn.<sup>162</sup>

Findikî, di Dîwana xwe de gelek cotpeyv û dubareya dengan bikaraniye: bêhn bi bêhn, qîl û qal, kerr û lal, pûç û betal, xewn û xeyal, pirs û sual, agir û hirçet, şev û roj, rîx û pîx, hira wîra, xirr û xalî, hirt û hirt, zar zar, hira-vêra, giry û gazin, şîr û şekir, şeqalî beqalî, ello bello, hetk û helak, rêz û resm, têk de mêk de, vî mil wî mil, ax û ax, dûr û diraz, şerm û fedî, heşr û hisab, govend û reqs, herê herê, teqn û herî û hwd.

Emê li jêr ji dîwanê çend mînakên cotpeyvyan û dubareya dengan bidin:

...

علی رابه وها نابی "بحیل و پيله" چینابی

عمور بوری مرن هابی چرا تدبیرکی ناکی

‘Elî râbe wihâ nâbê bi “hîl û pîle” çênâbê

‘Umur borî mirin hâ bê çîrâ tedbîrekê nâkî<sup>163</sup>

...

دخيلم يا ابا القاسم تو بی "امداد و هاوار" م

دما جانی خو بپارم ژ جم من تو لعین راکى

Dexîl im yâ Ebel-Qâsim tu bê “îmdâd û hâwâr” im

Demâ cânê xwe bispârim ji cem min tu le’în râkî<sup>164</sup>

<sup>161</sup> Findikî, b.n., r. 113.

<sup>162</sup> Ji bo cotpeyv û cûreyên wan, bnr. M. Zahir Ertekin, Zafer Açar, “Di Kurmancî de Cotpeyv û Cûreyên Wan”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, c.1.j.1, Ocak 2015, r. 82-92.

<sup>163</sup> Findikî, b.n., r. 25.

...

هرکسی هاقالی وی بت همتا وه مرشدان  
دی بچت او کس بقوناغا خوه زو "پاک و دلال"

Herkesê hâvâlê wî bit himmetâ we murşidân  
Dê biçit ew kes bi konâxa xwe zû "pâk û delâl"<sup>165</sup>

...

هرکسی هون لی عنایت کن بلا مزگین لوی  
پر غنی و مالداره گر نبت تو "ملک و مال"

Herkesê hûn lê 'inâyet kin bilâ mizgîn li wî  
Pur xênî û mâlidâr e ger nebit tu "mulk û mâl"<sup>166</sup>

...

نیاره او ژبو دوستان دما کو بچنه قبرستان  
اوی لخواه بدن بدو دستان کو چو ژدستی مه "هی وایی"

Neyâr e ew ji bo dostân demâ ku biçne qebriştân  
Ewê l'xwe din bi du destân ku çû j' destê me "heywâyê"<sup>167</sup>

...

ای کو دوه پیر عین شفانه ابرو بدل و پاردمانه  
چاو و قهوه درگفانه "شفشقا" تزیی صدف

Ê ku doh pêr 'eyn şivân e îro bedl û pardimân e  
Çâ û qehwe dergevân e "şeqşeqâ" tizbê şedef<sup>168</sup>

...

اقه هات بهار و اما ناڤ بهار  
نه کهړک نه برخک دکن "بارهبار"

Eve hât bihâr û ema nav bihâr  
Ne kehrik ne berxik dikin "barebâr"<sup>169</sup>

<sup>164</sup> Findikî, b.n., r. 29.

<sup>165</sup> Findikî, b.n., r. 93.

<sup>166</sup> Findikî, b.n., r. 93.

<sup>167</sup> Findikî, b.n., r. 35.

<sup>168</sup> Findikî, b.n., r. 175.

<sup>169</sup> Findikî, b.n., r. 287.

### 2.2.2. Şêwaz (Uslûb)

Gava ku mirov li helbestên Findikî dinihêre bêguman zimanekî zelal û fehmbar bala mirov dikişîne. Lê zimanê wî çîqa zelal be jî vegotina xwe bi teşbîh û mecaza pir xemilandiye. Hin caran bi vegotinek şîretamîz hin caran jî bi vegotinek rexneyî helbestên xwe vedibêje. Tabî waxtê rexneyê de jî pêşî tîrên rexneyî davêje xwe. Di hin vegotinên xwe yên rexneyî de jî dewsa “tu, hun” ê de “ez, em” bikartine. Wek mînak:

...

حقیقت "ام" نبون دوستی حقیقی  
ژ لو صاری دخویهی ژ هر دو آلی

Heqîqet “em” nebûn dostê heqîqî  
Ji lew şârî dixweyhê j’herdu âlî<sup>170</sup>

Di vegotinên Findikî de gelek caran em “gazî kirin” yanî nîda dibînin. Ew yan gazî Xwedê dike an gazî dostê xwe dike an gazî mixatebên xwe an jî deng li xwe dike. Weke “Eya Rebbî” û “Gelî Dost û Hevalê min”û “Ey ‘Elî” û hwd. Xeynî gazî kirinê em rastî tekrîra jî pir tî. Ev tekrîr hin caran tekrara hin peyva ne hin caran jî tekrara hin kompeyvan e. Weke “mehâl e pur mehâl e pur mehâl” an “ax û ax” û hwd.

Hin caran meseleyên rojane bi vegotineke samîmî di helbestên xwe de bikaraniye:

تو بشینه ژ مرا توزک ژ چایی  
چکو لجم مه نما صبرا مه نایی

Tu bişyîne j’me râ tozek ji çâyê  
Çikû l’cem me nemâ şebrâ me nâyê

لسوکی کیلو چو سه بانقنوطان  
نقام بویه ژ غیر تجار و لوطان

Li sûkê kîlo çû sih banqenotân  
Neqâm bûye ji xeyr tuccâr û loţân<sup>171</sup>

---

<sup>170</sup> Findikî, b.n., r. 57.

Findikî gelek caran bi şêwaza gel diaxive ku ev di helbestên wî de xwe dide nîşan:

...

نښتیکى دخوازم از ژ سویلرا  
هنگ پز هنگى چيلک هنگى گانه

Nivîştêkî dixwâzim ez j' sewêl râ  
Hinek pez hinkî çêlek hinkî gâ ne

Şêwaza çîrokî (tehkiye) jî di helbestên Findikî de xuya dike. Jixwe di serê helbestê de dibêje ku ezê çîrokî bêjim:

...

ازى چيروكى بيژم گوه بديره  
ژسر هاتىي منه او بى گمانه

Ezê çîrokî bêjim guh bidêre  
Ji serhâtîyê min e ew bêgumân e

امى لمان ته دى يك هات ژردا  
نه وقتى هاتنى چه بكم نزانه

Emê l'mâl in te dî yek hât ji der dâ  
Ne weqtê hâtinê çi'bkim nezân e

اوى بيژى تو زانى بو چه هاتم  
ژدوهقا چيلكا من زا نبانه

Ewê bêjî tu zânî bo çi hâtîm  
Ji doh vâ çêlekâ min zâ nebân e

تو ميزينه لکتبى چيکه ژيرا  
نښتیکى ام دبیرن او ژچاقانه

Tu meyzêne l'kitêbê çêke jê râ  
Nivîştêkî em dibêjin ew j'çevâ ne<sup>172</sup>

...

<sup>171</sup> Findikî, b.n., r. 290.

<sup>172</sup> Findikî, b.n., r. 109-111.

Findikî di helbestên xwe de peyvên Kurdî, ‘Erebî û Tirkî bi hostatî bikartine:

...  
گلك گريام د دنيا لدوستكى پاك  
لعلی آخذ منه جمالی

Gelek geryâm di dunyâ l’destekî pāk  
Le’ellî âxuzû minhû cemâlî<sup>173</sup>

...  
زبشى لبر چم و نانى گنم  
كو حاطر ببينن " بنمدر بنم"

Zebeşê li ber çemm û nânê genim  
Ku hâzîr bibîtin “benimdir benim”<sup>174</sup>

Teknîka monologê jî di helbestên Findikî de dixûyê. Ew hin caran bi xwe re dipeyive û şîretan li xwe dike:

...  
على سح كه تو وعظى خو نبه مغرور بلفظى خو  
نكه تشتى نه طرزى خو ژ ره و شاشى فهى ناكى

‘Elî seḥ ke tu we‘zê xwe nebe mexrûr bi lefzê xwe  
Neke tiştê ne terzê xwe j’rih û şaşê fihê nâkî<sup>175</sup>

Findikî, helbesteke xwe weke çîrokên gelêrî qedandiye, ev yek jî wî nezî helbestvanên gelêrî kiriye:

...  
مه چيرو لدشتى دى و باق چون بحشتى  
هزار رحمت لد و باق حازرانه

Me çiro l’deştê dêwbav çûn bihiştê  
Hezar reḥmet li dêwbav hâzîrân e<sup>176</sup>

---

<sup>173</sup> Findikî, b.n., r. 59.

<sup>174</sup> Findikî, b.n., r. 327.

<sup>175</sup> Findikî, b.n., r. 33.



Bi van taybetmendiyan kifşeye ku Findikî di bin bandora Feqiyê Teyran de maye. Jixwe di malikeke xwe de behsa Feqî jî dike:

...

مرادا مه ژ خو ای جان چوا گوتی فقهی طیران  
اوه هر غفلتا قلوبان نکو ظاهر تو معنا کی

Murâdâ me j'xwê ey can çawâ gotî Feqhê Teyran

Ew e her xefletâ qelban ne ku zâhir tu me'nâ kî<sup>177</sup>



---

<sup>176</sup> Findikî, b.n., r. 123.

<sup>177</sup> Findikî, b.n., r. 27.

## BEŞA SÊYEM

### ÇEND HUNERÊN BELAËETÊ JÎ DÎWANA SEYÎD ‘ELIYÊ FINDIKÎ

#### 3.1. BEYAN

Beyan ilmekî belaxetê<sup>178</sup> ye ku li ser mebhesa heqîqet, mecaz, îstî‘are û teşbîhê disekine.<sup>179</sup>

##### 3.1.1. Teşbîh (Şibandin)

Hunera şibandinê ye. Ji bo ku peyv bêtir bihêz bibe mirov peyva bêhêz dişibîne ya bihêz. Ji vê hunerê re teşbih tê gotin.<sup>180</sup> Di dîwanê de hunera teşbîhê hin caran bê daçek hin caran jî bi daçekên; wek, weke, wekî û şubhê hatine çêkirin. Di dîwanê de daçeka şibandinê ya heri zêde hatiye bikaranîn daçeka wek (36) e. Piştê daçeka wekî (15), daçeka şubhê (3) û daçeka weke (1) ye. Bo mînak:

...

دما هات و مه ژى پرسى اوى گوت  
هيه من كافرک "وك" بى هشانه

Demâ hât û me jê pirsî ewî got  
Heye min kâvirek “wek” bêhişâ ne<sup>181</sup>

...

مدد سيدايى زنگانى بريژ فيضا "وكى" كانى  
لقى قلبى قوى جانى ده بلكى بيته سر جادى

Meded Seydâyê Zengânî birêj feydâ “wekî” kânî  
Li vî qelbê qewî cânî de belkî bête ser cîdê<sup>182</sup>

...

قه تير نابن ژ دنيا اهلى دنيا  
اگر ژ وانرا بهركى "شبهى" كانى

Qe tîr nâbin ji dunyâ ehlê dunyâ  
Eger j’wan râ biherkî “şubhê” kânî<sup>183</sup>

<sup>178</sup> Di hin kitêbên Kurdî de navê belaxetê wek “rewanbêjî” jî derbas dibe.

<sup>179</sup> Tahir-ül Mevlevî, *Edebiyat Lügati*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994. r. 27.

<sup>180</sup> Kocakaplan, b.n., r. 162.

<sup>181</sup> Findikî, b.n., r. 115.

<sup>182</sup> Findikî, b.n., r. 71.

علی وقتا کو دی عیسیٰ هفالان  
"وکه" کیسو سری خو کشانده کالان

‘Elî weqtâ ku dî îşê hevâlân  
“Weke” kîso serê xwe’kşande kâlân<sup>184</sup>

Di hunera teşbîhê de herî kê mî dido herî zêde jî çar heman hene. Emê pêşî li ser hemanên teşbîhê rawestî û dure jî behsa cureyên teşbîhê bikin.

Di teşbîhê de çar heman hene ku jê re “erkanu’t-teşbîh”an jî “eqsamu’t-teşbîh” tê gotin: a. Muşebbeh (ya ku dişibihe), b. Muşebbehun-bih (ya ku tê şibandin), c. Wecha Şebah (wesfa ku hatiye şibandin), d. Edata Teşbîhê (daçeka ku şibandinê de hatiye bikaranîn)<sup>185</sup>

Vaye li gorî hebûn û tunebûna van her çar hemanan, teşbîh dibe çar cure: 1. Teşbîha Mufessel, 2. Teşbîha Muçmel, 3. Teşbîha Muekked û 4. Teşbîha Belîx.

Em dibînin ku Findikî her çar cureyên teşbîhê jî di helbestên xwe de bikaranîye. Emê niha yek bi yek behsa van cureyê teşbîhê bikin û ji diwanê mînak bidin:

### 3.1.1.1. Teşbîha Mufeşşel

Teşbîha ku her çar erkanê teşbîhê jî tê de be ew dibe teşbîha mufessel.<sup>186</sup> Ji vê teşbîhê re “teşbîha hurgilî” jî tê gotin. Di diwanê de teşbîha ku herî zêde rastî me hat ev teşbîh bû. Wek mînak:

...  
اهلی زمانی مه بطرن وک درها دیم او درن  
قدری غریبا ناگرن ایواه ژ دردی غربتی

Ehlê zemânê me bitrin wek dirrehâ dêm ew dirin  
Qedrê xerîbâ nâgîrin eywah ji derdê xurbetê<sup>187</sup>

<sup>183</sup> Findikî, b.n., r. 137.

<sup>184</sup> Findikî, b.n., r. 153.

<sup>185</sup> Yekta Saraç, *Klâsik Edebiyat Bilgisi Belâgat*, weş. Gökkuşbe, Çap.13., İstanbul 2015. r.

129.

<sup>186</sup> Tahir-ül Mevlevî, b.n., r. 169.

<sup>187</sup> Findikî, b.n., r. 129.

Muşebbeh (ya ku dişibihe): ew (ehlê zemânê)

Muşebbehun-bih (ya ku tê şibandin): dirreh

Wecha Şebah (wesfa ku hatiye şibandin): dêm-dirr

Edata Teşbîhê ( daçeka ku şibandinê de hatiye bikaranîn): wek

Di malika li jor de helbestvan ehle zemanê bi zimanê tuj rexne dike û wana dişibîne ajalên ku bi diran û pençeyên xwe êrişên mirova dikin û zirarê didin wan.

Di helbesta li jêr de jî em dibînin ku heman teşbîh hatiye bikaranîn:

...  
ای علی تو خوش دبیژی لی بلی نییژی تو  
گوتنا خالی ژ کرنی هیچه وک خون و خیال

Ey ‘Elî tu xweş dibêjî lêbelê nâpêjî tu

Gotinâ xâlî ji kirinê hîç e wek xewn û xeyâl<sup>188</sup>

Muşebbeh (ya ku dişibihe): Gotinâ xâlî ji kirinê

Muşebbehun-bih (ya ku tê şibandin): wek xewn û xeyâl

Wecha Şebah (wesfa ku hatiye şibandin): hîç

Edata Teşbîhê ( daçeka ku şibandinê de hatiye bikaranîn): wek

Helbestvan di malika li jor de jî gotina bê ‘emel dişibîne xewn û xeyalê.

### 3.1.1.2. Teşbîha Mucmel

Teşbîha ku tenê wecha şebah yanî wesfa ku hatiye şibandin tê de tune, jê re teşbîha mucmel tê gotin.<sup>189</sup> Ev teşbîhê wateya kurt kirinê jî.

Di dîwanê de kêm be jî lê em di çend ciyan de rastî vê teşbîhê tên. Wek mînak:

---

<sup>188</sup> Findikî, b.n., r. 95.

<sup>189</sup> Tahir-ül Mevlevî, b.n., r. 169.

...

د ارشادی تو جامیری لمیدانی وکی شیرى  
بکسکی تو خوه ناسپیری که بیژی چه تو گوه نادى

Di irşâdê tu câmêr î li meydânê wekî şêr î  
Bi keskî tu xwe nâspêrî kî bêje çî tu guh nâdê<sup>190</sup>

Muşebbeh (ya ku dişibihe): tu

Muşebbehun-bih (ya ku tê şibandin): şêr

Wecha Şebêh (wesfa ku hatiye şibandin): \_\_\_\_

Edata Teşbîhê ( daçeka ku şibandinê de hatiye bikaranîn): wekî

Di helbesta li jêr de jî em dibînin ku heman teşbîh hatiye bikaranîn:

...

تو هنگی پاک و خوش میری لمیدانی وکی شیرى  
د هر دو دنیا تو تیری لمن گوتن لته داکى

Tu hingê pāk û xweşmêr î li meydânê wekî şêr î  
Di herdu dunyâ tu têr î li min gotin li te dâkî<sup>191</sup>

Muşebbeh (ya ku dişibihe): tu

Muşebbehun-bih (ya ku tê şibandin): şêr

Wecha Şebêh (wesfa ku hatiye şibandin): \_\_\_\_

Edata Teşbîhê ( daçeka ku şibandinê de hatiye bikaranîn): wekî

Helbestvan di malika li jor de mixatebên xwe dişibîne şêrê.

---

<sup>190</sup> Findikî, b.n., r. 73.

<sup>191</sup> Findikî, b.n., r. 31

### 3.1.1.3. Teşbîha Mu'ekked

Teşbîha ku tenê edat-ı teşbîh tê de tune be, ew dibe teşbîh-i muekked.<sup>192</sup> Di vê teşbîhê de her sê hemanên teşbîhê hene lê edat-ı teşbîh hatiye hezifkirin. Di vî teşbîhê de daçekên weke *wek, weke, mîna, nota, fena* û hwd. divê tune be.

Di dîwanê de em rastî teşbîh-i muekkedan jî hatin. Wek mînak:

...

علی دنیا گلك پیسه کچا ملعونی ابلیسه

یقین آخرت دچی ژ کیسه کسی ژ دل بگری دنیایی

‘Elî dunyâ gelek pîs e keçâ Mel‘unê Iblîs e

Yeqîn axret diçî’jkîse kesê j’ dil bigrê dunyâyê<sup>193</sup>

Muşebbeh (ya ku dişibihe): dunyâ

Muşebbehun-bih (ya ku tê şibandin): Keçâ Mel‘unê Îblîs

Wecha Şebah (wesfa ku hatiye şibandin): pîs

Edata Teşbîhê ( daçeka ku şibandinê de hatiye bikaranîn): \_\_\_\_

### 3.1.1.4. Teşbîha Belîx

Teşbîha belîx ew teşbihe ku tenê tê de “ya ku dişibe” û “ya ku tê şibandin” heye.<sup>194</sup> Di hin pirtûkan de, ev teşbîh weke “teşbîha rind” jî derbas dibe.

Di dîwanê de em rastî çend mîsalên teşbîha belîxê hatin. Wek mînak:

...

عذابی ناری هجرانی اگر بیته وصف دانی

کسی دیتی تنی زانی مدد سیدا مدد سیدا

‘Ezâbê nârê hicrânê eger bête weşifdânê

Kesê dîtî tenê zânê meded Seydâ meded Seydâ<sup>195</sup>

<sup>192</sup> Tahir-ül Mevlevî, b.n., r. 169.

<sup>193</sup> Findikî, b.n., r. 37.

<sup>194</sup> Kocakaplan, b.n., r. 167.

<sup>195</sup> Findikî, b.n., r. 83-89.

Muşebbeh (ya ku dişibihe): hicrân

Muşebbehun-bih (ya ku tê şibandin): nâr (agir)

Wecha Şebeh (wesfa ku hatiye şibandin): \_\_\_\_

Edata Teşbîhê ( daçeka ku şibandinê de hatiye bikaranîn): \_\_\_\_

Di helbesta li jêr de jî em dibinin ku heman teşbîh hatiye bikaranîn:

...

توی فندا شفا طاری جزیریدا قومانداری

خلیفی شاهی زیباری مدد سیدا مدد سیدا

Tu wî findâ şevâ târî cizîrê dâ qumandâr î

Xelîfê Şâhê Zîbârî meded Seydâ meded Seydâ<sup>196</sup>

Muşebbeh (ya ku dişibihe): Tu

Muşebbehun-bih (ya ku tê şibandin): findâ şevâ târî

Wecha Şebeh (wesfa ku hatiye şibandin): \_\_\_\_

Edata Teşbîhê ( daçeka ku şibandinê de hatiye bikaranîn): \_\_\_\_

Di vê mînakê de jî em dibinin ku tenê du erkanên teşbîhê hatine bikaranîn.  
Findikî mixatebê xwe şibandiye finda ku di şeva tarî de ronahî dide.

### 3.1.2. Isti'âre

Isti'âre, hunereke ku bi teşbîhê çêdibe; lê di vê teşbîhê de, ji ya ku dişibe û ya ku tê şibandin yek tenê tê bikaranîn.<sup>197</sup> Li gorî vê isti'âre dibe du beş:

#### 3.1.2.1. Isti'âreya Kifşe

Isti'âreya ku tenê hemana “ ya ku tê şibandin ” tê de hebe, ew dibe isti'âreya kifşe.<sup>198</sup> Bo mînak:

---

<sup>196</sup> Findikî, b.n., r. 85.

<sup>197</sup> Saraç, Belâgat, r. 118.

<sup>198</sup> Saraç, Belâgat, r. 119.

...

هر کسی گهداریا وان "سروی بستانا" بکت  
تو بده وی نائف و ناموسی د شرق و مغربین

Herkesê guhdâriyâ wan "serwîbostânâ" bikit  
Tu bide wî nâv û nâmûsê di şerq û meşribeyn<sup>199</sup>

Helbestvan di vê malikê de bejna mirovê hêja dişibihîne serwiyên bostana. Lê di vir de behsa wan kesan ne hatiye kirin lê behsa tişta ku ew kes dişibihinê yanî "serwîbostan" hatiye kirin.

### 3.1.2.2. Isti'âreya Nekifşe

Isti'âreya ku hemana "ya ku tê şibandin" bi eşkere nehatibe gotin lê bi hin wesf û hemanan hatibe te'rifkirin ew dibe isti'âreya nekifşe.<sup>200</sup> Di vê isti'âreyê de hamanan "ya ku dişibe" tenê tê bikaranîn. Wek mînak:

...

ته بی فایده عمر بوراند دی قلبی خو لعین روناند  
هچی قنجی ته ژى فوراند" رزا" تف چو بعدیدا

Te bê fayde 'umur bûrand di qelbê xwe Le'în rûnand  
Heçî qencî te jê fûrand "rijâ" tev çû bi 'erdê da<sup>201</sup>

Di vê malikê de helbestvan 'umr dişibîne avê; lê di dewsa avê de behsa taybetiyeke wê dike ku ew jî rijandin e.

ای خدا تقوی خو که رزقی مه ام هیفی دکن  
مه ژ "پنجی فی دنی" درخه اقا هنده نیار

Ey Xudâ teqwâ xwe ke rizqê me em hêvî dikin  
Me ji "pencê vê dinê" derxe evâ hinde neyâr<sup>202</sup>

<sup>199</sup> Findikî, b.n., r. 283.

<sup>200</sup> Saraç, Belâgat, r. 120.

<sup>201</sup> Findikî, b.n., r. 17.

<sup>202</sup> Findikî, b.n., r. 221.



Di vê malikê de helbestvan dinê dişibîne ajalan; lê di dewsa ajalê de behsa pencê wê dike.

### 3.1.3. Mecâza Mursel

Di gotinekê de ku mirov tişteki rasterast nebêje û bi wesf û hemanên wî îfade bike, ew dibe mecaza mursel.<sup>203</sup> Di dîwanê de ev huner pir kêr e. Bo mînak:

...  
ژ غفلت مه بکی بفضلا خوه هشیار  
"بقانوننا" کو دانی ام بکن کار

Ji xeflet me bikî b'feđlâ xwe hişyâr  
"Bi qânûnâ"<sup>204</sup> ku dâni em bikin kêr<sup>205</sup>

Di malika li jor de helbestvan "şerî'etê" rasterast negotiye lê dewsê de bi wesfekî wê îfade kiriye.

### 3.1.4. Kinâye

Peyvekî ku wateyên wî yê rasteqîn û mecazî hebe û mirov ji wan wateyan a mecazî bikarbîne ew dibe kinâye. Di kinâyeyê de zehfî caran gotinê pêşîyan û biwêj henin.<sup>206</sup> Bo mînak:

...  
ای علی ژ کیرا د بیژی ژ کسکیرا ناچیته میژی  
تو چقا "عزماندیژی" کا دقئ خو بینه هف

Ey 'Elî j'kî râ dibêjî j'keskî râ naçête mêjî  
Tu çiqâ "ezmandirêj î" kê devê xwe bîne hev<sup>207</sup>

<sup>203</sup> [https://tr.wikipedia.org/wiki/Mecâz-ı\\_mürsel](https://tr.wikipedia.org/wiki/Mecâz-ı_mürsel) (15.04.2016)

<sup>204</sup> Di vir de qanûn bi me'na şerî'etê hatiye bikaranîn lê rasterast şerî'et nehatiye gotin û bi wesfekî wê hatiye îfade kirin.

<sup>205</sup> Findikî, b.n., r. 169.

<sup>206</sup> Kocakaplan, b.n., r. 90.

<sup>207</sup> Findikî, b.n., r. 177.

Di vê helbestê de mebest ne wateya rasteqîn( ziman/‘ezmandirêjî) e; wateya mecaziye ku mirov ji yên pir dipeyivin re dibêje.

#### 3.1.4.1. Te‘rîz (Te‘rîd)

Te‘rîz, teknîkeke ifadeyê ye ku bi kinâyeyê re têkildar e. Em nikarin te‘rîzê ji kinâyeyê cuda bifikirin.<sup>208</sup> Te‘rîz, bi mebesta rexne û qerfê an jî ji bo şanîdana rastînekê tê nivîsîn. Di te‘rîzê de helbestvan bi awayekî veşartî hin kesa/kesan an muxatebên xwe rexne dike.

Di dîwanê de helbestên rexneyî pirin lê em nikarin bêjin ku di hemiyana de jî hunera te‘rîzê heye. Emê li jêr ji hunera te‘rîzê çend mînakên bidin:

...

كو گافا خوه ژ خوه او زیده تافین  
"ددن نیشان کو وان جه آسمانه"

Ku gâvâ xwe ji xwe ew zêde tâvên  
"Didin nîşan ku wan cih âsimân e"<sup>209</sup>

Di vê malikê de helbestvan bi awayeke veşartî hin kesan rexne dike û dibêje ku ew kes wisa xwe mezin dihesibînin ku mirov dibêje qey meqama wan li ser ruyê dinê tune, li asîmanan e.

...

أه نابیزم آه صاقیمه ژ دوستان  
"یکن ام تف دئی لیستک و بریدا"

E‘nâbêjim e‘şâfî me ji dostan  
"Yek in em tev di vê liystk û birê dâ"<sup>210</sup>

---

<sup>208</sup> Saraç, Belâgat, r. 145.

<sup>209</sup> Findikî, b.n., r. 119.

<sup>210</sup> Findikî, b.n., r. 53.

Di vê malikê de jî weke ya din, rexne rasterast xuya nake heta wek pesinandinek dixuyê lê hâlbukî helbestvan xwe jî di asta hin hevalên xwe de dibîne ku ew bi dinê re her tim mijûl in.

### 3.2. BEDÎ‘

Bedî‘ ilmekî ji belaxetê (rewanbêjî) ye ku vegotinê bi hunerên lefzî û me’newî dixemilîne.<sup>211</sup> Emê li jêr helbestên dîwanê li gor hunerên lefzî û hunerên wateyî binirxînin:

#### 3.2.1. Hunerên Lefzî

##### 3.2.1.1. Telmî‘

Di helbestekê de, hemî rêzik an jî beşekê wê bi zimanên cuda hatibin nivîsîn jê re telmî‘ tê gotin.<sup>212</sup>

Em dikarin vê malika li jêr wek mînak bidin ku him bi zimanê Kurdî û him jî bi zimanê ‘Erebî hatiye nivîsîn:

...  
دترسم از ژ مرئی پیش مرادی  
"مضی عمری ولم آخذ کمالی"<sup>213</sup>

Ditirsim ez ji mirnê pêş murâdî  
"Meḍâ ‘umrî we-lem â’xiz kemâlî"<sup>214</sup>

##### 3.2.1.2. ‘Eks

Îbarekî ku di rêzikek an hevokek de ye; mirov dawiya wê bîne serî, serê wê bîne dawî ew hunera dibe ‘eks.<sup>215</sup> Di dîwanê de hin ciyan de em rastî vê hunerê tên. Bo mînak:

...

---

<sup>211</sup> Tahir-ül Mevlevî, b.n., r. 25.

<sup>212</sup> Tahir-ül Mevlevî, b.n., r. 158.

<sup>213</sup> ‘Umrê min borî lê ez negihîştîme kemalê.

<sup>214</sup> Findikî, b.n., r. 67.

<sup>215</sup> Saraç, Belâgat, r. 267.

خوزی "وی نه کسی ناسکی نه کس وی"  
لویدی بمری کس نگری لسر وی

Xwezî **wî ne kesî** nas kî **ne kes wî**  
Li wê dê bimirê kes negrî li ser wî<sup>216</sup>

### 3.2.1.3. Cinâs (Rêgezdozî)

Di menzûmek de ku peyvên wateyên wan cuda û şikl û telifûzên wan yeksan, bi hev re bê bikaranîn jê re cinâs tê gotin.<sup>217</sup> Cinasê em dikarin di bin du şaxan de rave bikin:

#### 3.2.1.3.1. Cinâsa Temam

Di navbera peyvên bicinâs de ku bi çar awayan guncawî hebe, jê re cinâsa tam tê gotin. Ew gunacawî jî ev in:

- a) guncawiya tîpên peyvan
- b) guncawiya rêza peyvan
- c) guncawiya hejmarê peyvan
- d) guncawiya herekeyên peyva<sup>218</sup>

Cinâsa tam jî dibe du beş: yek cinâsa besît e û yek jî cinâsa murekkeb e.

#### 3.2.1.3.1.1. Cinâsa Sade (Cinâsa Besît)

Cinâsa ku bi peyvekê tenê tê bikaranîn jê re cinâsa sade tê gotin.<sup>219</sup> Ev cinâs di dîwanê de kême ciya rastî me tên. Wek mînak:

...  
امی دی ژی قبن لی هیدی هیدی  
تو فی نقلی بلبکی مه بکه هیدی

Emê dê jê vebin lê hêdî **hêdî**  
Tu vê neqlê bi libkî me' bke **hêdî**<sup>220</sup>

<sup>216</sup> Findikî, b.n., r. 157.

<sup>217</sup> Saraç, Belâgat, r. 245.

<sup>218</sup> Ji ber ku di Kurdî de hereke tune, ev gunacawî di helbestên Kurdî de derbasdar nîne.

<sup>219</sup> Kocakaplan, b.n., r. 25.

Di malika li jor de tê dîtin ku peyva “hêdî” yê de cinâs heye; lewra di rêza yekem de bi wateya “ne bilez”ê de û rêza dûyem de jî bi wateya “diyarî” de hatiye bikaranîn.

### 3.2.1.3.1.2. Cinâsa Murekkeb

Di helbestekê de yek ji peyvên bicinâs ku ji du peyva bikarhatibe jê re cinâsa murekkeb tê gotin.<sup>221</sup> Ev cinâs dibe sê şax: 1. Cinâsa Muteşebbîh, 2. Cinâsa Mefrûq û 3. Cinâsa Mefru‘ in. Di dîwanê de tenê em rastî Cinâsa Mefru‘ hatin.

#### 3.2.1.3.1.2.1. Cinâsa Mefru‘ (Cinâsa Pînekirî)

Cinâsa mefru‘ beşekê ji cinâsa murekkeb<sup>222</sup> e. Jê re cinâsa pînekirî jî tê gotin. Peyva bicinâs bi pêvekirina qetekê peyva li pêş xwe ve çêdibe.<sup>223</sup> Ev cinâsa di tîpên Latîni de xwe tam xuya dike. Bo mînak:

...  
چى تىشتا تو كى هر لميدان اوه  
هنگ دى هنه كو ببيرن نوه

Çi tiştâ tu kî her li meydân ew e  
Hinek dî hene ku bibêjin ne we<sup>224</sup>

#### 3.2.1.3.2. Cinâsa Nîvî (Cinâsa Nâtemâm)

Di navbera peyvên bicinâs de ku çar guncawiyên navborî tune be, ew dibe cinâsa nîvî. Yanî yek guncawî tenê tune be û ê din hebe jî dîsa dibe cinâsa nîvî.<sup>225</sup> Ev cinâs jî li gor kêmasiyên wan çar guncawiyên, di bin pênc serenavan de tê dabeşkirin:

---

<sup>220</sup> Findikî, b.n., r. 291.

<sup>221</sup> İsa Kocakaplan, *Açıklamalı Edebî Sanatlar*, weş. Türk Edebiyatı Vakfı, ç.8., İstanbul 2014. r. 26.

<sup>222</sup> Cinâsa murekkeb beşekê ji cinâsa tamam e. Lê em di dîwanê de rast nehatin

<sup>223</sup> Kocakaplan, b.n., r. 29.

<sup>224</sup> Findikî, b.n., r. 245.

<sup>225</sup> Kocakaplan, b.n., r. 29.

### 3.2.1.3.2.1. Cinâsa Lâhik

Di navbera peyvan de tenê ji aliyê tîpek ve neguncawî hebe, ew dibe cinâsa lahîk. Ji vê re cinâsa muteqarîb an jî cinâsa muzarî jî tê gotin.<sup>226</sup> Bo mînak:

...

وفات کر حبیبی خدا وی دمی  
ابوبکر گریا سبب وی غمی

Wefat kir Hebîbê Xudâ wê **demê**

Ebû Bekrî giryâ sebeb wê **xemê**<sup>227</sup>

...

ژبو وی گر ببی صافی ژبو ته او دبت کافی  
ژ غیر وی بزان مافی خدا داری چه غمداری

Ji bo wî ger bibî **şâfi** ji bo te ew dibit **kâfi**

Ji xeyrê wî bizan **mâfi** xudâdâr î çi xemdâr î<sup>228</sup>

### 3.2.1.3.2.2. Cinâsa Noqsan (Cinâsa Naqis)

Di navbera peyvan de tenê ji aliyê hejmara tîpan ve neguncawî hebe, ew dibe cinâsa noqsan.<sup>229</sup> Cinâsa noqsan jî dibe sê beş:

#### 3.2.1.3.2.2.1. Cinâsa Muterref

Di serê yek ji peyvên bicinâs de tîpek zêde hebe, ew dibe cinâsa muterref.<sup>230</sup> Wek mînak:

...

بزانه تو برادر راست و بی شك  
ژ هنگیقا نه چو ژ بیرا مه ایشك

Bizâne tu birâder râst û **bêşek**

Ji hingê vâ ne çû j'birâ me **êşek**<sup>231</sup>

<sup>226</sup> Kocakaplan, b.n., r. 29.

<sup>227</sup> Findikî, b.n., r. 243.

<sup>228</sup> Findikî, b.n., r. 47.

<sup>229</sup> Kocakaplan, b.n., r. 31.

<sup>230</sup> Kocakaplan, b.n., r. 31.

### 3.2.1.3.2.2.2. Cinâsa Muşewweş (Cinâsa Tevlihev)

Di peyvên bicinâs de ku tîpek zêde di navenda wan de hebe, ew dibe cinâsa muşewweş.<sup>232</sup> Bo mînak:

...

ویاژ دڤ هر یکی ددو ببیژن  
بلی بشرعی ژی او نطقی بریژن

Weyâ j' dev her yekî dido bibêjin  
Belê b'şer'ê ji ew nuţqê birêjin<sup>233</sup>

### 3.2.1.3.2.2.3. Cinâsa Muherref

Peyvên bicinâs ku ji aliyê tîpên 'Erebî ve wek hev be, lê ji aliyê telafuzê ve ne wek hev be, ew dibe cinâsa muherref.<sup>234</sup> Bo mînak:

...

علی ژ فی نعمتی دوره ژ اقبالا خواه او کوره  
چه بیژم ماجری کوره رین چه بکی خدی نادى

'Elî j'vê ni'metê dûr e ji îqbâla xwe ew **kor** e  
Çi bêjim mâcerâ **kûr** e reben çî b'kî Xudê nâde<sup>235</sup>

Di vê malikê de peyvên **کور** û **کور** her çiqas ji heman tîpan pêk hatibe jî lê di telafuzê de yek weke kor (ê ku çavên wî nabîne) ya din jî weke kûr (dirêj, bi hurgilî) tê bilêvkirin.

### 3.2.1.3.2.2.4. Cinâsa Xet (Cinâsa Xettî)

Di navbera peyvên bicinâs de tenê ji aliyê nuqtekî ve cudatî hebe, ew dibe cinâsa xet. Ev cinâs di tîpên 'Erebî de tê rastî me. Ji vê cinâsê re cinâsa xet, cinâsa xettî, cinâsa musehhef û cinâsa teshîf jî tê gotin.<sup>236</sup> Wek mînak:

---

<sup>231</sup> Findikî, b.n., r. 223.

<sup>232</sup> Kocakaplan, b.n., r. 32.

<sup>233</sup> Findikî, b.n., r. 225.

<sup>234</sup> Kocakaplan, b.n., r. 33.

<sup>235</sup> Findikî, b.n., r. 75.

...

سلامت و سحت هیه مه نها

اون تشتا ناف عالمیدا بها

Selâmet û şihhet heye me **nihâ**

Ew in tišta nav ‘âlemê dâ **bihâ**<sup>237</sup>

...

دکا رابه ژ فی حالی نبه مغرور بقی مالی

قه نابیزئی دمک خالی دچی آخر د قیرریدا

Dekâ râbe ji vî **hâlî** nebe mexrûr bi vî mâlî

Qe nâbêjî demek **xâlî** diçî âxir di qebrê dâ<sup>238</sup>

### 3.2.1.3.2.2.5. Cinâsa Mukerrer (Cinâsa Muzdewic)

Ev cinâs tê me’na dubarekirinê. Heke yek ji peyvên bicinâs, di dawiya kêteya din de be, ew dibe cinâsa mukerrer.<sup>239</sup> Wek mînak.

...

گوفند و رقص و هی هیه گر چه لطریقا دا هیه

نک نقشیا او سختیه دا هون نبین پی مبتلا

Govend û reqş û **heyhey e** gerçî l’terîqa dâ **hey**

Nik neqşiyâ ew sexte ye dâ hûn nebin pê mubtelâ<sup>240</sup>

### 3.2.1.4. Tezmîn

Mirov rêza an jî malika helbestvanek din di helbestên xwe de bikarbîne ew dibe tezmîn.<sup>241</sup> Helbestvan, rêz û malikên ku xweşa wî/wê diçe, wisa hosteyane di helbestên xwe de bikartîne ku ahenga helbestê tamam dike. Bo mînak:

<sup>236</sup> Kocakaplan, b.n., r. 34.

<sup>237</sup> Findikî, b.n., r. 285.

<sup>238</sup> Findikî, b.n., r. 19.

<sup>239</sup> Kocakaplan, b.n., r. 36.

<sup>240</sup> Findikî, b.n., r. 207.

<sup>241</sup> Kocakaplan, b.n., r.138.



...

در حقا اهلی ز مین گوئییه شیخی جزری

" غالبی اهلی زمانی ما ملا آدمی "

Derheqâ ehlê zemîn gotiye Şeyxê Cezerî

“Xâlibê ehlê zemânî mâ Melâ âdemî yîn”<sup>242</sup>

Di helbesta li jor de Seyid ‘Eliyê Findikî rêzeke Melayê Cizîrî di malika xwe de bikaraniye û hunera tezmînê çêkiriye.

### 3.2.1.5. Iqtibâs

Di nezmê û di pexşanê de, bi mebesta xemilandina gotinê û xurtkirina wateyê bikaranîna ayet û hedîsa ye.<sup>243</sup> Em di dîwanê de di çend ciha de rastî ayetan hatin ku yek jî di vê malika li jêr de derbas dibe:

...

كو "اکملتو" ریکر خدایی مجید

د ناڤا صحابان بو شاهی و عید

Ku "ekmeltû" rêkir Xudâyê Mecîd

Di nâvâ şehâbân bû şâhî û ‘îd<sup>244</sup>

### 3.2.1.6. Aliterasyon (Hevtîpî)

Ew hunera ku bi dubarekirina heman dengên dengdar pêk tê jê re aliterasyon tê gotin.<sup>245</sup> Helbestvan ji ber ku di helbestê de ahengek ava bike, hin cara heman tîpa dubare dike. Ev aheng bi tîpên dengdar jî dibe û bi tîpên dengdêr jî dibe. Wek mînak:

...

اگر فیدی ببینی دوسته هر کس

و گر نه القبالی تو لوی الی

<sup>242</sup> Findikî, b.n., r. 143.

<sup>243</sup> Kocakaplan, b.n., r. 59.

<sup>244</sup> Findikî, b.n., r. 241.

<sup>245</sup> Kocakaplan, b.n., r. 20.

Eger feydê bibînî dost e herkes  
Weger ne e'lvî âlî tu l'wî âlî<sup>246</sup>

...  
علی تو لکو اقا تو لپی کتی لکو  
چکو اف قرنی هه بی چاردهانه

'Elî tu l'ku evâ tu l'pey ketî l'ku  
Çiku ev qernê he yê çardehân e<sup>247</sup>

### 3.2.1.7. Tersî'

Di helbestekê de, ku peyvên rêzikekê bi peyvên rêzikên din re heman hejmar, heman wezn û heman qafiye be jê re tersî' tê gotin. Ji tersî'ê re tevâzun jî tê gotin. Helbestên wiha re jî helbestên muresse' dibêjin.<sup>248</sup> Di dîwanê de ev huner kême e. Wek mînak:

...  
تو غفاری ذنوبانی تو ستاری عیوبانی  
تو کشافی کروبانی کیه بی تو عفو ناکی<sup>249</sup>

Tu xeffârê zunûbân î tu settârê 'uyûbân î  
Tu keşşâfê kurûbân î kî ye bê tu 'efû nâkî<sup>250</sup>

Di malika li jor de hejmara kêteyên rêzika "heşt" e û qaliba wezna wan -bê kêmasî- "mefâ'îlun / mefâ'îlun" e û şema qafiye ya wan jî "aaa" ye.

### 3.2.1.8. İştîqâq

Di çarînek an jî malîkek de ku peyvên ji heman kokê darij bûye bihev re bê bikaranîn jê re îştîqâq tê gotin. Ev hunera jî weke cinâsê listîkekê deng û peyvane e.<sup>251</sup> Bo mînak:

---

<sup>246</sup> Findikî, b.n., r. 59.

<sup>247</sup> Findikî, b.n., r. 123.

<sup>248</sup> Dilçin, b.n., r. 488

<sup>249</sup> Ku em helbestê wek malîk bihesibînin tê de hunera tesî'ê tê dîtin.

<sup>250</sup> Findikî, b.n., r. 33.

...

برا هشیار بیه تازه بنیره  
ده تو بزانی کی میر کو گه کی میره

Birâ hişyâr bibe tâze binêre  
De tu b'zanî kî **mêrkok** e kî **mêr** e<sup>252</sup>

...

سلامان دخوازم دواما مدام  
ژ سر وه ژرب کریم سلام

Selâman dixwâzim **dewâmen mudâm**  
Ji ser we ji Rebbê Kerîmê Selâm<sup>253</sup>

...

حقیقت ام نبون دوستی حقیقی  
ژ لو صاری دخویهی ژ هر دو آلی

**Ĥeqîqet** em nebûn dostê **Ĥeqîqî**  
Ji lew şarî dixweyhê j'herdu âlî<sup>254</sup>

### 3.2.1.9. Reddu'l-'Acûz 'Ale's-Sadr

Peyveke ku di helbestê de di dawiya malikê de di pexşanê de dawiya hevokê de an di dawiya îbarekê de hatibe nivîsîn û heman peyv pêşî de jî hatibe dubarekirin jê re reddu'l-acûz ale's-sadr tê gotin.<sup>255</sup>Bo mînak:

...

نه هچیی کو بدف خوش کرزلامه  
زلامی تشنکه درمان دوامه

Ne heçyê ku bi dev xweş kir **zelâm** e  
**Zelâmî** tiştek e derman dewâm e<sup>256</sup>

<sup>251</sup> Kocakaplan, b.n., r. 85.

<sup>252</sup> Findikî, b.n., r. 313.

<sup>253</sup> Findikî, b.n., r. 293.

<sup>254</sup> Findikî, b.n., r. 57.

<sup>255</sup> Saraç, Belâgat, r. 263.

<sup>256</sup> Findikî, b.n., r. 315.

...

تو نابینی ژ غیرى دوستى فیدی

اگر فیدی نبینی وی بغیدی

Tu nâbînî ji xeyrî dostê feydê

Eger feydê nebînî wê bixeydê<sup>257</sup>

...

دعا ام دی بکن تو ژى دعا که

دعا باشن ژ درمانى خدانه

Du‘â em dê bikin tu jî du‘â ke

Du‘â bâş in ji dermânê Xudâ ne<sup>258</sup>

### 3.2.1.10. Tekrîr

Tekrîr, hunera dubarekirinê ye.<sup>259</sup> Eger ku di rêza helbestekê de peyvek an peyvin du sê caran bêne dubarekirin, li wir hunera tekrîrê çêdibe.

Tekrîr him îfadeyê zelal dike û him jî balê dikişîne li ser peyva dubare û herwiha banadora vegotinê xurt dike.<sup>260</sup>

Di dîwanê de em pir rastî hunera tekrîrê hatin. Hin ji wan tekrîra weke kompeyvan hin weke cotpeyvan û hin jî weke hevokan bûn.

Ji bo tekrîrên ku di halê kompeyvan de ne mînak:

...

ای کو بیژی از بخوه بگهم خدی بی مرشدی

اڤ خیالا وی محاله پر محاله پر محال

Ê ku bêje ez bi xwe bighim Xudê bê murşidî

Ev xiyâlâ wî mehâl e pur mehâl e pur mehâl<sup>261</sup>

<sup>257</sup> Findikî, b.n., r. 153.

<sup>258</sup> Findikî, b.n., r. 111.

<sup>259</sup> Kocakaplan, b.n., r. 145.

<sup>260</sup> Saraç, Belâgat, r. 197.

<sup>261</sup> Findikî, b.n., r. 95.

Ji bo tekrîrên ku di halê hevokan de ne mînak:

...

ای غربتی ای غربتی ای غربتی ای غربتی  
ای غربتی ای غربتی ایواه ژ دردی غربتی

**Ey xûrbetê ey xûrbetê ey xûrbetê ey xûrbetê**

**Ey xûrbetê ey xûrbetê eywâh ji derdê xûrbetê<sup>262</sup>**

Ji bo tekrîrên ku di halê cotpeyvyan de ne mînak:

...

در و گوهر بنه وندا کسپ و مسپک مان بشوندا  
تو بنیر سرداری گندا آخ و آخ و صد اسف

Durr û gewher bûne windâ kesp û mespik man bi şûn dâ

Tu binêr serdârê gundâ **âx** û **âx** û sed esef<sup>263</sup>

### 3.2.1.11. Irsâla Mesel

Di hunerên devkî û nivîskî de bikaranîna gotinên pêşiyên û wecîzeyên ne.<sup>264</sup> Bo mînak:

...

ضربو مثل مشهور هیه "خوش کتیه لجهی خو یه"<sup>265</sup>  
کو ها بکن شیجی مه یه رحمة الله لمه جاهلا

Derbûmesel meşhûr heye "xweş ketiye'l cihê xwe ye"

Ku hâ bikin şeyxê me ye reḥmetullâ li me câhilâ<sup>266</sup>

### 3.2.1.12. Irsâd

Helbestvan ku di malikekê de bi rêya qaffiyeyê û di gotinê mensûr de jî bi rêya secî yê dawiya gotinê bi xwendevan bide hisandin ew dibe irsâd.<sup>267</sup> Bo mînak:

---

<sup>262</sup> Findikî, b.n., r. 125.

<sup>263</sup> Findikî, b.n., r. 175.

<sup>264</sup> Kocakaplan, b.n., r. 65.

<sup>265</sup> Buyereke ku di zemanêke guncaw de qewimî be jê re wisa dibêjin

<sup>266</sup> Findikî, b.n., r. 201.

...

دخوازن ژ بو وه وصا راحتى  
كو هون قط نبينن تو جا زحمتي

Dixwâzin ji bo we wişâ **râhetê**  
Ku hûn qeṭ nebînin tu câ **zeḥmetê**<sup>268</sup>

### 3.2.2. Hunerên Wateyî

#### 3.2.2.1. Tecâhula ‘Arif

Bingeha vê hunerê ew e ku mirov xisusekî ku dizan e, bi mebesta qerfekê xwe nezan bide nîşan. Jixwe, hunermend bi vê rewşê dixwaze ku peyamek bide mixatebên xwe.<sup>269</sup>Bo mînak:

...

چه طام دیت ته ژ دنیائی كو هنده ته تبات نائی  
دكم ناكم تو نای رائی ترا كتمه بلاييدا

Çi tîm dît te ji dunyâyê ku hinde te tebât nâyê  
Dikim nâkim tu nây râyê te râ ketme belâyê dâ<sup>270</sup>

#### 3.2.2.2. Tenâsûb

Mirov ku di malikek an çarînek de peyvên ku ji aliyê wateyê ve bi hev re munasib û tîkildar in bikarbîne, ew dibe tenâsûb.<sup>271</sup>Di dîwanê de em pir rastî hunera tenâsûbâ hatin, lê emê bi du minaka kurtvebirin:

...

ژ باران و برف و ژ صر و سقم  
جهی مه هما بیژ کو بویه عدم

Ji **bârân** û **berf** û ji **şirr** û **seqem**  
Cihê me hemâ bêj ku bûye ‘edem<sup>272</sup>

<sup>267</sup> Kocakaplan, b.n., r. 62.

<sup>268</sup> Findikî, b.n., r. 295.

<sup>269</sup> Kocakaplan, b.n., .r. 139.

<sup>270</sup> Findikî, b.n., r. 23.

<sup>271</sup> Tahir-ül Mevlevî, b.n., r.162.

...

سوالی جھی مه تلف بو کثیر  
نه شیره نه ماسته نه دوهن و پنیر

Sewâlê cihê me telef bû keşîr  
Ne şîr e ne mast e ne dohn û penîr<sup>273</sup>

### 3.2.2.3. Husnu't-Te'lîl

Di bûyerekê an halekî de mirov ku esil sedemê nebêje û di dewsê de sedemekê din ê xweştirîn nîşan bide, ew dibe husnu't- te 'lîl. Wek mînak:

...

شف و روژی بهژمیری ژ عمری  
حتا شفی "بیت مهفانی قبری"

Şev û rojê bihêjmêrî ji 'umrê  
Hetâ şevkî "bibit mihvânê qebrê"<sup>274</sup>

Helbestvan nabêje ku sedema ketina qebrê mirin e. Di dewsa mirinê de sedemek xweştir dibêje ku ew jî mihvantî ya qebrê ye.

### 3.2.2.4. Telmîh

Telmîh tê wateya bîranînê. Helbestvan ku di helbestekê de behsa bûyerekê an kesayetekê/î meşhur bike jê re telmih tê gotin.<sup>275</sup> Di dîwanê de ev hüner pir in. Wek mînak:

Seyid 'Elî di malikeke xwe de behsa Leyla û Mecnûn dike ku em ji navên wan qisseya wanê meşhur bibîrtînin:

...

ژ دور بونا ته زیبایی دنالم از و کی نایی  
وکی "مجنونی لیلابی" دکم گزند ژ دورانی

<sup>272</sup> Findikî, b.n., r. 287.

<sup>273</sup> Findikî, b.n., r. 287.

<sup>274</sup> Findikî, b.n., r. 155.

<sup>275</sup> Kocakaplan, b.n., r. 149.

Ji dûrbûnâ te zîbâyê dinâlim ez wekî nâyê  
Wekî "Mecnûnê Leylâyê" dikim gâzind ji dewrânê<sup>276</sup>

Di helbesteke dinê de jî helbestvan ‘eşqa destanî ya Mem û Zîn tîne bîranîn:

...

علی بسکه ژ نالینی تو ناوستی ژ کالینی  
صبر که وک "ممی زینی" اوه درمان ژ طبخانی

‘Elî bes ke ji nâlînê tu nâwestî ji kâlînê  
Şebir ke wek “Memê Zînê” ew e dermân ji tîbxânê

### 3.2.2.5. Leff û Neşr

Di vegotinekê de pêşî hinek heman bê gotin û piştê jî hemanên ku bi wan re tîkildarin bê rêzkirin, ew dibe leff û neşr.<sup>277</sup> Leff û neşr li gorî cihê peyvên dibe du beş. Ku di helbestekê de hemanên bi hev re tîkildar bi rêzekê hatibe nivîsîn ew dibe leff û neşra muretteb; lê ku hemanên bi hev re tîkildar ne bi rêzê hatibe nivîsîn ew jî dibe leff û neşra muşewweş.

Di dîwanê de em tenê rastî leff û neşra muretteb hatin. Bo mînak:

...

نه از شیخم کو و عطفی کم نه مالدارم کو خیری کم  
دوسی بیتا ازی چیکم ژ غیری فی ژ من نایی

Ne ez **şeyx im** ku **we‘zê kim** ne **maldâr im** ku **xêrê kim**

Du-sê beytâ ezê çêkim ji xeyrê vê ji min nâyê<sup>278</sup>

### 3.2.2.6. Muqabele

Di vegotinekê de pêşî ku du yan jî du zêdetir peyvên bînan gotin û piştê jî hin peyvên ku ji aliyê wateyê ve muqabil an dijê wan bînan bikaranîn ew dibe muqabele<sup>279</sup> Bo mînak:

<sup>276</sup> Findikî, b.n., r. 97.

<sup>277</sup> Saraç, Belağat, r. 179.

<sup>278</sup> Findikî, b.n., r. 39.



...

بیبی جنتی وی بفضل و کرم

نده وی بجهنم تو ایش و الم

Bibî cennetê wî bi feql û kerem

Nede wî b'cehennem tu êş û elem<sup>280</sup>

...

فقط گل بی ستری نابی خزینه بی طلسم نابی

خوشی بی غم تو جا نابی خدا یک بی یکی نادى

Feqet gul bê stirî nâbî xezîne bê tilsim nâbî

Xweşî bê xem tu câ nâbî xudâ yek bê yekî nâde<sup>281</sup>

### 3.2.2.7. Tezâd (Dijtî)

Wateya tezadê ew e ku peyvên di navbera wan de dijtî hebe di ibarekî de bê komkirin. Bi dijtîyê mebest ne tenê dijtîkî weke reş û sipî ye; tiştê ku di hişê mirov de weke erênî û neyinî tê bîranîn jî dibe tezd.<sup>282</sup> Di dîwanê de ev huner pir hatine bikaranîn weke peyvên dûr û nêzîk, şev û roj, subh û êvar, firaq û weslet, rahet û zehmet, qena'et û temahî û hwd. Bo mînak:

...

شف و روژی بهژمیری ژ عمری

حتا شفکی ببیت مهفانی قیری

Şev û rojê bihêjmêrî ji 'umrê

Ûeta şevkî bibit mihvânê qebrê<sup>283</sup>

...

بخوه کدا دستی خو بلا جه بت نواله

نینه چبتر ژ قناعت طماهی نه تو حاله

<sup>279</sup> Saraç, Belâgat, r. 164.

<sup>280</sup> Findikî, b.n., r. 245.

<sup>281</sup> Findikî, b.n., r. 73.

<sup>282</sup> Saraç, Belâgat, r. 179.

<sup>283</sup> Findikî, b.n., r. 155.

Bixwe kedâ destê xwe bila cih bit newâle  
Nîne çêtir j' **qenâ'et** **temâhî** ne tu hâl e<sup>284</sup>

### 3.2.2.8. Sihra Helâl

Helbestvan, peyvekê an kompeyvekê wisa watedar di dawiya rêza pêşî de bikartîne ku rêza paşî jî pê watedar dibe.<sup>285</sup> Em ji vê hunerê re sihra helal dibêjin. Bo mînak:

...

مقامك عاليه دعواي دوستي  
قبول ناكي ژ غير راست و درستي

Meqâmek 'âliye de'wâyê dostî  
(de'wâyê dostî) Qebûl nâkit ji xeyr râst û durustî<sup>286</sup>

Wek ku li jor jî tê dîtin em kompeyva "de'wâyê dostî" di serî rêza duyem de jî bikarbînin wateya malikê xirab nabe.

### 3.2.2.9. Tefrîq

Hunera tefrîqê de helbestvan du tiştan an du bûyeran dide berhev û bi kêmasîya yekê qîmeta a din dide nîşan.<sup>287</sup> Bo mînak:

...

اف چه یازوخه چه حیفه بقا چند روزی دنی  
تو ژدستی خو بکی لذت و کیفا ابدی

Ev çi yâzox û çi heyf e bi va çend rojê dinê  
Tu ji destê xwe bikî lezzet û keyfâ ebedî<sup>288</sup>

---

<sup>284</sup> Findikî, b.n., r. 323.

<sup>285</sup> Kocakaplan, b.n., r. 127.

<sup>286</sup> Findikî, b.n., r. 151.

<sup>287</sup> Kocakaplan, b.n., r. 145.

<sup>288</sup> Findikî, b.n., r. 215.

Helbestvan dinê û axretê berawird dike û jiyana a dinê bi çend roja îfade dike lê jiyana axretê wek keyf û lezzeta ebedî îfade dike.

### 3.2.3. ME‘ANÎ

Me‘anî yek ji ilmên belaxetê ye. Di vir de gorê rewşê an mixatebê an jî xatibê kîjan lefz guncaw be ew tê bikaranîn.

#### 3.2.3.1. Nidâ’

Di ferhengê de tê wateya “dengkirin” ê. Bi vê hunerê, hest û kelecane pir xurt tê vegotin. Dama ku hunermend bi bandora tiştê an bûyereke pir kelecane dibe, wê tiştê dikesîne û bang lê dike.<sup>289</sup> Gelek caran bi peyvên weke “ey, ya, eya” tê bikaranîn:

...  
ايارب رجاكارم لدرگاہی ته زارزارم  
ژ میلاکی بریندارم برینا من تو درمان کی

**Eyâ Rebbî** ricâkâr im li dergâhê te zârzâr im

Ji mêlâkê birîndâr im birînâ min tu dermân kî<sup>290</sup>

#### 3.2.3.2. Istifhâm

Helbestvan, mijareke ku bersiva wê dizane, weke pirs di helbesta xwe de bikarbîne jê re istifhâm tê gotin. Bi vê hunerê mebesta helbestvan ne bersivandina pirsê ye; ji bo bandora gotinê xurt bike û balê bikişîne ser mijarê.<sup>291</sup> Bo mînak:

...  
علی رابه وها نابی بحیل و پیله چینابی  
عمر بوری مرن هابی چرا تدبیر کی ناکی

‘Elî râbe wihâ nâbê bi hîl û pîle çênâbê

‘Umur borî mirin hâ bê çirâ tedbîrekê nâkî<sup>292</sup>

---

<sup>289</sup> Kocakaplan, b.n., r. 113.

<sup>290</sup> Findikî, b.n., r. 33.

<sup>291</sup> Kocakaplan, b.n., r. 79.

...

ولم يبق في العمر من فسحة  
فهل من ضياء يزيل الظلام؟

Di ‘umrêm nemâye qeṭ tu firehî  
Ma heye roniyek belav kit zelâm?<sup>293</sup>

...

تینه نك شیخ و ملا گیا کو او صلحی بکن  
حالبوکی کنگی بیا شیخ و ملایی خوه دکن

Tenê nik şeyx û melâ goyâ ku ew şulhê bikin  
Ḥalbukî kengî bi yâ şeyx û melâyê xwe dîkin?<sup>294</sup>

### 3.2.3.3. İltifât

Di menzûmek an mensûrekî de ku mirov gotinê ji kesê/a mixateb (tu, hûn) biguherîne li ser kesê/a xeybî an ji kesê/a xeybî biguherîne li ser kesê/a mixateb an ji ji kesê/a mutekellim biguherîne li ser kesê/a xeybî an jî mixateb jê re iltifât tê gotin.<sup>295</sup> Bo mînak:

...

نینن حکیم عیش چیبکن ناف عالمیدا من سکن  
درد و بلا درمان بکن شوقی بدی وک فنری

Nînin hekîm îş **çêbikin** nav ‘âlemê dâ bin **sekin**  
Derd û belâ dermân **bikin** şewqê **bidî** wek fenerê<sup>296</sup>

Di malikê de pêşî kesên xeybî yanî “ew” sê car hatiye gotin du re “ew” hatiye guhertin û di dewsê de kesê/a mixateb yanî “tu” hatiye bikaranîn.

<sup>292</sup> Findikî, b.n., r. 25.

<sup>293</sup> Findikî, b.n., r. 301.

<sup>294</sup> Findikî, b.n., r. 145.

<sup>295</sup> Saraç, Belâgat, r. 204.

<sup>296</sup> Findikî, b.n., r. 239.

#### 3.2.3.4. Teşxîs (Kesandin) û Intaq (Peyivandin)

Teşxîs tê wateya kesandinê. Intaq jî peyivandin e. Bingeha van hunera ew e ku taybetiyên mirovî û şexsî ku ji bo hebûnên ne mirov an jî ji bo tiştên bêcan were bikaranîn.<sup>297</sup> Ev tiştên ku me gotin eger bê kesandin ew dibe teşxîs; eger bê peyivandin ew dibê intaq. Bo mînak:

...

ام كتینه ئاف کلافی فی دنیدا هی هوار  
کنگی ام دی در کفن ژ دستی اقی پیرا غدار

Em ketîne nav kulâfê vê dinê dâ hey hewâr  
Kengî em dê derkevin j' destê evê pîrâ xedâr<sup>298</sup>

Helbestvan di malika li jor de dinê dikesîne pîrâ xedar û bi vî awayî hunera teşxîs ê bikartîne.

Di malika li jêr de jî him dinê dikesînê mirovan û him jî wê weke mirovan dide peyivandin. Herwiha him teşxîs û him jî intaq heye:

هی الدنيا تقولو لطالبیها  
الی این تنحوا عن شراری

Ew e dunyâ dibêje tîlibên xwe  
Revâ we ji şerê min bi ku der e

فلیس لی وفاء لصدیق  
انادیکم بهذا فی الجهاری

Tu wefâ min tunîn e j' dostekî re  
Ez bi vê gâzî we dikim eşkere<sup>299</sup>

...

#### 3.2.3.5. Mubâlexe

Bi bandora kelecane, mezinkirin an jî biçûkkirina bûyerekê re mubâlexe tê gotin.<sup>300</sup> Bo mînak:

---

<sup>297</sup> Kocakaplan, b.n., r. 176.

<sup>298</sup> Findikî, b.n., r. 217.

<sup>299</sup> Findikî, b.n., r. 103.

...

کر کو "چافی مه بیت سپی و کی یعقوب ژ گرین"

هندکه هیژی ژ قحرا چوینا شاهی مزن

Ger ku "çavê me bibit spî wekî Ye'qûb ji girîn"

Hindik e hêjî ji qehrâ çûyinâ şâhê mezin<sup>301</sup>

...

نصیبسز شبهی من نینه ژ "هجری من جگرخوینه"

بلتفا خوه تو بیربینه اقی عبدی دریزانی

Neşîbsiz şubhê min nîn e "ji hicrê min ceger xwîn e"

Bi lutfâ xwe tu bîr bîn e evî 'ebdê derîzânê<sup>302</sup>

### 3.2.3.6. Tecrîd

Helbestvan ku xwe wek kesekî/ê mucerred bihesibîne û bang li xwe ke ew dibe tecrîd.<sup>303</sup> Bo mînak:

...

علی پالده وره رایى بشو خوه ژ اهلی دنیایی

گلو ما قط ته بیر نایی ندیت ته ژوان ژ غیر صاری

'Elî pal de were râyê bişo xwe j'ehlê dunyâyê

Gelo mâ qeţ te bîr nâyê nedît te j'wan ji xeyr şârî<sup>304</sup>

### 3.2.3.7. Î'câz

Bi gotinên kurt îfadekirina wateyên kûr e. Ji gotinên wiha re "wecîze, wecîz, mûcez" jî tê gotin.<sup>305</sup> Bo mînak:

<sup>300</sup> Kocakaplan, b.n., r. 107.

<sup>301</sup> Findikî, b.n., r. 271.

<sup>302</sup> Findikî, b.n., r. 99.

<sup>303</sup> Tahir-ül Mevlevî, b.n., r. 152.

<sup>304</sup> Findikî, b.n., r. 41.

<sup>305</sup> Kocakaplan, b.n., r. 52.

...

"دما عیش تمام بو زوالا وی تی"

وها هاتییه دیتن لگور عادتی

"Demâ 'îş tamam bû zewâlâ wê tê"

Wihâ hatye dîtin li gor 'âdetê<sup>306</sup>

### 3.2.3.8. Pirs û Bersiv

Di helbestekê de ku pirsekê bi bersiva wê re bê bikaranîn, jê re hunera pirs û bersivê tê gotin.<sup>307</sup> Bo mînak:

...

گر پرسا من دکی تو کا حالی من جه حاله

پیشتی ته دی چوا بوم بو مه بطوطه و کاله

Ger pirsâ min dikî tu ka hâlê min çi hâle

Piştî te dê çewâ bûm bûme peţote û kâlê<sup>308</sup>

### 3.2.3.9. Îham

Îham tê wateya wehim dayinê. Yanî helbestvan di helbestê de bêjeyekê wisa bikartîne ku bi çend wateya bê fehm kirin. Xwendevan jî di navbera van wateyan de dimîne û peyvê li gor xwe watedar dike.<sup>309</sup> Bo mînak:

...

جزیر هر تو بشاهی بی لدر حفظالهی بی

ژ هر نوعی فراهی بی مدد سیدا مدد سیدا

Cizîr her tu bi şâhî bî<sup>310</sup> li der hîfzâ ilâhî bî

Ji her new'î firâhî bî meded Seydâ meded Seydâ<sup>311</sup>

<sup>306</sup> Findikî, b.n., r. 241.

<sup>307</sup> Abdalbaki Turan, *Melayê Cizîrî Divanî ve Şerhi*, weş. Nubihar, İstanbul 2010, r.177.

<sup>308</sup> Findikî, b.n., r. 321

<sup>309</sup> Kocakaplan, b.n., r.53.

<sup>310</sup> Ev gotin tê du wateya; yek ew e ku tu bextewar û kêfxweş bî a din jî tu xwedî pêşeng û lîder bî.

<sup>311</sup> Findikî, b.n., r. 87.

Di malikê de peyva “şahî ” yê him di me‘na “cejn û kêf û xweşî”yê hatiye bikaranîn him jî bi me‘na “padişah û serwer”ê hatiye bikaranîn. Helbestvan di vir de herdu wateyan jî qest kiriye.

### 3.2.3.10. Terdîd

Helbestvan ku di serê gotinê de fikrekê bibêje û di dawiyê de jî ji wê fikra xwe vegere ew dibe terdîd.<sup>312</sup>Bo mînak:

Helbestvan pêşî pir xweş behsa dostan dike û paşê jî ji gotina xwe vedigere:

...

تى بېژى اف دوستى ژ دلن ماشاءالله تف كاكلن

"يك روحين و دو شكلكن ته هو دى بون لفقرا كرى"

Tê bêjî ev dostê j’ dil in mâşâellah tev kâkil in

“Yekrûh in û duşekil in te hew dî bûn l’ fikrâ kere”<sup>313</sup>

...

مه جرباندن ژ خلقى پر حتا دوست و برا و كر

"حجى گوتى همى بون فر" خدادارى چه غم دارى

Me cerbandin ji xelqê pur hetê dost û birâ û kur

"Heçî gotî hemî bûn vir" Xudâdâr î çî xemdâr î<sup>314</sup>

---

<sup>312</sup> Kocakaplan, b.n., r. 158.

<sup>313</sup> Findikî, b.n., r. 237.

<sup>314</sup> Findikî, b.n., r. 49.



## BEŞA ÇAREM NAVEROK Û MIJARÊN DÎWANA FINDIKÎ

### 4.1. Temayên Helbestên Findikî

Dîwan ji aliyê mijarê ve pir rengîn be jî lê exlebî çend mijar dertên pêş. Emê wan mijaran yek bi yek binivîsin û ji helbestên dîwanê mînakên bidin:

#### 4.1.1. Dostanî

Mijareke ku Seyid ‘Eliyê Findikî pir li ser rawestiye dostanî ye. Nêzî 10 helbestên xwe de seranser behsa dostaniyê dike û di helbestên din de jî bi awayekî temasê vê mijarê dike. Ew her tim di helbestên xwe de behsa dostaniya heqîqî û dostaniya ehlê dinê dike û wana dide ber hev.

Di hin helbestên xwe de behsa dostê zir û sexte dike û mixatebên xwe îqaz dike:

اگر ظاهرده او دوستن د باطنده تنی بوستن  
حمی یک کیش و یک بوستن ژ وان دور به بهشیاری

Eger zâhir de ew dost in di bâtin de tenê post in  
Hemî yek kêş û yek bost in ji wan dûr be bi hişyârî<sup>315</sup>

Di helbesta şeşem ku bi navê “Wefa û Dostî Çûn Bûne Windâ”<sup>316</sup> de ji ber dostiya nejidil û dostaniya derewîn sîtem dike:

وفاء و دوستی چون بونه وندا  
نزائن ام بچینه لکی دریدا

Wefâ û dositî çûn bûne windâ  
Nizânin em biçîne l’kê derê dâ

اگر بهنک ژ جم جامیرکی بی  
هزار مانع بهفرا تینه ریدا

---

<sup>315</sup> Findikî, b.n. , r. 41.

<sup>316</sup> Findikî, b.n. , r. 53.

Eger bêhnek ji cem câmêrekî bê  
Hezar mâni‘ bi hev re têne rê dâ

خلاف تف گرافه دوستیامه  
ژلورا ام کتن فی انقریدا

Xilâf û tev gerâv e dostiyâ me  
Ji lewrâ em ketin vê enqerê dâ

...

Di helbesta heftem ku bi navê “Ela Ya Eyyuhel-Îxwanu Ma Li”<sup>317</sup> de dostê heqîqî û dostê derewîn berawirdî hev dike:

Demek mexrûr dibûn em şubhê dostan  
Wekî dest û birâ me d’kir hevâlî

...  
دمک مغرور دیون ام شبهی دوستان  
وکی دست و برا مه دکر هفالی

Heqîqet em nebûn dostê heqîqî  
Ji lew şarî dixweyhê j’herdu âlî

حقیقت ام نبون دوستی حقیقی  
ژ لو صاری دخویهی ژ هر دو آلی

Heçî dostê heqîqî ne j’dil û cân  
Dikin qurbâna dostan cân û mâlî

حچی دوستی حقیقینه ژ دل و جان  
دکن قربانا دوستان جان و مالی

Eger dostek b’esîrî bê firotin  
Bi wî em nâdine qurşek kemâlî

اگر دوستک بسیری بی فروتن  
بوی ام نادنه قرشک کمالی

اگر فیدی ببینی دوسته هر کس  
و گر نه القیالی تو لوی آلی

---

<sup>317</sup> Findikî, b.n., r. 57.

Eger feydê bibînî dost e herkes

Weger ne e'lvî âlî tu l'wî âlî

...

Findikî di helbesteke dinê de “dostaniya ehlê zemîn” rexne dike û dibêje ku mirov ewlehiya xwe pê neyne:

...

امنیت نینه لسه دوستانیا اهلی زمین

پر عجیب و پر غریبه ریز و رسما اودکن

Emniyet nîn e li ser dostaniyâ ehlê zemîn

Pur'ecîb û pur xerîb e rêz û resmâ ew dîkin

ایرو دوستن او هفرا تو دبیژی جان فدا

روژا پاشی تو دنیری ارزو حالاً لف ددن

Îro dost in ew ji hev râ tu dibêjî cânfidâ

Rojâ paşî tu dinêrî erzûhâlâ lev didin<sup>318</sup>

Di hişê helbestvan de hertim dostaniyekî îdeal heye. Li gorî wî doza dostaniyê meqamek wisa bilin de ku ancax bi rastî û durustiyê mirov digihêje wê meqamê. Ji ber vê yekê helbestvan her çi dostaniya derketiye pêşiya wî li gor vê dostaniyê dinirxîne. Hin caran rexne dike û hin caran jî dipesîne:

...

مقامك عالیه دعواى دوستی

قبول ناکیت ژ غیر راست و درستی

Meqâmek ‘âlî ye de'wâyê dostî

Qebûl nâkit ji xeyr râst û durustî<sup>319</sup>

Dîsa di heman helbestê de helbestvan xwe û yên dora xwe rexne dike û dibêje ku me dositanî(dostanî) bire helaketê:

---

<sup>318</sup> Findikî, b.n. , r. 145.

<sup>319</sup> Findikî, b.n., r. 151.

...

قدا لىسرمه بکڤى اهلى زماني

مه بر هتک و هلاکا دوستاني

Qedâ l'ser me bikevê ehlê zemânî

Me bir hetk û helâkâ dositânî<sup>320</sup>

Helbesta 21an seranser li ser dostaniyê ye. Ev helbest duwazdeh malik e lê emê bi çend malikan kurt vebirin:

حمد و ثنا ربى ژ تراعلى لدنى گلکى گرا

قطوى ندی دوستک ژ خورا کير بى د روزا طنڤی

Hemd û şenâ Rebbî j'te râ 'Elî l'dinê gelkî gerâ

Qeṭ wî nedî dostek j'xwe râ kêr bê di rojâ tengiyê

بويه غلا دوستى ژدل بيكى تو نابينى ژ چل

ژبونا افى بوم دل بکلمامه د تقن و حرى

Bûye xelâ dostê ji dil yêkê tu nâbînî ji dil

J'bonâ evê bûm dilbikul mâme di teqn û heriyê

Helbestvan bêzarbûna xweya ji dostê zemanî di berdewama helbestê de tîne zimên:

قط گوه ندى دوستى زمان ژ من پرس بکن حالى اوان

ژدستى اوان صد الامان قط ژ وان نخوازن قنجی

Qeṭ guh nedin dostê zeman j'min purs kin hâlê ewan

J'destê ewan şed el-eman qeṭ j'wan nexwâzin qencyê

دوستى ته دى خوش کر بدف تو او ژ دل نڤهائى هف

حنا تو کارى ژى برف ژحر بگرى ژوى دوستاني

Dostê te dî xweş kir bi dev tu ew ji dil neghâyi hev

Ḥettâ tu kêrî jê birev jehr bigrî j'wê dostaniyê

<sup>320</sup> Findikî, b.n. , r. 153.

تی بیژی اف دوسته زال قربان بکم از جان و مال  
هی ته نگوتی دال و ذال وی لته بکی بی بختیی

Tê bêjî ev dost e zelâl qurban bikim ez cân û mâl  
Hê te negotî “dâl û zâl” wê l’te bikî bêbextiyê

Findikî di helbesteke din de dibêje ku divê dost ji dil û can be û ji hîleyê berî  
be:

...  
هزار حیفه کو دوستانی نه صافی بی ژ دل و جانی  
بیه بحیله و دو عزمانی مه جرباندیه صد جاری

Hezâr heyf e ku dostânî ne şâfî bê j’dil û cânî  
Biye b’hîle’w du’ezmânî me cerbandiye şed cârî<sup>321</sup>

Di helbesteke xwe ya din de jî wiha behsa çawanî bûna ya dostaniyê dike:

...  
دقی دوست لّف بکن صبری شریک بن خوشی و قحری  
حتا کو او بچن قبری اگر نه هیچه او یاری

Divê dost lev bikin şebrê şerîk bikin xweşî’w qehrê  
Hetâ ku ew biçin qebrê eger ne hîç e ew yârî<sup>322</sup>

Seyid ‘Elî, pirî caran xwe ji hemî dostan micerred dike û di encamê de dibêje  
ku Xuda (Xweda) dostê mirov be ew kafî ye:

...  
ولی باشه کو دوستی مو خدایت  
اوه کافی تو تئشت بی وی قه نابت

Welê baş e ku dostê mû Xudâ bit  
Ew e kafî tu tişt bê wî qe nâbit<sup>323</sup>

---

<sup>321</sup> Findikî, b.n. , r. 41.

<sup>322</sup> Findikî, b.n., r. 43.

<sup>323</sup> Findikî, b.n. , r. 315.

Dîsa di helbesteke dinê de dibêje ku di vî zemanî de dostê safî her Xuda ye û xeynî Wî tuneye:

...  
کسی بخوازی فی وقتی دوستی صافی  
ژ خدا بیفا بلا باورکی مافی

Kesê b'xwâzê vî weqtî dostê şâfî  
J'Xudâ pê va bilâ bâwer kê mâfî<sup>324</sup>

Elhasil li gor helbestên li jor jî em dibînin ku Seyid 'Elî di helbestên xwe de bi çar awaya li ser mijara dostaniyê rawestiyaye: 1. Dostaniya Xwedê Te'âlâ 2. Dostaniya dostên berê û dostên Xwedê 3. Çawaniya Dostaniyê û 4. Dostaniya ehlê zemanî ye ku Seyid 'Elî vê dostaniyê di her derfetê de rexne dike.

#### 4.1.2. Tesewif û Zuhd

Tesewif di berhemên klasîk de mijareke girîng e ku zehfên wêjenasan piştî Musulmaniyê ev mijar di berhemên xwe de bikaranîne. Pênaseya tesewifê jî ev e: "Tesewif, jiyaneke me'newî û derûnî ye ku mirov di çarçoveya hukmê zahir û batinê Îslamê de dijî."<sup>325</sup>

Zuhd jî têgiheke tesewifê ye ku dest ji kişandina dinê û dûrketina ji tiştên dinyewî ye. Tesewif û zuhd pir caran bi hev re tên bikaranîn. Lewre di herduyan de jî mebesta hevpar ji masiwayê dûrketin e.

Weke helbestvanên klasîk Findikî jî mijara tesewif û zuhdê di helbestên xwe de pir bikaranîye.

Li gor Findikî, di nav teşqela jiyana dinyayê de, ya ku mirov tesellî dike Xudadarî ye. Muhîba rast û dostê baqî Xwedê Te'ala ye. Ew van hizr û hestên xwe jî bi vê malikê aniye ziman:

---

<sup>324</sup> Findikî, b.n., r. 151.

<sup>325</sup> Reşat Öngören, "Tasavvuf" *DİA*, c.40, weş. TDV, İstanbul 2011, r. 119.

...

بسه ژ بو ته خدایی ته بشون باف و برایی ته

دریژه ماجرایی ته خدا داری چه غمداری

Bes e j'bo te Xudâyê te bi şûn bâv û birâyê te

Dirêj e mâcerâyê te Xudâdâr î çi xemdâr î.<sup>326</sup>

Helbestvan dibêje ku ji bo çûyina axretê tiştê lazim teqwa ye ne xarin û vexwarina dinê ye:

...

ژبو ری زادی تقوایه نه نان و شکر و چایه

لنك اهل الله پیدا یه خدا داری چه غمداری

Ji bo rê zâdî teqwâ ye ne nân û şekir û çây e

Li nik ehlullah peydâ ye Xudâdâr î çi xemdâr î.<sup>327</sup>

Findikî paqijî û xalisiya dil ji musulmaniyê re weke mercekê dibîne:

...

مسلمانی بدف نابی بحرت و حرته چیناب

بیژ او کس بلا شابی کو صافی بی ژ ریای

Musulmânî bi dev nâbê bi hirt û hirtê çênâbê

Bibêj ew kes bilâ şâbê ku sâfî bî ji riyâyê<sup>328</sup>

Mutesewwif her tim nefsa xwe biçûk dibînin; ji ber ku Findikî jî helbestvanekî mutesewwif e zehfî caran di helbestên xwe de vê nefsbîçûkiyê tîne ziman:

...

نه از شیخم کو و عطفی کم نه مالدارم کو خیری کم

دو سی بیئا ازی چیکم ژ غیری فی ژ من نایی

<sup>326</sup> Findikî, b.n., r. 47.

<sup>327</sup> Findikî, b.n., r. 51.

<sup>328</sup> Findikî, b.n., r. 37.

Ne ez şêx im ku we'zê kim ne maldâr im ku xêrê kim

Du sê beytâ ezê çê kim ji xeyrê vê ji min nâyê

Fikra wî ya li ser mal û milkê dinê di asteke weset de ye. Herwekî dibêje ku mirov li gor qewanînê dinê ('adetullah) tevbigere wê mirov serkeftî bibe:

...

علی دنیا گلك باشه ژ ویرا کو نبه شاشه  
لپیش ریکی ندی پاشه کسی هابی خدی دابی

'Elî dunyâ gelek bâş e ji wî re ku nebî şaşê

Li pêş rêkî nedê pâşê kesê hâ bê, Xudê dâye<sup>329</sup>

Dîsa di helbesteke xwe de ji bo ehlê Xwedê û ji bo bêaqilan (xafil) ku dinya meta'eke çawa ye wê dibêje:

...

لنك اهلی خدی بیرك پطوط  
لنك بی عاقلان شنگ شپاله

Li nik ehlê Xudê pîrek peço e

Li nik bê'âqilan şeng û şepâl e<sup>330</sup>

Findikî, di malikeke xwe de dîsa li ser malê dinê disekine. "Li gorî wî, malê dinyayê lazim e ku bibe ramedan ji bo axretê. Ji ber vê yekê jî divê dinya ne bi kesbê lê bi qelb, bête terikandin."<sup>331</sup> Wiha dibêje ji bo malê dinyayê:

...

عذابه هر حرامی وی حسابه هر حلالی وی  
نبی قط تو هفالی وی چکو دوستانی ژى نایی

'Ezâb e her herâmê wî hisâb e her helâle wî

Nebê qet tu hevâlê wî çî ku dostânî jê nâyê<sup>332</sup>

---

<sup>329</sup> Findikî, b.n., r. 39.

<sup>330</sup> Findikî, b.n., r. 249.

<sup>331</sup> Ertekin, h.m., r. 490.



Wekî tê zanîn, di kesên zahid de meyla dinê exlebî tune ye. Yanî dilên wan bi dinê ve nînin. Ew her tim dinê di navbera xwe û Xwedê de wek astengekê dibînin. Ji ber vê yekê, Findikî jî di helbestên xwe de behsa terikandina dinê dike:

...

دنی ملکی کسی نینه چقا بی بخت و خایینه  
کسی گوه بدیی او دینه خو هنده برنده تیدا

Dinê mulkê kesî nîne çiqâ bêbext û xâyîn e  
Kesê guh bidyê ew dîn e xwe hinde bernede tê dâ<sup>333</sup>

...

کیفا دنی بی فیده یه وک خونکی بیهوده یه  
قبرا رشه مالا مه یه چاوا دنی هون گوه دنی

Keyfâ dinê bê feyde ye wek xewnekî beyhûde ye  
Qebrâ reş e mâlâ me ye çawâ dinê hûn guh dinê<sup>334</sup>

‘İlm û ‘emel jî di dîwana wî de cihekî taybet digire. Li gor wî ‘ilmê ku ‘emel pê neyêkirin, bê feyde ye:

...

فائیدا علمی عمل کرنه اگر نه چند پره  
دارا بی فیکى و سه فایدا ویه هیچه ای دلال

Fâidâ ‘ilmê ‘emel kirne eger ne çend pere  
Dâra bê fêkî û sih faydâ wê hîç e ey delâl<sup>335</sup>

Di tesewifê de qelb tecellîgaha Xwedê Teâla ye. Ji ber vê yekê lazim e ku qelb ji jenga masîwayê bê şuştin. Di dîwanê de jî wiha behsa vê rewşê tê kirin:

---

<sup>332</sup> Findikî, b.n., r. 35.

<sup>333</sup> Findikî, b.n., r. 21.

<sup>334</sup> Findikî, b.n., r. 79.

<sup>335</sup> Findikî, b.n., r. 93.

...

علی رابه حتا کنگی تو غافل بی بقی رنگی  
بشو قلبی ژ فی ژنگی هره ری راست د جعدیدا

‘Elî râbe hetâ kengê tu xâfil bî bi vê rengê  
Bişo qelbê ji vê jengê here rêrâst di ce‘dê dâ<sup>336</sup>

Di hin helbestên xwe de nefsa xwe biçûk dibîne û qisûrên wê tîne ziman:

...

ازى ژوانم نه از دوستك و فيمه  
همى كس من دزاني از على مه

E’jî j’wân im ne ez destek wefî me  
Hemî kes min dizânê ez ‘Elî me<sup>337</sup>

...

أه ناييژم أه صافيمه ژ دوستان  
يكن ام تف دقي لبيستك و بريدا

E’nâbêjim e’şâfî me ji dostan  
Yek in em tev di vê liystk û birê dâ<sup>338</sup>

...

عزماندريژى تو على ژهر تشتى تو دشته على  
حقى تيه ژبى عقلى مولته بديتن چند زلا

‘Ezmândirêj î tu ‘Elî j’her tiştê tu diştexilî  
Heqê te ye j’bê eqilî mû li te bidîtin çend zelâ.<sup>339</sup>

Li gor Findikî, ew kesê/a ku bi dinê re bibe dost û heval, ew kes dîn e:

...

گلك دینه گلك دینه گلك دین  
كسى ژیره ببت دوست و هقاله

<sup>336</sup> Findikî, b.n., r. 17.

<sup>337</sup> Findikî, b.n., r. 317.

<sup>338</sup> Findikî, b.n., r. 53.

<sup>339</sup> Findikî, b.n., r. 211.

Gelek dîn e gelek dîn e gelek dîn  
Kesê jê re bibit dost û hevâl e<sup>340</sup>

Mutesewwif, exlebi xefletê dişibihînin xewê. Divê ehlê Xwedê her tim ji wê xewê şiyar be. Findikî jî di helbestên xwe de wiha behsa xefletê dike:

...  
لازمه لسه مه كوام هشیار بین ژفی غفلتی  
ناگهی پاشیا دنی کس نه پیا ئو نه صوار

Lâzim e l'ser me ku em hişyar bibin j'vê xefletê  
Nâgihê paşyâ dinê kes ne peyâ û ne şiwâr.<sup>341</sup>

...  
بغفلت عمری مه بوری بتمامی  
نزام کنگی امی لحو ببنه هشیار

Bi xeflet 'umrê me bûrî b'temâmî  
Nizam kengî emê l'xwe bibne hişyâr<sup>342</sup>

Ji helbestên Findikî xisûsen ên bi navê “Ey ‘Elî Rabe j’Xewê” , “Bi Xeflet Umrê Me Bûrî b’Temamî”, “Ey ‘Elî Rabe Dereng e” , “Em Ketine Nav Kulafê vê Dinê da Hey Hewar” û “Gelî Brana Hawar e Sed Hawar e” ji aliyê tesewif û zuhdê ve mînakên giring in.

#### 4.1.3. Mirin (Wefat)

Wefata dost û ehfadan an jî wefata tiştên ku eşqa wan di dile mirovî de bi cih bûye mirovan pir xemgîn dike. Helbestvanan ev heqîqet her tim di helbestên xwe de anîne ziman. Yek ji wan helbestvanan jî Findikî ye ku heqîqeta mirinê di helbestên xwe de her tim dide bîranîn û me li gel zewal û fanîbûna dinê îqaz dike.

---

<sup>340</sup> Findikî, b.n., r. 247.

<sup>341</sup> Findikî, b.n., r. 217.

<sup>342</sup> Findikî, b.n., r. 185.

Di malikekê de dibêje ku mirov kîjan mertebeyê de be bila bibe, mirov ji mirinê xilas nabe:

...

د دنیائی هچی رابی فقیر و شیخ و اغابی

ژ بر مرنی خلاص نابی د شرق و هم د غربی دا

Di dunyâyê heçî râbê feqîr û şeyx û âxâ bê

Ji ber mirnê xilâs nâbê di şerq û hem di xerbê dâ<sup>343</sup>

Li gor Findikî mirin, ne tiştêkî xirab e; ew mihvantiya qebrê ye:

...

شف و روژی بهژمیری ژ عمری

حتا شفکی بیت مهفانی قبری

Şev û rojê bihêjmêrî ji ‘umrê

Hetâ şevkî bibit mihvânê qebrê<sup>344</sup>

Divê mirov ji bo mirinê her tim xwe amade bike lewre roj bi roj umrê mirov dibore û mirov nêzî mirinê dibe:

...

علی رابه وها نابی بحیل و پيله چینابی

عمور بوری مرن هابی چرا تدبیرکی ناکی

‘Elî râbe wihâ nâbê bi hîl û pîle çênâbê

‘Umur borî mirin hâ bê çirâ tedbîrekê nâkî<sup>345</sup>

Di malikeke xwe ya din de jî behsa heqîqeta mirinê dike û dibêje ku piştî mirinê her tişt ji destê mirov diçe û têne parçeyeke qumaş (kefen) dimîne:

---

<sup>343</sup> Findikî, b.n., r. 19.

<sup>344</sup> Findikî, b.n., r. 155.

<sup>345</sup> Findikî, b.n., r. 25.

...

اگر دنیا تماميله ببت ملكى ته بى حيله  
ژ غيرى جاوكى شيله ژ فى ملكى خلاص ناكى

Eger dunyâ temamlê bibit mulkê te bê hîle  
Ji xeyrê cawekî şîle ji vî mulkî xilas nâkî<sup>346</sup>

Li gorî helbestvan herkes wê bimre biçe lê heyf ji wî kesî re ku jidil tewbe  
nekiribe:

...

هرکسى بمرى بچى حشر و حساب جم خدى  
نبخوزى وى چو ژ دنيا و ژ دل توبه نکر

Her kesê bimrê biçe heşr û hîsâbê cem Xudê  
Ne b'xwezî wî çû ji dunyâ û ji dil tewbe nekir.<sup>347</sup>

Di dîwanê de xisûsen helbestên dawî ku li ser wefata hin kesan weke mersiye  
hatine nivîsîn:

Findikî, helbesteke neh malik li ser wefata Bedî'uzzeman Se'îdê Nursî<sup>348</sup>  
weke mersiye nivîsiye:

<sup>346</sup> Findikî, b.n., r. 27.

<sup>347</sup> Findikî, b.n., r. 133.

<sup>348</sup> Bedîuzzeman Se'îdê Nursî, di sala 1878 li bajarê Bidlîsê, navçeya Hîzanê, li gundê Nûrsê ji dayik bûye. Bavê wî sofî Mîrze, dêya wî jî Nûriye xanim e. Di zaroktiya xwe de li medreseyên deverê tehsîla ilmê kiriye. Di gel jîrbûn û serkeftîbûna xwe, di demeke kurt de bi alimbûna xwe navdar bûye û di nav gel de weke "Mela Se'îdê Meşhûr" hatiye binavkirin. Di wextê telebetiya xwe de, nod heb pirtûkên şerîetê jiber kiriye û pêşerojê de ev ji bo nivîsa tefsîra Risaleyê Nûr bûye bingehê. Se'îdê Nursî, di destpêka salên 1900î de çîqa hewl daye kû li rojava zanîngehek bi navê "Medresetü'z-Zehra" damezirîne jî lê ji ber derketina Şêrê Cîhanê Yekem, ev proje paşde maye. Wî bi telebê xwe re beşdarî Şêrê Cîhanê Yekem bûye û du salan li Rûsyayê êsîr bûye. Piştê ku ziviriye Stenbolê, buye serokê "Daru'l-Hikmeti'l-İslamiye"yê. Wî di tevgera welatperwerî de gelek xebat domandine. Piştî demekê wî dev ji van xebatan berdane û bi temamlî bi nivîs û weşandina Risaleyê Nûr re meşxul bûye. Ji ber ku nivîs û weşandina van Risaleyan ji aliyê rejîm û hukûmetê ve qedexe bûye; ew li gelek deran hatiye hepskirin û mişextin.

...

ای دلی مسکنی دردا ما تو زانی کو چه بی  
او سعیدی جان فدا ژ دینی مه را ژکیسی مه بی

Ey dilê meskenê derdâ mâ tu zânî ku çî bî  
Ew Se'îdê cânfidâ j' dînê me râ j'kîsê me bî

بیرقا کو وی هلانی ژبو فی دینی مبین  
مه چقا پرسى و سح کر فی دمی کس دی نبی

Beyreqa ku wî hilânî ji bo vî dînê mûbîn  
Me çîqâ pîrsî û seḥ kir vê demê kes dî nebî

چپرا دین گرتبو پاکی ژکسکی ندکر  
حق دزانی حق دگوتو حق دکر هر دم وه بی

Çeperâ dîn girtibû pâkî ji keskî nedikir  
Heq dizânî heq digot û heq dikir herdem we bî

او دکانا کو وی دانی او متاعی دفروت  
او دشام و مصر و بغدایی نهو پیدا نبی

Ew dikânâ ku wî dînê ew metâ'ê difiro  
Ew li Şâm û Mişr û Beḫdâyê nihû peydâ nebî

چو وفات کر چه مصیبت صد هزار رحمت لیسر  
ژ اهلی فی دینی مبینرا چه نمونک تازه بی

Çû wefat kir çî mûsîbet şed hezâr reḥmet li ser  
J'ehlê vî dînê mûbîn râ çî numûnek tâze bî

سیصد و هفتی و نهی پشتی هزارى هجرتی  
درگهی باغی بهشتا کرمی لبروی فبی

Sêşed û heftê w nehê piştî hezârê hicretê  
Dergehê bâxê bihiştâ keremê l'ber wî vebî

---

Piştî sala 1950an îdî ku weşandina Risleyê Nûra serbest bûne, li gelek weşanxane ya hatine weşandin. Seîdê Nursî, li Ruha yê di 23 adara sala 1960 de wefat kiriye. Wî piştî wefata xwe gelek berhem li pey xwe hiştine. Berhem û gotarên ku dema Meşrutiyetê de nivîsîne bi navê "Asar-ı Bed'îyye" yên ku weke tefsîr jî nivîsîne bi navê "Kulliyâta Risâleyê Nûr" hatiye binavkirin.

Ji bo agahiyên zêdetir bnr. <http://www.bediuzzamansaidnursi.org/hakkinda/biyografikisa>(15.03.2017)

او لنورسی هاته دنیا وی لآرفایی وفات کر  
او شهیر بو او بدیع بو از چه بیم سردسته بی

Ew li Nûrsê hâte dunyê wî li Urfâyê wefat kir  
Ew Şehîr bû ew Bedî' bû ez çi bêm serdeste bî

ای سعیدی هردو دنیا دتتا ته بو کدر  
ام خدایی خوه دخوازن لآخرتی ام لجم ته بی

Ey Se'îdê her du dunyâ dîtinâ te bû keder  
Em j' Xudâyê xwe dixwâzin l'axretê em l'cem te bî

ای علی گرچه سعید چو لی رسالی نور نچون  
صد امانت من لته دا تو ژ وان محروم نبی

Ey 'Elî ger çi Se'îd çû lê Risâlê nûr neçûn  
Şed emânet min li te dâ tu ji wân mehrûm nebî<sup>349</sup>

Findikî, sê heb helbestên bi navê “Ey Şahê Hilwe û Hedad”, “ ‘Elî Jara Tu Zanî Ma Çi Qewmî” û “Me Çiqa Pirsî û Seh Kir” li ser wefata Şêx Îbrahîm Heqiyê Basretî weke mersiye nivîsîne:

ای شاهی حلوه و حدّاد روحنیا چاچی دمن  
از دزانم پشستی ته لذت نما د عمری دمن

Ey şahê Hilwe û Heddâd roḥniyâ çavê di min  
Ez dizânim piştî te lezzet nemâ d'umrê di min

مه چه دیت و چه ندیت و دقئ عمری خوئی کن  
عسکری درد و غما هر دم هجومه ته لمن

Mi çi dît û çi nedît û di vî 'umrê xwe yê kin  
'Eskerê derd û xemâ herdem hucûmât e li min

مستری دردو غما بو چوینا شیجی عزیز  
گرچی من دیتن د دنیا یی مصیبات و حزن

Mesterê derd û xemâ bo çûyinâ şeyxê 'ezîz  
Ger çi min dîtin di dunyâyê muşbât û hezin<sup>350</sup>

<sup>349</sup> Findikî, b.n., r. 227.

...

Findikî helbesta xwe yê bi navê “Meded Seyda Meded Seyda”jî bi dilşewatî li ser wefata Şêx Seyda nivîsiye:

مدد سیدا مدد سیدا مه اطرافى دنى تیکدا

یکى وک ته نیو پيدا مدد سیدا مدد سیدا

Meded Seydâ meded Seydâ mi eṭrâfê dinê têk dâ

Yekî wek te nebû peydâ meded Seydâ meded Seydâ<sup>351</sup>

...

Di jiyana û helbestên Findikî de tê dîtin ku di navbera wî û şêxê wî de têkilîkî xurt hebûye. Hingî ewqas ku çar helbestan(8, 10, 48, 50) tenê ji bo wî nivîsiye. Bo mînak:

مدد سیدایی زنگانی بریژ فیضا وکی کانی

لقی قلبی قوی جانی ده بلکی بیته سر جادی

Meded Seydâyê Zengânî birêj feyḏâ wekî kânî

Li vî qelbê qewî cânî de belkî bête ser cādê<sup>352</sup>

...

Wefat û çûyina seydayê wî şewatekê pir giran dixwe dile wî ku ew helbesta xwe yê bi navê “ Meded Seyda Meded Seyda” de vê janê tîne ziman:

...

ژ هجرا بژن و بالایی وکی مجنونی لیلایی

دکم ناکم تبات نائی مدد سیدا مدد سیدا

Ji hicrâ bejn û bâlâyê wekî Mecnûnê Leylâyê

Dikim nâkim tu nây râyê meded Seydâ meded Seydâ

...

ازم مجنونی بی لیلی کتم بر پیل و بر سیلا

دکم هاوارو واویلا مدد سیدا مدد سیدا

---

<sup>350</sup> Findikî, b.n., r. 269.

<sup>351</sup> Findikî, b.n., r. 83.

<sup>352</sup> Findikî, b.n., r. 71.



Ez im Mecnûnê bê Leylâ ketim ber pêl û seylâ  
Dikim hâwâr û wâweylâ meded Seydâ meded Seydâ

...

عذابی ناری هجرانی اگر بیته وصف دانی  
کسی دیتی تتی زانی مدد سیدا مدد سیدا

‘Ezâbê nârê hicrânê eger bête weşifdânê  
Kesê dîtî tenê zânê meded Seydâ meded Seydâ<sup>353</sup>

...

#### 1.1.4. Bid‘et û Xurafe

Hinek baweriyên gel wek bid‘e û xurafe ne. “Bid‘et, têgiheke ku ji bawerî, ta’et, fikr û tevgerên piştî ‘esra seadetê derketine re tê gotin ku ew ji aliyê şerî’etê ve jî nehatine piştrastkirin.”<sup>354</sup>

Xurafe jî gelek caran bi bid‘etê re tê bilêvkirin lê ji bid‘eyê cudatir e. Ji pênaseyan tê digihêjin ku xurafe tevger û baweriyên betal e ku hîç bingehek wan ê mentiqî tune ye. Yanî xurafe û bid‘et di mentiqê de ji hev cuda dibin. Bid‘et hin caran ji mentiq û aqilekî an jî ji tecrubeyekê derketibe jî lê di xurafeyê de ev îhtîmal tune ye. Yanî xurafe ji baweriyên pûç pêk tê.

Di dîwanê de helbestekê seranser li ser vê mijarê hatiye nivîsîn. Findikî, geh bi zimanekî tûj geh bi zimanekî hîkemî u geh jî bi zimanekî henekî vê mijarê weke çîrokan vedibêje.

Seyid ‘Elî ji ber ku di mijara bid‘et û xurafeyan de xesas e, hin baweriyên herema xwe di helbesta 15an de tîne ziman:

...

ازی چیروکی بیژم گوه بدیره  
ژسر هاتیی منه او بی گمانه

Ezê çîrokî bêjim guh bidêre  
Ji serhatyê min e ew bêgumân e

<sup>353</sup> Findikî, b.n., r. 83-89.

<sup>354</sup> Rahmi Yaran, “Bid‘at” *DİA*, c.6, weş. TDV, İstanbul 1992, r. 129.

امی لمان ته دی يك هات ژردا  
نه وختی هاتنی چه بکم نزانه

Emê l'mâl in te dî yek hât ji der dâ  
Ne weqtê hâtinê çi'bkim nezân e

اوی بیژی تو زانی بو چه هاتم  
ژدوهقا چیلکا من زا نبانه

Ewê bêjî tu zânî bo çi hâtim  
Ji doh vâ çêlekâ min zâ nebân e

تو میزینه لکنبی چیکه ژیرا  
نقشتکی ام دبیزن او ژچاقانه

Tu meyzêne l'kitêbê çêke jê râ  
Nivîştî em bibêjin ew j'çevâ ne

دناقا ریخ و پیخیدا شف و روژ  
نقشت و چیلکی چه بسر هفانه

Di nâvâ rîx û pixê dâ şev û roj  
Nivîşt û çêlekê çi b'ser hevâ ne

Di heman helbestê de bi zimanekî tûj rexne li yên ku her gav û bê wext  
nivişta dixwazin dike û piştre wiha dewam dike:

دعا ام دی بکن توژی دعا که  
دعا باشن ژ درمانی خدانه

Du'â em dê bikin tu jî du'â ke  
Du'â bâş in ji dermânê Xudâ ne

Di vê malikê de giringiya du'ayê tîne ziman û wê pêşniyaz dike. Piştre jî ku  
bandora nivîştê bi çi awayî çêdibe û adaba wê çiyê di dewama heman helbestê de  
dibêje:

...  
نقشت باشن نه رمل و فال و تازیم  
دکن باور نکو ام ژ منکرانه

Nivişt bâş in ne reml û fâl û tâzîm  
Dikin bâwer ne ku em j' munkirâ ne

فقط چين بتعظيم و بشرى  
نه زنگل بن ژبو هر گاو کرانه

Feqet çê bin bi te'zîm û bi şer'ê  
Ne zengil bin ji bo her gâ'w kerâ ne

...

#### 4.1.5. Evîna Mecazî / Beşerî

Di dîwanê de tê dîtin ku Findikî ji xeynî helbestên dînî-tesewifî, helbestên şûxane jî nivîsîne. Ew di xezela xwe ya yekane ya ku bi navê “Xemrevînek Min Hebû”<sup>355</sup> de seranser behsa evîna mecazî dike.

Di vê helbestê de helbestvan evîna xwe bi gelek sifet û mezmûnan tewsîf dike û weke helbestvanên din bêzarbûna xwe ya ji jana ‘eşqê tîne zimên:

غمرفینک من هبو پرنازک و زیباخصال  
از ژوی دوربوم بتلبیسا رقیبا دین بطل

Xemrevînek<sup>356</sup> min hebû pur nâzik û zîbâxisâl<sup>357</sup>

Ez ji wê dûr bûm bi telbîsâ<sup>358</sup> reqîb<sup>359</sup> â dînbeţâl

از پزاندنم فرقتا وی نازکا شیریین کلام  
بی کسم نابت لمن قط پرسیار و هم سؤال

Ez pijandim firqetâ wê nâzikâ şîrînkêlâm<sup>360</sup>

Bêkes im nâbit li min qet pûrsiyâr û hem suâl

از بریندار و غریبم بی دوا و بی طبیبم  
کشتیی جورا رقیبم هیقیما من ذولجلال

<sup>355</sup> Findikî, b.n., r. 165.

<sup>356</sup> Xemrevîn: Kesê bi axivtinên xweş û şîrîn xema ji bîra mirovî di bit. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Kamêran Botî, *Ferhenga Kamêran*, weş. Spîrêz, Duhok, 2006.

<sup>357</sup> Zîbâxisâl: Xweştêbî'et.

<sup>358</sup> Telbîs: Hîle.

<sup>359</sup> Reqîb: Ew kasê/a dijmin ku dikeve navbera 'aşîq û me'sûqê.

<sup>360</sup> Şîrînkêlâm: Xweşsuhbet.

Ez birîndâr û xerîb im bêdewâ û bêtebîb im  
Kuştiyê cewrâ reqîb im hêviyâ min Zûlcelâl

Dûrketina ji dildarê kêrteke pir giran dixê dilê helbestvan û ew hertim  
dixwaze bigihêje dildara xwe:

هر دما تيته خيالم صحبت و بزما وصالم  
پر دنالم پر دکالم فرقتی کر مه هلال

Her demâ têtê xiyâlim suhbet û bezmâ wişâl im  
Pur dinâlim pur dikâlim<sup>361</sup> firqetê kir me hilâl

Li gorî helbestvan kesê ku dûrketinê tamijandibe wê bizanibe ku sa‘etek ji  
yarê dûrketin salek ji gihîştina wê dirêjtire:

وك على زانت کسی جامك ژ هجرانی فحوار  
ساعتك دورا فراقی پرتره ژصالا وصال

Wek ‘Elî zânit kesî câmek<sup>362</sup> ji hicrânê vexwâr  
Sâ‘etek dewrâ firâqê purtir e j’şâlâ wişâl

ای گلو دیسا دبیتن از ببینم دلبری  
دابستا دم لسر وقتی فراقی ارزو حال

Ey gelo dîsâ dibîtin ez bibînim dilberê  
Dâ bi destâ dim li ser weqtê firâqê erzûhâl

Helbestvan wisa bîriya yarê kiriye ku kê/kî mizgîniya gihîştinê jê re bîne wê  
ruhê xwe di dewsa mal û milkan de bidê:

هر کسی مزگینیا و صلی ژبو من ببینن  
روحی خوه از دی بدم ژیره د شونا ملک و مال

Herkesê mizgîniyâ weşlê ji bo min bînitin  
Ruhê xwe ez dê bidim jê re di şûnâ milk û mâl

<sup>361</sup> Dikâlim jî di vir de bi me‘na “dinalim” hatiye bikaranîn.

<sup>362</sup> Cam div ir de bi wateya qedehê hatiye bikaranîn.

Seyid ‘Eliyê Findikî di murebe‘â xwe ya bi navê “Gelî Dost û Hevalê Min”<sup>363</sup> de jî dîsa li ser mijara evînê disekine.

Findikî, di vê helbesta xwe ya evînê de jî exlebî behsa hicrana yarê û cewr û cefaya wê dike:

گلی دوست و هفالی من بکن پرس و سوائالی من  
ده هون بگرین لحوالی من تنی مامه د هجرانی

Gelî dost û hevâlê min bikin purs û suâlê min  
De hûn bigrîn li hâlê min tenê mâme di hicrânê

Helbestvan dibêje ku yara min e nazîdar û gul-sifet ne li cem min be wê çawa sebra min bê:

حبیب و نازدارا من طبیب و گلزارا من  
چوا بیتن هدارا من نبی حاضر لمیدانی

Ĥebîb û nâzîdârâ min ṭebîb û gul‘uzârâ<sup>364</sup> min  
Çewâ bêtin hedârâ<sup>365</sup> min nebê hâḍîr li meydânê

Helbestvan nalîna xwe dişibihîne nalîna nayê û gazinan ji dewranê dike:

ژ دوربونا ته زیبایی دنالم از وکی نایی  
وکی مجنونی لیلابی دکم گازند ژ دورانی

Ji dûrbûnâ te zîbâyê dinâlim ez wekî nâyê  
Wekî Mecnûnê Leylâyê<sup>366</sup> dikim gâzînd ji dewrânê

...

Di berdewama helbestê de jî reqîbê rexne dike ku reqîb her tim bi dijminahî wî ji yarê dûr dixê:

---

<sup>363</sup> Findikî, b.n., r. 97.

<sup>364</sup> Gul‘uzar: Taybetmendiyeke yarê ye ku tê me‘na “gul-sifet”ê.

<sup>365</sup> Hedar di vir de bi wateya sebir û rahetiyê hatiye bikaranîn.

<sup>366</sup> Di vir de helbestvan ‘eşqa destanî ya Leyla û Mecnûn tîne bîranîn.

...

رقيب ايواه ته از كشتم ژ محبوب ته از هشتم  
ژ بلگي رونقي ششتم وكي دارا زفستاني

Reqîb eywâh te ez kuştim ji mehbûbê te ez hiştim

Ji belgê rewneqî şîştim<sup>367</sup> wekî dârâ zivistânê

دكا بسكه ژفي ظلمي بکه جارك لمن حلمي

ته از كشتم بفي كلمي نهشتي بيمه ايواني

De kê bes ke ji vê zulmê bike cêrek li min hilmê

Te ez kuştim bi vê kilmê nehiştî bême eywânê<sup>368</sup>

...

Li gorî helbestvan xema ‘eşqê ew qas dijware ku dişibihe behrekî kûr ku mirov ça dike nika jê derê:

...

غما عشقي گلک زوره دبيژم بحرکي کوره  
فراق و وصلتي دوره مه اف رنگ دي ژ دوراني

Ûemâ ‘işqê gelek zor e dibêjim behrekî kûr e

Firâq û weşletê dûr e me ev reng dî ji dewrânê

علي بسكه ژ ناليني تو ناوستي ژ كاليني

صبر كه وك ممي زيني اوه درمان ژ طبخاني

‘Elî bes ke ji nâlnê tu nâwestî ji kâlnê

Şebir ke wek Memê Zînê<sup>369</sup> ew e dermân ji tîbxânê

#### 4.1.6. Hin Nameyên Taybet Ku Mijarên Cuda Dihewînin

Di diwanê de hin name hene ku wek helbest hatine nivîsîn. Hinek ji wan ji bo pirskirina hal û wextê, hinek ji bo pirozkirinê û hinek jî ji bo pirsên cuda weke bersiv û fetwa hatine nivîsîn.

<sup>367</sup> Di vir de helbestvan deng li reqîbê dike û dibêje ku te min ji belgên biriqî şuşt.

<sup>368</sup> Eywan di vir de bi wateya “ciyê ku yar li disekine” hatiye bikaranîn.

<sup>369</sup> Di vir de helbestvan ‘eşqa destanî ya Mem û Zînê tîne bîranîn.

Helbesta xwe ya bi navê “Selaman Dixwazim Dewamen Mudam”<sup>370</sup> ku ji nozdeh malikan pêk tê; bi armanca pirskirina hal û ehwalê Mela Necmeddîne Kercosî<sup>371</sup> nivîsiye. Emê bi çend malikan helbestê kurtvebirin:

سلامان دخوازم دواما مدام

ژ سر وه ژرب کریم سلام

Selâmân dixwâzim dewâmen mudâm

Ji ser we ji Rebbê Kerîmê Selâm

دعايان دخوازم دغيب و حضور

ژ بو وه ژ رب کریم غفور

Du‘âyân dixwâzim di xeyb û hûdûr

Ji bo we ji Rebbê Kerîmî Xefûr

دخوازم دعا هر دمام ژ وه

دکم داءما پرسا حالی هوه

Dixwâzim du‘â her demâdem ji we

Dikim dâimâ pursa hâlê hewe

د پشتی رجایاً دعا ام دکى

دبیژت ژبو وه علی فندکى

Di piştê ricâyâ du‘â em dikî

Dibêjît ji bo we ‘Elî Findikî

اگر هون دپرسن لحوالی مه

لطنگی و فراهى و کیفا دمه

Eger hûn dipursin li ehwâlê me

Li tengi’w firâhî we keyfâ di me

هزار حمد ژبو خالقى لاینام

کو ام راحتن کیف خوشن باتمام

Hezâr hemd ji bo Xâliqê lâyenâm

Ku em râhet in keyfxweş in bit-temâm

...

<sup>370</sup> Findikî, b.n., r.293.

<sup>371</sup> Mela Necmeddîn seydayê Seyid ‘Elî ye.

Helbesta xwe ya bi navê “Selama Dixwazim Li Ser We Bira”<sup>372</sup> de jî hal û ehwalê Seyid Zahirê Wanî<sup>373</sup> dipirse:

سلاما دخوازم لسر وه بيرا  
دکم پرس و حالی هچی کو لورا

Selâmâ dixwâzim li ser we birâ  
Dikim purs û hâlê heçî ku l’wirâ

بزانه مه مکتوب ژته لفر ستاند  
جوابا وی مکتوبی فه مه شیاند

Bizâne me mektûb ji te l’vir sitând  
Cewâbâ wê mektûbê ve me şiyând

اگر هون لحوالی مه پرسى دکن  
هزار حمد ژ خدایی خورا ام دکن

Eger hûn li hâlê me pursê dikin  
Hezâr hemd j’Xudâyê xwe râ em dikin

سلامت و صحت هیه مه نها  
اون تشتا ناڤ عالمیدا بها

Selâmet û siḥḥet heye me nihâ  
Ew in tişta nav ‘âlemê dâ bihâ

مه هیقی ژخدا کو ژ ورا ژى هین  
کو ساخ و سلامت ژى هون وک مه بن

Me hêvî j’Xudâ ku j’we râ jî hebin  
Ku sâx û selâmet jî hûn wek me bin

...

Seyid ‘Elî, helbestekê jî ji Mela Ehmed Eloyî<sup>374</sup> re ji bo hin daxwazên xwe nivîsiye:

<sup>372</sup> Findikî, b.n., r. 285.

<sup>373</sup> Seyid Zahir dostekî Seyid ‘Elî ye.

<sup>374</sup> Mela Ehmed Elo, muezzin û birêvebirê iqtisadê yê Şêx Seyda ye.



سلام سر ته ملا احمد بزحفي  
مه هيئي ژته تقي جار مه ندحفي

Selam ser te Melâ Eḥmed bi zeḥfi  
Me hêvî j' te tu vê car me nedeḥfi

تو بشيینه ژ مرا توزك ژ چایی  
چكو لجم مه نما صبرا مه نایی

Tu bişyîne j' me râ tozek ji çâyê  
Çikû l'cem me nemâ şebrâ me nâyê

لسوكی كيلو چو سه بانقنوطان  
نقام بويه ژ غير تجار و لوطان

Li sūkê kîlo çû sih banqenoṭân  
Neqâm bûye ji xeyr tuccâr û loṭân

امی دی ژى قبن لی هیدی هیدی  
تو فی نقلی بلبکی مه بکه هیدی

Emê dê jê vebin lê hêdî hêdî  
Tu vê neqlê bi libkî me bike hêdî<sup>375</sup>

Seyid 'Elî ji Muhammed 'Eṭayî<sup>376</sup> re ji bo jidayikbûna zaroka wî pîroz bike  
vê helbestê nivîsiye:

محمد عطا پر سلام سر ته بی  
دری خيرو خوشيی لسر ته قبی

Muḥammed 'Eṭâ pur selam ser te bê  
Derê xêr û xweşî li ser te vebê

مه سحكريه تشتك چه شیرين و خوش  
مه چاف بويه روحنی مه دل بويه گش

Me seḥ kirye tişteḱ çî şîrîn û xweş  
Me çav bûye rohnî me dil bûye geş

<sup>375</sup> Findikî, b.n., r. 290.

<sup>376</sup> Muhammed 'Eṭa kurê Şêx Seyda ye.

كو فرخك ته بون جوت بفضلا خودى  
خدا وان بهيلى بباب و بدى

Ku ferxik te bûn cot bi feqlâ Xudê  
Xudâ wan bihêlî bi bâb û bi dê

ببایر و پیرک بمام و بخال  
بکیف و بشاهی بعز و دلال

Bi bâpîr û pîrik bi mâm û bi xâl  
Bi keyf û bi şâhî bi ‘izz û delâl<sup>377</sup>

...

Seyid ‘Eliyê Findikî ji Hafîz Cemilî<sup>378</sup> re jî bi mebesta jidayikbûna zaroka wî  
pîroz bike vê helbesta li jêr nivîsiye:

سلاما خدا لسر ته بت ای جمیل  
ددنیا و اخری نبی تو ذلیل

Selâmâ Xudâ l’ser te bit ey Cemîl  
Di dunyâ û uxrâ nebî tu zelîl

چه مزگینیک خوش مه سح کر برا  
د مالا هوه روحنی بو یک چرا

Çi mizgîniyek xweş me seş kir birâ  
Di mâlâ hewe rohnî bû yek çirâ

بچوکه ژبونا وه دایه خدا  
خدا وی بهیلى بباب و بدا

Biçûkek ji bonâ we dâye Xudâ  
Xudâ wî bihêlî bi bâb û bi dâ

ژاولادی صالح بگرینی وی  
بشیطان و نفسی نه غرینی وی

Ji ewlâdê sâlih bigerînî wî  
Bi şeytân û nefsê nexirrînî wî<sup>379</sup>

<sup>377</sup> Findikî, b.n., r. 265.

<sup>378</sup> Cemil, muezzin û qesîdebêjê Şêx Seydayê Cizîrî ye.

<sup>379</sup> Findikî, b.n., r. 259.

...

Di helbesteke din de jî pirseke Hafîz Cemîlî li gor fîqha şer'î dibersivîne:

سلام سر ته جمیل تو هر جمیل بی  
نیاری ته دهر وقتی ذلیل بی

Selâm ser te Cemîl tu her cemîl bî  
Neyârê te di her weqtî zelîl bî

ژ آلتون چای ته صندوق هر تزی بی  
نصیبی دوستانی ته و مه ژ بی

Ji altûn çay te şundoq her tejî bî  
Neşîbê dositânî te'w me jî bî

بزانه تو برادر است و بی شك  
ژ هنگیقا نه چو ژ ببرا مه ایشك

Bizâne tu birâder râst û bêşek  
Ji hingê vâ neçû j' bîra me êşek

مه گو بلکی بویه صافی بپاکی  
ژ لورا تو ژکسی پرسپاری ناکی

Me go belkî bûye şâfî bi pâkî  
Ji lewrâ tu ji kes pûrsyârî nâkî

دوو لازم بدن شهده برسمی  
کو دستی ته لسر وی نینه ظلمی

Dido lâzim bidin şehde bi resmî  
Ku destê te li ser wî nîn e zûlmî

ویا ژ دڤ هر یکی ددو بیژن  
بلی بشرعی ژ بی او نطقی بریژن

Weyâ j' dev her yekî dido bibêjin  
Belê b' şer'ê ji ew nuţqê birêjin

دبت کافی کو فرعین يك ژ هردوان  
بین فرعین اوی دیتر ژ بی ای جان

Dibit kâfî ku fer‘ên yek ji herdwan

Bibin Fer‘eyn ewê dîtir jî ey cân

دقی حاکم بزانت شرطی هردو

تمیزا اصل و فرعاکت ژ هفتو

Divê hâkim bizânit şertê herdu

Temîzâ eşl û fer‘â kit ji hevdu<sup>380</sup>

...

Findikî helbesta xwe ya bi navê “Selamun ‘Eleykum Sukan-el Îzar”<sup>381</sup> ji bo ehlê gundê Îzar<sup>382</sup> nivîsiye. Seyid ‘Elî ji ber ku li gundê Îzar ê pir maye û ji gundiyan pir hezkiriye vê helbestê ji wan re bi silav û dia weke spasname nivîsiye:

...

سلام علیکم سکانا الاعزار

سکان الاعزار علیکم سلام

Li ser we selam bin ey ehlê Îzâr

Gelî ehlê Îzâr ser we bit selâm

سلام علی اهل مئواکم

الی ان تفوزوا بدار السّلام

Selâm bit li ser ehlê wârê hewe

Hetâ ku hûn biçine Dârus-Selâm

و بعد ففی الهجر ما قد مضی

فهل لجروح الفوائد التیام

Di pişt vê tiştâ ku li hicrê bûye

Ma saxbûn heye j’bo birînâ dilân

ولم یبق فی العمری من فسحة

فهل من ضیاء یزیل الظّلام

Di ‘umrêm nemâye qet tu firehî

Ma heye roniyek belav kit zelâm?

<sup>380</sup> Findikî, b.n., r. 223-225.

<sup>381</sup> Eslê vê helbestê erebî ye lê li Kurdî ve hatiye wergerandin.

<sup>382</sup> Îzar gundekî Kerboranê ye. Ev gund havîngeha Şêx Seyda bû.

فما ذا أقول و كيف أجول  
فضاق عليّ مجال الكلام

Ezê çî bêjim û ezê çâwa kim  
Jixwe l' min teng bûye mecâla kelâm

له الحمد دومًا على ما مضى  
عليّ حكيمٌ بما فى الانام

Spas j'wi râ bit bo tiştên buhurî  
'Elîm e Hekîm e bi yâ l'nâv kesân

فعمركم سيّدى فى المزيد  
وعيدكم كاسمكم بالدّوام

Mîrê min Xudâ 'umrê we dirêj bikit  
Cejnâ we wek nêvê we bit her dewâm

علىّ عليل علىّ ذليل  
كأن قد رأى ما رأى فى المنام

'Elî nexweş e hem 'Elî belengâz  
Tiştê dîtiye, wek dîtiye d'xewnân<sup>383</sup>

#### 4.2. Li Gorî Mijarê Cureya Helbestên Dîwanê

Çawa ku tê zanîn helbest, ji bandora hestekê xurt dertê holê. Helbestvan li ser kîjan mijarê dinivîse bila binivîse teqez bi hestekê wê mebesta xwe tîne ziman. Wek mînak, ew mijar ku 'eşq û mihebbet û hicran be, helbestvan bi kelecânî an dilşewatî dinivîse; lê ku mijar nerazîbûna tişteke be wê çaxê bi zimanekî tûj û rexneyî dinivîse.

Herwiha li gor mijar û hestê, helbest di şeş cureyan de tê dabeşkirin: 1. Helbestên Lîrîk, 2. Helbestên Epîk, 3. Helbestên Dîdaktîk, 4. Helbestên Xîrîk, 5. Helbestên Dramatîk û 6. Helbestên Pastoral.

Em di dîwanê de rastî helbestên epîk, pastoral û dramatîk nehatin. Ji ber vê yekê emê li gor sê cureyên din helbestên diwanê dabeş bikin:

---

<sup>383</sup> Findikî, b.n., r. 301.

#### 4.2.1. Helbestên Lîrîk (Kelecanî)

Helbestên ku li ser mijara ‘eşq, evîn û mihebbetê an jî liser mijara durketin û janê tê nivîsandin dikeve vê kategoriyê. Helbestvan, bi kelecanî û çoş û xiroşê hêstên xwe radigihîne xwendevanan.

Ji ber ku me di naveroka dîwanê de behsa mijara helbestan kiriye, em zêde li ser wan nasekinin. Têne emê li ser cureya helbestan rawestin.

Waxtê ku em bi gelemperî li dîwanê dinihêrin em di helbesta 8, 10,12, 14,16, 25,32, 39, 40, 41, 42, 43, 46, 47 û 48an de hesta lîrîzmê dibînin.

Di dîwanê de helbesta xwerû ku tê de lîrîzmeke evînî heye, helbesta bi navê “Xemrevînek Min Hebû”<sup>384</sup> ye ku wiha destpêdike:

غمرقینک من هبو پر نازک و زیبا خصال  
از ژوی دوربوم بتلیسا رقیب دین بطل

Xemrevînek min hebû pur nâzik û zîbaxişâl  
Ez ji wê dûr bûm bi telbîsâ reqîbê dînbeţâl

از پڑاندم فرقتا وی نازکا شیریین کلام  
بی کسم نابت لمن قط پرسیار و هم سؤال

Ez pijandim firqetâ wê nâzikâ şîrînkêlam  
Bêkes im nâbit li min qet pûrsiyâr û hem suâl

...

Di helbesta binavê “Gelî Dost û Hevalê Min”<sup>385</sup> de jî bandora lîrîzmê tê dîtin:

گلی دوست و هفالی من بکن پرس و سونالی من  
ده هون بگرین لحوالی من تنی مامه د هجرانی

Gelî dost û hevâlê min bikin pûrs û suâlê min  
De hûn bigrîn li hâlê min tenê mâme di hicrânê

حبیب و نازدارا من طیب و گلزارا من  
چوا بیتن هدارا من نبی حاضر لمیدانی

<sup>384</sup> Findikî, b.n., r. 165.

<sup>385</sup> Findikî, b.n., r. 97.

Ĥebîb û nâzidârâ min tebîb û gul‘uzârâ min  
Çewâ bêtin hedârâ min nebe ĥâdir li meydânê

...

Di helbesta “Ey Xurbetê Ey Xurbetê”<sup>386</sup> de em hestekî kûrê diltezîn dibînin:

ای غربتی ای غربتی ای غربتی ای غربتی  
ای غربتی ای غربتی ایواہ ژ دردی غربتی

Ey xurbetê ey xurbetê ey xurbetê ey xurbetê  
Ey xurbetê ey xurbetê eywâh ji derdê xurbetê

ام داغ کرن بداغا پزا ام کزخاندن وک رزا  
قبحت چه بو اف بو جزا ایواہ ژ دردی غربتی

Em dâx kirin b’ dâxâ pezâ em kezixândin wek rezâ<sup>387</sup>

Qibhet çi bû ev bû cezâ eywâh ji derdê xurbetê

قی غربتی ام پیر کرن بی رأی و بی تدبیر کرن  
باغ و برا ام ژبیر کرن ایواہ ژ دردی غربتی

Vê xurbetê em pîr kirin bê re’y û bêtedbîr kirin  
Bâv û birâ em j’bîr kirin eywâh ji derdê xurbetê

...

Di dîwanê de xisûsen helbestên dawî ku weke mersiye ji hin kesan re hatine nivîsîn jî dikeve vê kategoriyê:

Findikî, helbesteke kelecânî li ser wefata Bedî‘uzzeman Se’îdê Nursî weke mersiye nivîsiye:

...

ای دلی مسکنی دردا ما تو زانی کو چه بی  
او سعیدی جان فدا ژ دینی مه را ژکیسی مه بی

Ey dilê meskenê derdâ ma tu zânî ku çi bî  
Ew Se’îdê cânfidâ j’ dînê me râ j’kîsê me bî

<sup>386</sup> Findikî, b.n., r. 125.

<sup>387</sup> Rez: Zeviya ku mêw (darên tirî) lê hatine çandin û şên dibin.

...

ای سعیدی هر دو دنیا دتتا ته بو کدر  
ام خدایی خوه دخوازن لآخرتی ام لجم ته بی

Ey Se'îdê her du dunyâ dîtinâ te bû keder  
Em j' Xudâyê xwe dixwâzin l'axretê em l'cem te bi<sup>388</sup>

...

Findikî, sê mersiyeyên diltezîn bi navên “Ey Şahê Hilwe û Hedad”, “ ‘Elî Jara Tu Zanî Ma Çi Qewmî” û “Me Çiqa Pirsî û Seh Kir” li ser wefata Şêx Îbrahîm Heqiyê Basrefî nivîsîne:

ای شاهی حلوه و حدّاد روحنیا چاڤی دمن  
از دزانم پشستی ته لذت نما د عمری دمن

Ey şahê Hilwe û Heddâd roḥniyâ çavê di min  
Ez dizânim piştî te lezzet nemâ d'umrê di min

مه چه دیت و چه ندیت و دقئ عمری خوئی کن  
عسکری درد و غما هر دم هجومه ته لمن

Mî çî dît û çî nedît û di vî 'umrê xwe yê kin  
'Eskerê derd û xemâ herdem hucûmât e li min

مستری دردو غما بو چوینا شیجی عزیز  
گرچی من دیتن د دنیا بی مصیبات و حزن

Mesterê derd û xemâ bo çûyinâ şeyxê 'ezîz  
Ger çî min dîtin di dunyâyê muşbât û hezin<sup>389</sup>

...

Findikî helbesta xwe ya bi navê “Meded Seyda Meded Seyda”jî bi dilşewatî li ser wefata Şêx Seyda nivîsiye:

مدد سیدا مدد سیدا مه اطرافى دنى تیکدا  
یکی وک ته نیو پیدا مدد سیدا مدد سیدا

Meded Seydâ meded Seydâ mi eṭrâfê dinê têk dâ  
Yekî wek te nebû peydâ meded Seydâ meded Seydâ<sup>390</sup>

<sup>388</sup> Findikî, b.n., r. 227.

<sup>389</sup> Findikî, b.n., r. 269.



...

Di jîyan û helbestên Findikî de tê dîtin ku di navbera wî û şêxê wî de têkilîkî xurt hebûye. Hingî ew qas ku çar helbestan(8, 10, 48, 50) tenê ji bo wî nivîsiye. Bo mînak:

مدد سیدایی زنگانی بریژ فیضا وکی کانی  
لقی قلبی قوی جانی ده بلکی بیته سر جادی

Meded Seydâyê Zengânî birêj feydâ wekî kânî  
Li vî qelbê qewî cânî de belkî bête ser cêdê<sup>391</sup>

...

Wefat û çûyina seydayê wî şewatekê pir giran dixê dile wî ku ew helbesta xwe ya bi navê “ Meded Seyda Meded Seyda”<sup>392</sup> de vê janê tîne ziman:

ژ هجرا بژن و بالایی وکی مجنونی لیلابی  
دکم ناکم تبات نائی مدد سیدا مدد سیدا

Ji hicrâ bejn û bâlâyê wekî Mecnûnê Leylâyê  
Dikim nâkim tu nây râyê meded Seydâ meded Seydâ

...

ازم مجنونی بی لیلی کتم بر پیل و بر سیلا  
دکم هاوارو واویلا مدد سیدا مدد سیدا

Ez im Mecnûnê bê Leylâ ketim ber pêl û ber seylâ  
Dikim hawâr û wâweylâ meded Seydâ meded Seydâ

...

عذابی ناری هجرانی اگر بیته وصف دانی  
کسی دیتی تتی زانی مدد سیدا مدد سیدا

‘Ezâbê nârê hicrânê eger bête weşîfdânê  
Kesê dîtî tenê zânê meded Seydâ meded Seydâ

...

---

<sup>390</sup> Findikî, b.n., r. 83.

<sup>391</sup> Findikî, b.n., r. 71.

<sup>392</sup> Findikî, b.n., r. 83.

Findikî helbesta xwe ya bi navê “Me Hewar E Li Deryê Xewsê Geylan” jî bi sitem û dilşewatî ji Xewsê Geylan<sup>393</sup> re nivîsiye:

مه هواره لدریی غوئی گیلان  
هوار و صد هواره غوئی گیلان

Me hawâr e li deryê Xewsê Geylân  
Hawâr û şed hawâr e Xewsê Geylân

رزیل بو مه د نیف پی و دستی خلقی  
مجالا من توی ای غوئی گیلان

Rezîl bû me di nêv pê'w destê xelqê  
Mecâlâ min tu yî ey Xewsê Geylân

خوه تیشینی لسر اهلی خو هر کس  
اژی ژ اهلی ته مه ای غوئی گیلان

Xwe têşînê li ser ehlê xwe herkes  
E'jî j'ehlê te me ey Xewsê Geylân

دلی مه ژ کستییه از بی خویمه  
توی باف خویی من غوسی گیلان

Dilê mi şikestiyê ez bê xweyî me  
Tu wî bâv û xweyê min Xewsê Geylân

چقا از کتمة طنگی فی دمیدا  
بکه همت ژبو من غوسی گیلان

Çiqâ ez ketme ʧengî vê demê dâ  
Bike himmet ji bo min Xewsê Geylân<sup>394</sup>

---

<sup>393</sup> Navê wî yê eslî Ebû Salih Seyid Muhyedîn Evdilqadirê Geylanî ye. Ew, di sala 470an (1077an) di malbateke seyid de li gundekî herêma Gilanê ku li bakurê Îranê ye hatiye dinê. Damezirînerê terîqeta Qadirî ye. Ji bo xwendinê çûye Bexdayê û fiqih û şerî'etê li ser rêbaza Henbelî xwendiyê û bûye yek ji navdarên wê mezhebe. Dibêjin ku ew di tesewifê ango softiyê de, yek ji murîdên Cuneydê Bexdayî bûye. Hêj li heyatê bûye ku derbarê wî de gelek menqibe hatine gotin. Nasnav ango bernavkên wî ev in: Muhyeddîn, Sultanê Ewliyayan û Xews. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Ömür Ceylan, *Tasavvufî Şiir Şerhleri*, weş. Kapı, Çap.3., İstanbul 2007, r. 396.

<sup>394</sup> Findikî, b.n., r. 179-183.

#### 4.2.2. Helbestên Dîdaktîk (Şîretamîz)

Armanca van helbesta ew e ku ji xwendevanan re ramanekê diyarkirî ragihîne. Di van helbestan de agahdarkirin û fêrkirina xwendevan tê hedefkirin. Ji ber vê çendê jî cihê ku xwe lê digirin ne dilê mirovan e; mêjiyên wan e.”<sup>395</sup> Findikî di dîwana xwe de bi armanca ku nefsa xwe û nefsa mixatebên xwe ji xefletê şiyar bike û hin heqîqeta bi wan bide hisandin, helbestên şîretamîz bikaraniye.

Di dîwanê de ev helbest pir henin. Findikî bîst heba bi vê cureyê nivîsiye. Ev jî helbesta 1, 2, 3, 4, 5, 9, 11, 13, 17, 18, 23, 26, 27, 29, 30, 31, 36, 37, 50 û 51an e.

Seyid ‘Eliyê Findikî hin caran li nefsa xwe û hin caran jî li xwendevanên xwe şîretan dike. Emê çend minakan ji helbestên wî yê ku tê de li nefsa xwe şîret dike bidin:

...

علی رابه حتا کنگی تو غافل بی بئی رنگی  
بشو قلبی ژ فی ژنگی هره ری راست د جعدیدا

‘Elî râbe hetâ kengê tu xâfil bî bi vê rengê  
Bişo qelbê ji vê jengê here rêrast di ce`dê dâ<sup>396</sup>

...

تو بقی دنیا فانی نبه مغرور و بزبان  
تی ببی پوشمان یقینی کو تو دف ژ ی برندی

Tu bi vê dunyâya fânî nebe mexrûr û bizân  
Tê bibî pošman yeqînî ku tu dev jê bernedî<sup>397</sup>

...

علی دنیا گلك پیسه کچا ملعونی ابلیسه  
یقین آخرت دچی ژ کیسه کسی ژ دل بگری دنیا یی

‘Elî dunyâ gelek pîs e keçâ Mel`unê Iblîs e  
Yeqîn axret diçî ji kîse kesê j`dil bigrê dunyâyê<sup>398</sup>

<sup>395</sup> <http://kulilk.com/portal/node/16718> (01.04.2016)

<sup>396</sup> Findikî, b.n., r. 17.

<sup>397</sup> Findikî, b.n., r. 213.

<sup>398</sup> Findikî, b.n., r. 37.

Hin caran jî li xwendavan û dostên xwe şîretan dike û rêya teqwa yê nîşanê wan dide:

...  
توبه بکن گلکی بران ژ گونه و ذنبن گران  
قط گوه نندن ملک و پران هم لذت و مالی دنی

Tewbe bikin gelkî birân ji guneh û zembên girân  
Qeṭ guh nedin mulk û perân hem lezzet û mâlê dinê<sup>399</sup>

Li gorî wî hemî mulketa dinê di nezera însanê kamil de nahêje zerreyekê lûfta Xwedê:

...  
ملکتا دنیا دنی حمی تمامی سرتسر  
ناهیزی ذرک عنایت لی لنک اهلی کمال

Mulketâ dunyâ denî hemmî temâmî serteser  
Nâhêjê zerrek ‘inâyet lê li nik ehlê kemâl<sup>400</sup>

#### 4.2.3. Helbestên Satirîk (Rexneyî/ Tenkîdî)

Helbestên rexneyî, derbarê kesekî/ê û bûyerekê an jî ramanekê de bi rewşeke rexneyî tên nivîsîn.<sup>401</sup> Findikî çiqas ku helbestên şîretamîz bikaraniye ew qas jî helbestên rexneyî bikaranîne.

Findikî di Dîwana xwe de nozdeh heb helbesta bi vê cureyê nivîsîne. Ev jî helbesta 6, 7, 15, 18, 19, 20, 21, 24, 27, 28, 33, 34, 35, 38, 44, 45, 49, 50 û 52an e.

Seyid ‘Eliyê Findikî hin caran kesên dora xwe hin caran jî şêx û mela û dewrê rexne dike. Waxtê ku kesek an tiştek rexne dike carna zimanêke tûj carna jî zimanêke henekî bikartîne:

Hin helbestên ku tê de civakê û mirovên li dor xwe rexne dike:

---

<sup>399</sup> Findikî, b.n., r. 77.

<sup>400</sup> Findikî, b.n., r. 93.

<sup>401</sup> <http://kuliik.com/portal/node/16718> (01.04.2016)

...

حقیقت ام نبون دوستی حقیقی  
ژ لو صاری دخویی ژ هر دو آلی

Heqîqet em nebûn dostê heqîqî  
Ji lew şarî dixweyhê j'herdu âlî<sup>402</sup>

...

وفاء و دوستی چون بونه وندا  
نزانن ام بچینه لکی دریدا

Wefâ û dositî çûn bûne windâ  
Nizânin em biçîne l'kê derê dâ<sup>403</sup>

...

مه دهن دا کس بکس را نابی سیری  
دزیفا لعیشی خو هرکس دنیری

Mi dihn dâ kes bi kesrâ nâbê serî  
Dizî vâ l'îşê xwe herkes dinêrî<sup>404</sup>

Di helbestên xwe de şeyx û melayê ku li ser şerî'etê diçin û yên naçin dide berhev:

...

بقربانا ملا و شیخا مه صد جار  
اوی شرعا شریف ژ وارا نشانه

Bi qurbânâ melâ û şeyxa me şed câr  
Ewê şer'â şerîf j'wâ râ nişân e

نه او شیخ و ملا کو حیلہ بازن  
هنگ ظر شیخ و هنگی ظر ملا نه

Ne ew şeyx û melâ ku hîlebâz in  
Hinek zirşeyx û hinkî zirmelâ ne<sup>405</sup>

<sup>402</sup> Findikî, b.n., r. 57.

<sup>403</sup> Findikî, b.n., r. 53.

<sup>404</sup> Findikî, b.n., r. 149.

Di hin helbestên xwe de dibêje ku şeyx û mela rêberiya ummetê nekin û îşê nebaş bikin wê cahil jî ji rê derkevin:

...

شیخ و ملا کو ها بین جم هف سک و عیبدار بین  
جاهل دی بی هفسار بین گنه سطوی شیخ و ملا

Şeyx û melâ ku hâ bibin cem hev sik û ‘eybdâr bibin

Câhil dê bê hefsâr bibin guneh stuwê şeyx û melâ

...

هونن شقانی امتی کو هون بخو خوهر کن خطی  
جاهل دی چیکن حیجتی ژپی وه بین ترت و بلا

Hûn in şivânê ummetê ku hûn bi xwe xwehr kin xetê

Câhil dê çêkin hêcetê j’pey we bibin tert û belâ<sup>406</sup>

---

<sup>405</sup> Findikî, b.n., r. 119.

<sup>406</sup> Findikî, b.n., r. 201.

## ENCAM

Ev xebata me ya bi navê Jiyana Seyid ‘Eliyê Findikî û *Dîwana Wî* li ser jiyana helbestvan û hemî berhemên wî; ji aliyê teşe, ruxsar, ziman, şêwaz, hunerên belaxetê û nevarokê ve jî li ser lêkolîna dîwanê sekinî û di dawiyê de gihîşte van encaman:

1. Findikî di berhemên xwe de sê ziman bi kar anîne. Bi tevahî 8 berhem nivîsîne. 7 heb ji wan bi ‘Erebî; 1 jî *dîwana wî* ye ku, ji bilî 2 helbestên ‘Erebî û helbesteke farisî bi Kurdî (Kurmancî) ye. Ji vê jî diyar dibe ku Findikî di ‘Erebî û farisî yê de jî şareza ye.

2. Di dîwanê de 52 helbest hene ku 9 hebên wan qesîde; 12 hebên wan mesnewî û 31 hebên wan jî xezel in. Herwiha di dîwanê de 792 malik henin.

3. Findikî hemî helbestên xwe bi ‘erûzê ve nivîsîne. Di dîwanê de 4 cure behr hatine bikaranîn. Herwiha hemî helbestên dîwanê bi 6 qalibên ‘erûzê hatine nivîsîn. Behra ku zêdetirîn hatiye bikaranîn *behra hezec* e ku rêjeya wê %53,8 e, piştî *behra remel* e ku rêjeya wê %19,2 ye û dure *behra muteqarib* û *behra recez* e ku rêjeya herduwan jî %13,4 û %13,4 in.

4. Di qesîdeyên dîwanê de behra hezecê; di xezelan de behra remelê û di mesnewiyan de jî behra muteqarib û hezecê pir hatiye bikaranîn.

5. Findikî di helbestên xwe de zimanekî zelal û herikbar bikaraniye. Ev yek jî tewecuha xwendevanan zêde kiriye û *dîwana wî* heta niha 7 caran hatiye çap kirin.

6. Di *Dîwana Findikî* de bi qasî 35-40 heb hunerên belaxetê hene. Hunera ku zêdetirîn bi kar aniye hunera *teşbih (şibandin)* ê ye. Çendî ku diwanek sade nivîsîbe jî lê *dîwana wî* ji aliyê hunerên belaxetê ve dewlemend e.

7. Helbestên Findikî ji aliyê qafiye û weznê ve bi piranî di kevneşopa dîwanan de be jî lê ji aliyê tertîbê ve ne muretteb e.

8. Di helbestên Findikî de peyvên ‘Erebî, farisî û Tirkî hebe jî ev yek, zimanê dîwanê girantir nekiriye. Ji bilî biwêj û gotinên pêşiyên wî baweriyên gel jî bi kar anîne ku wê rengê gelêrî û folklorîk daye dîwanê.

9. *Dîwana Findikî* dîwaneke hîkemî ye. Ew mijarên dînî û tesewifî bi vegotîneke şîretamîz vegotiye.

10. Findikî di qesîdeyên dîwanê de bi piranî li ser mijara hîkmet û tesewifê disekine. Mesnewiyên xwe jî zefî cara ji dost û xizmên xwe re wek name nivîsiye. Wî ev name, hin caran ji bo pîroz kirinê, hin caran jî ji bo meseleyên cuda nivîsiye. Di xezelên xwe de jî xeynê evin û muhebbetê li ser temayên cur be cur sekiniye.

11. Ji ber ku Findikî pirî helbestên xwe bi mebesta şîret dayinê nivîsîne; wî zimanêke zelal bikar aniye.

12. Di helbestên Findikî yên rexneyî de ji tenkîdên şexsî bêhtir, tenkîdên civakî hene. Ev taybetî wî ji helbestvanên klasîkên din cuda dike.

13. Ji ber ku Findikî pirî caran bi zimanê gel axivîye û mijarên rojane bikar anîye, em dikarin bêjin ku ne ji bo hunere, wî ji bo gel nivîsiye. Ev yek jî wî ji helbestvanên klasîk cuda dike. Lewra helbestvanên klasîk bi gelemperî ji bo hunerê helbestên xwe nivîsîne.

14. Findikî, her çiqas di medreseyan de îlm tehsîl kiribe û xwenda be jî ev yek wî ji gel û mirovên der dora wî neqetandiye. Di helbestên wî de ji seydayan heta gundiyan gelek mirov tên dîtin. Ev yek jî wî ji helbestvanên klasîk cuda dike. Lewra pirî helbestvanên klasîk di helbestê xwe de behsa mirovên kodeman û navdar kirine.

15. Di dîwanê de baweriyên gel, gotinê pêşiyên û xasma biwêj pir in. Ev yek jî dide nîşan ku Findikî bi edebiyata gelêrî re jî pir têkildar bûye. Ev taybetiyeke balkêş e; lewra helbestvanên klasîkên ku wek Feqiyê Teyran di helbestên xwe de van hemanan bikaranîne pir kêman in.

16. Şêwaza çîrokî (tehkiye) di helbestên Findikî de xuya dike.

17. Teknîka monologê di helbestên Findikî de dixûyê. Ew hin caran bi xwe re peyiviye û şîretan li xwe kiriye.



## TABLOYÊN TEZÊ

**Tablo 1: Rêza Qesîdeyên Diwanê û Hejmara Malikan**

<b>Rêza Qesîde</b>	<b>Hejmara Malikan</b>
1	21
2	27
7	46
10	22
15	53
18	23
27	18
28	34
37	21

**Tablo 2: Rêza Mesnewiyên Diwanê û Hejmara Malikan**

<b>Rêza Mesnewiyê</b>	<b>Hejmara Malikan</b>
20	25
23	10
31	11
36	12
39	15
40	10
44	15
45	4
46	19
50	18
51	6
52	20

**Tablo 3: Rêza Xêzelên Diwanê û Hejmara Malikan**

<b>Rêza Xêzelê</b>	<b>Hejmara Malikan</b>
3	17
4	12
5	15
6	12
8	14
9	14
11	17
12	15
13	6
14	12
16	16
17	11
19	16
21	12
22	7
24	12
25	15
26	11
29	10
30	16

32	9
33	5
34	12
35	9
38	9
41	13
42	12
43	8
47	8
48	10
49	7

**Tablo 4: Behrên ‘Erûzê û Hejmara Helbestên Dîwanê**

<b>Behrên ‘Erûzê</b>	<b>Hejmara Helbestan</b>
<b>1. Behra Hezec</b>	
a. mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / mefâ‘îlun	9
b. mefâ‘îlun / mefâ‘îlun / fe‘ûlun	19
<b>2. Behra Remel</b>	
a. fâ‘ilâtun / fâ‘ilâtun / fâ‘ilâtun / fâ‘ilun	10
<b>3. Behra Recez</b>	
a. mustef‘ilun / mustef‘ilun	1
b. mustef‘ilun / mustef‘ilun / mustef‘ilun / mustef‘ilun	6
<b>4. Behra Muteqarib</b>	
a. fe‘ûlun/ fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûl	7

**Tablo 5: Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan**

<b>Herfa Qafiyeyê</b>	<b>Hejmara Helbestan</b>	<b>Rêza Helbestan a di Dîwanê de</b>
a, ı – ا	3	1, 6, 10,
r – ر	5	17, 26, 27, 30, 49
f – ف	1	24
l – ل	2	11, 22
m – م	1	47
n – ن	4	19, 25, 41, 43
h,e – ه	4	15, 34, 7, 51
la – لا	1	28
y ,î, ê – ي	22	2, 3, 4, 5, 7, 8, 9, 12, 16, 18, 20, 21, 23, 29, 31, 32, 33, 35, 38, 39, 42
tevlihev ( ? )	10	13,14, 36, 40, 44, 45, 46, 48, 49, 50, 52

**Tablo 6: Redîfên ku di Halê Qertafan de ne**

-ê: 44	-im: 7
-î: 50	-wî: 5
-e: 89	-in: 6
-a: 3	-ji: 1
-bî: 23	-ra: 2
-bê: 8	-ke: 4
-yî: 2	-ye: 14
-da: 2	-dê: 12
-nî: 1	-an: 2
-ba: 1	-yê: 2
-kî: 4	-ne: 17
-jê: 1	-du: 2
-dî: 5	-dar: 14
-it: 1	-and: 2
-kin: 4	-war: 2

**Tablo 7: Redîfên ku di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan de ne**

-dibî: 1	-ê te bin: 1
-pur kir: 1	-di min: 2
-ê xwe: 3	-a xwe me: 1
-ê da: 4	-navê min: 1
-û mal: 1	-înin: 2
-im ez: 1	-bit: 3
-na bim: 1	-an e: 3
-ê min: 1	-bikin: 2
-a min: 1	-kirin: 4
-nebaşed: 12	-nekir: 8
-xwe ye: 1	-vekir: 4
-ya xwe: 1	-danî: 3
-bûn: 1	-kanî: 2
-car: 1	-kanî: 2
-selam: 1	-zanî: 2
-me: 2	-zemanî: 2
-we: 1	-dikin: 4
-beyn: 1	-dibin: 3
-bûye: 1	-biçin: 3
-bibin: 2	-bin: 2
-bitin: 1	



**Tablo 8: Rêz û Lîsteya Biwêjên Dîwanê**

<b>Rêza Biwêjan</b>	<b>Rêza Helbestan</b>	<b>Rêza Malikan</b>
B'îhîle û du'ezmanî	4	5
B'hostayî xwe j'xelqê biçin	19	16
B'wî ava ye	8	2
Bêhnek ji cem camêrekî bê	6	2
Barê te gêr bûye newalê	27	17
Bawer dikin j'dil û hil	15	32
Bê dest û pê	15	2
Bê î'tibar û şar kirin	16	5
Bê îmdad û hewar	2	14
Bêperde û bêcax kirin	16	2
Bête ser cadê	8	1
Bi des hev va qe naçin nivê nanî	18	8
Bi hirt û hirtê çênabê	3	11
Bi nefsê ra bikî herbê	2	8
Bi qelbê xwe wek teht	1	20
Bi wî em nadine qurşek	7	7
Bi wê tavyê neçe rê da	4	4
Bibî nik wa şipûşar	27	5
Bibit mihvanê qebrê	20	21
Bidî bayê wekî kayê	3	13
Bide xatirê wan	36	8
Bigrê derê vê zererê	33	5
Bigrîn li hâlê min	12	1
Bihêjmirî durustê wî	10	10
Bila l'ber te nebin perde	4	3
Bila şed carî xwenda bî	6	11
Birêj feydê bişehkasê	10	17

Birêj fêydê wekî kanî	8	1
Birhê bide çayê	3	7
Bişo qelbê ji jengê	1	2
Bişo xwe j'ehlê dunyayê	4	1
Bixun fêkiyê 'umrê wî	39	5
Bixwe keda destê xwe	51	6
Canê xwe bisparim	2	14
Cerha bikim merhem	12	9
Çû bi 'erdê da	1	3
Derê tengî l'te Reb dadê	8	3
Derê xêr û xweşiyê li ser we vebit	39	12
Derî lê girêda	6	4
Derket herkes ji hêdê xwe	52	10
Destê me lê nabê şar	30	9
Destê xwe bavêje dawa murşîdek	11	14
Di bazara nêzîkî me nekir kar	27	8
Dibî dilgeş	1	11
Dibî keyfxweş	1	11
Dibî rûreş	1	11
Dibjin soza mêrê berê	21	10
Diçî j'kîse	3	8
Diçit ber bayê	3	15
Dikin l'hev hîl û bêbextî	3	10
Dilê mi şikestiyê	25	4
Dilê wî heyê	44	14
Dilê xwe j'vê dinê rakê	5	9
Dinê bavêj ji qelbê xwe	1	19
Dinê bike dûrbîn di destê xwe	1	19
Di qelbê xwe le'în rûnand	1	3
Dirêje macera wa	7	27
Dixenqim di qametek av	7	39
Dostiya xilaf û gerav	6	3

Dunyaperset	7	22
Ecel hat û kete pêşya muradê	42	2
Eger ji wan ra biherikî şubhê kanî	18	12
Em bûna goyînê şevê	16	8
Em firîn	52	4
Em ketine nava kulafê vê dinê	30	1
Em kirne şare	34	1
Ez gazî dikim li derê te	29	9
Ez li ber pêla kevîm	11	4
Geş bin bi hev ra wek gula	28	10
Giryê ewî l'halê me tê	16	10
Guh nedyê	3	9
Guhê wa wek dîwar e	34	2
Guneh û zenbên giran	9	1
Heçî hubba te dil mête	12	12
Heçî sal e dibêjî xwezka par e	34	5
Hema qet em dirêj nakî	2	12
Here rêrast	1	2
Hêstir dirêjim wekî tavîyê di baranê	13	13
Heyfa te mayê l'axretê	16	16
Hezar mani' bi hev ra têne rê	6	2
Hira-vêra nebûn	7	17
Hira-wêra nebûn	50	8
Hunê binnin wekî hirça sûtale	37	8
Îşê qehr û rehtî	6	4
J' destê me çû	33	1
J' herkes ra em binbar kirin	16	5
J' rih û şaşê fihê nakî	2	26
Jehr bigrî j' wê dostaniyê	21	6
Ji destê te heta hew bê	2	8
Ji dil rakî cuwê xwînê	12	6
Ji hicra te cegerxwîn im	10	2

Ji hicranê me aza ke	10	8
Ji hicrê min cegerxwîn e	12	10
Ji îqbala xwe kor	8	11
Ji rutba xwe ketin	37	5
Ji şubhê nabî êvarî	1	6
Ji wa ra me nekî lîs	23	3
Ji Xwedayê xwe re mêrxas bî	4	9
Karê wa ji rêya wa bînî xarê	34	3
Kes bi kesra nabê sêrî	20	4
Kesê goh bidyê	1	15
Ketî qeyd	7	43
Ketin j'ê	6	12
Ketme halê tengî	7	16
Ketne li bin bara	3	5
Ketye binê gêrê	8	12
Keyfa zelal	17	4
Kezeb pertî bû wek kunkê şeradê	42	4
Ku gava xwe ji xwe ew zêde tavên	15	36
Ku îro mayî ser cadê	10	13
Kula dil birêj	46	14
L'hêvya mirna xwe me	6	12
L'min teng bûye mecala kalam	47	5
Li dil hicra te bû pête	12	12
Li me roj bûne wek şêva	38	5
Li meydanê wekî şêr	2	21
Li ser rêka xwe kar nabî	1	7
Li vir hin na wellah l'vir	18	6
Li xwe bibne hişyar	26	1
Li xwe din bi du destan	3	4
Mame di teqn û heriyê	21	2
Mestir man li hebanê	15	40
Mîn eţrafê dinê tek da	10	1

Nakevit destê te	11	12
Ne lazim her çi zanim tev birêjim	20	14
Nebê hađir li meydanê	12	2
Nebe teslîm ji nefsê ra	4	11
Nedî des nefsê hefsarî	4	9
Neşo me j' defterê	48	7
Nezanê bê 'eqil jê ra bihar e	34	8
Pak û xweşmêr	2	21
Pakî ji kesî nedikir	32	3
Perşikestî	8	9
Pişt pê bê girêdan	7	15
Poşman bî sed halî	3	6
Qencî bûye qeħtî	38	7
Qencî jê fûrand	1	3
Qencî ji te nayê	3	14
Qiyamet ku li me rabî	4	12
Razê wekî zava	1	17
Reş girêdan	17	10
Rûreş bê	6	8
Şarî dixweyhê j' herdu alî	7	5
Serî j' me stand	37	1
Sêwiyê dîwar	26	10
Sûretê hal	7	36
Şirîntir bû ji bavê û dayê	42	3
Tam dît ji dunyayê	1	21
Te ez kuştim bi vê kulmê	12	5
Te l' gotinê ne l' kirinê	9	14
Tev xewda mane	15	43
Tu çiqa 'ezmandirêj î	24	12
Tu d' gotinê wek bilbilî	9	13
Tu dev jê bernedî	29	4
Tu ji destê xwe bikî	29	6

Tu ji dil bavêje wê	17	3
Tu napêjî	3	14
Tu nay rayê	1	21
Tu nemnî di heryê da	4	4
Tu sil î nabî kedî	29	3
Tu xweybext kî	8	13
Umur bûrand	1	3
Umrê wî borî d'vê gerê da	6	11
Vê şîretê li guhê xwe kin	9	2
Wek dirreha dêm ew dir in	16	12
Wek guryê har e	34	6
Weke kîso serê xwe kişande kalan	20	17
Wekî yexsîrê hebsê da	1	18
Wî dizanî ser û bin	41	5
Ûafil bî bi vê rengê	1	2
Xwe bişidîne wekî mêra	4	11
Xet nanivîsin l'mesterê	33	4
Xuda şerrî ji te bade	8	14
Xwe hinde bernede tê da	1	15
Xwe nakêşin bi mizana Xudayî	27	12
Xwelî li ser te	2	3
Xweş dibêjî lêbelê napêjî	11	17
Xweş ketiye li cihê xwe ye	28	6
Xweş tê	1	1
Yeqîn naçîte ber dêrî	10	20

## PÊVEK-1

### FERHENG

#### A

**Aqîbet:** dawî, encam.

#### B

**Baskî:** alî, (bi bal cîkî ve)

**Bê xered:** bê armancên şexsî û nefsî.

**Bedî':** bêhemta.

**Belan:** ciyê rast, deşt.

**Bertil:** rişwet.

**Beyaban:** çol

**Beyreqa rayê:** beyreqa qebulkirinê.

**Biçûkek:** zarokek.

**Biha:** biha, giran.

**Birhê bidê çayê:** pir çayê vexwe.

**Bişarê Çeto:** mêrekî mala Faro ye ku bi şervanî û lehengiya xwe navdar e.

**Bizdandin:** pir tirsandin.

**Bor:** di çeman de ciyê tenik (ne kûr) ku meriv tê re derbasî aliyê din dibe.

**Bost:** dirêjahiya an mezinahiya kefa destê.

**Buxd:** buxz, kîn.

#### C

**Cah:** xatir, qîmet.

**Caş:** hesinê ku ji bo parastinê li ber derî û pencereyan dixin.

**Cay:** cî, cih.

**Ce'de:** ji her rêyekê ku digihêje şahrê yê.

**Cedd:** bav û kal.

**Cenb:** alî, hêl, kenar.

**Cerh:** birîn.

**Cewr:** stem, neheqî.

**Cezb:** xwe windakirina di zikrê de.

## Ç

**Çeper:** sênc.

**Çeqandin:** standina bi hîle û xapandinê.

**Çîtik:** pişk, qur'e.

## D

**Dakî:** şîret qebûl kirin.

**Daru's-Selam:** navekî bihiştê ango ciyê ewlebûnê.

**Delâl:** rind, bedew û nazik.

**Denî:** bînpê, pespaye.

**Derbûmesel:** gotinê pêşyan.

**Derîzan:** şêmik, pêşiya derî.

**Dest û bira:** destebirak.

**Deste:** cur, celeb.

**Destegîr:** alîkar, piştevan.

**Dîmar:** wêranbûyî, helakbûyî.

**Doqîk:** çîv, darikê zirav (bi taybetî yê ku mirov pê heywanan diajo)

## E

**Ebleh:** ehmeq, bêhiş.

**'Eded:** hejmar

**'Ehd:** peyman, sond.

**Ehlullah:** ehlê Xwedê, kesên qenc.

**Ekmeltû:** ev îşaret bi bal ayeta "min ji we re dînê we kemiland" ve dike.

**'Eks:** dijîtî, înad, hesûdî.

**Elalet:** zar û zêç, xelq.

**'Elb:** firaçek gulover û bi çembil e ku ji textan hatiye çêkirin.



**Enqere:** teşqele, bela.

**Enzar:** nêrîn, raman.

**‘Erz:** şeref, namûs.

**Ewzar:** gunehên mezin.

**Exî:** bira.

**‘Eyal:** zar û zêç.

## **F**

**Fer‘:** şax, beş, ya ne eslî.

**Fêris:** 1.(dîrokî) şahsiwar, siwarî, şovalye, cengawerên bijare yên Serdema Navîn 2.(mecazî) cengawer, çeleng, qehreman, xweşmêr, camêr, bêtirs, zîrek, çalاک, ‘egîd, xurt, jêhatî.

**Ferxik:** zaro, zarok, biçûk.

**Find:** mum, çira.

**Fuad:** dil.

## **G**

**Gerav:** şîlo, ne zelal.

**Gêrevan:** gêlevan.

**Girofî:** xirecir, qelebalix.

## **H**

**Han:** hewar.

**Ĥecer:** kevir.

**Hêcet:** hêcet, bihane.

**Ĥettam:** kurtbûna gotina “heta em” ê ye.

**Ĥeyalî:** pijimariya hîleyê.

**Hicr:** xerîbî, dûrbûna ji yarê.

**Ĥilwe û Ĥeddad:** navê du gundên Qamişlo ne.

**Hira wîra:** virde wêde an jî filankes û bêvankes.

**Hubb:** evîn, muhebbet.

**Huđûr:** hazirbûn.

## I

**'Icac:** ba û bahoz.

## Î

**Î'lanî:** eşkere kirin.

**Înşaf:** wijdan, heqaniyet.

**Îqbal:** si'ûd, bext.

**Îrtîhal:** barkirin, koçkirin.

**Îxlaf:** zivirîna ji gotin û peyman ê.

**Îzar:** gundekî Kerboranê ye ku ev gund havîngeha Şêx Seyda bûye.

## J

**Jeng:** deleme, zeng.

**Jinûbî:** jinebî.

## K

**Kedî:** heywana ku hînî mirovan bûye.

**Kehrik:** bizinên temenbiçûk.

**Kerbelâ:** bajareke Iraqê ye ku ji bo misilmanan pîrozgehek e.

**Kesîr:** pir.

**Kesixandin/ Kezixandin:** birîna tirhan, jêkirina gulîyên biçûk.

**Kespik:** moriyê hişîn ê ku dixin stûyê heywanan.

**Keşşafê kurûb:** ê xeman vedike.

**Kiçik:** piçûk.

**Kiflet:** zar û zêç.

**Kîso:** kosî.

**Kizb û meyn:** bê vir û mir.

**Ku hinde:** ku evqas.

**Kuç:** kevir û ber.

**Kulaf:** pençe, lepên teyran.

**Kunk:** qul, qulik.

**Kupal:** gopal.

## L

**La yenam:** yê ku ranazê, yê ku jê re razan tune ye.

**La yezalî:** yê ku lêk naçe, winda nabe, xilas nabe.

**Le'b:** lîstik.

**Le'în:** ê/a hatiye le'netkirî, Şeytan.

**Lehw û le'b:** kêf û lîstik.

**Lîs:** hêlîn.

**Lixab:** bizmik, darikê yan zincîra ku devê ajelan pê tê girêdan.

**Lot:** dewlemendên mezin.

## M

**Me'sum:** kurê Seyid 'Eliyê navîn e.

**Medfen:** ciyê ku mirî lê tèn veşartin.

**Mehder:** şefa'et.

**Mehderçî:** mehdervan, şefa'etkar.

**Meḥîn:** hespên mê.

**Meḥsûb:** terefdar, alîgir, heval.

**Mêlak:** kezeb, cegera reş.

**Melalî:** acizî, ze'îfî.

**Mella:** melayê ku kar kirî, yê ku di qurekirinê de dibe yekemîn.

**Melû:** komikên paleyan yên ku ji çend qefdeyan çêdibin.

**Menahî:** tiştê ku hatiye nehîkirin.

**Meqber:** tirb.

**Meratib:** pirjimariya astê û rutbê.

**Mester:** rastek, cedwel.

**Meta‘:** pertal, malê ticaretê.

**Mexrûr:** pozbilind.

**Mişar:** birrek, didank.

**Mubîn:** eşkere, yê ku rastî û nerastiyê ji hev vediqetîne.

**Mudam:** daîmî, her tim.

**Muđir:** zirardar.

**Mulûk:** piraniya “melik” ê, padişah.

**Musteqîm:** rast.

## N

**Nâr:** agir.

**Neban:** heywana ku nahêle têjika wê şîrê wê bimêje.

**Nedeħfi:** red nekî.

**Neqam:** kêrahîya ku ji bejneke zêdetir e.

**Nesax/Nesağ:** nexweş.

**Nestêleh:** hêja, rind an berketî.

**Nevî:** nevê, nexwaze.

**Next:** qelen.

**Nezm:** helbest, menzûme.

**Nîşab:** gihêştina hedê zikatê.

**Nûjdar/Nijdar:** hekîm, pijîşk.

## P

**Pakî nedikir:** neditirsiya.

**Pale:** irxat.

**Paşehî:** paşî, dawî.

**Petot:** gelekî extiyar, riziyayî.

**Piçê:** piçek.

**Piştî:** barê ku li piştê tê hilgirtin.

**Pûng:** navê rehekekê ku dikeve nav xwarinê.

## Q

**Qalib:** cesed.

**Qar:** xisirî, yê ku di qurekirinê de ye.

**Qeff:** derketina ji avê bi keviyan ve.

**Qeḫfî:** xela.

**Qelq:** bêaramî.

**Qewî canî:** cînayetkar, gunehkar.

**Qîl û qal:** gotgotin, tiştên beredayî.

**Qîr:** qetran, asphalt.

**Qunca selamet:** ciyê ewlehiyê.

## R

**Rastûr:** hemen, di cih de.

**Reḫt:** meraqdar.

**Reml:** cureyekê falan e.

**Reng:** rewş, hal.

**Resm:** esl, usûl.

**Revd:** keriyê guran.

**Rêz û resm:** rêç û usûl.

**Rez:** zeviya ku mêw (darên tirî) lê hatine çandin û şên dibin.

**Rikin:** bingeh, binyad.

**Rim:** alavekê cengê ye.

**Riyaḫ:** mêrg.

## S

**Saḫibê xar:** xwediyê şikeftê; ango Muhemmed(s.x.l).

**Saḫibkemal:** bêkêmasî, bêqusûr.

**Sarî:** sarbûn.

**Sênc:** bend, asteng.

**Şerad:** cureyekê bêjingê ye.

**Serwîbostan:** bejinbilind.

**Sewad:** nivîsîn.

**Sewal:** heyvwanên li mal tên xwedîkirin, heywanên kedî/malî.

**Sexî:** comerd.

**Seyl:** lehî.

**Şihrebend:** 1.sihirbaz 2.şûrê îmamê ‘Elî ye.

**Sik:** kirh û nexweşik.

**Sinc:** nirx, hêja.

**Şipûşar:** bêqîmet.

**Şirr:** bayê pir sar, serma dijwar.

**Sukot:** sukût, dengnekirin.

**Sûtal:** paqrût, serseri.

Ş

**Şahê Zîbarî:** leqeba Mewlana Xalid e.

**Şehîr:** meşhûr, navdar.

**Şehkas:** tasa şahan, tasa bi qîmet.

**Şeht:** qels, ze’îf.

**Şekerxwend:** devbiken.

**Şepal:** xweşik, delal.

**Şêrê Kerrar:** ev leqeb ji bo Hz. ‘Elî hatiye bikaranîn.

**Şerq:** alê roj jê hil tê, rojhilat.

**Şeţ:** çemê mezin.

**Şeyn:** qisûr, kêmasî.

**Şubhet:** mîna, wek.

T

**Ṭavî:** teyrok, zîpik.

**Te'eb:** westîn, betilîn, reht bûn.  
**Te'emmul:** fikirîn, baldayîn.  
**Teħisîn:** şemitîn, ji rê ketin.  
**Teħt:** zinar, helan, lat, kevirên pan û mezin.  
**Teqwa:** îta'eta emrên Xwedê û terkkirina nehyên Wî.  
**Terîq:** rê.  
**Tert û bela:** belawela.  
**Ṭibxane:** dermanxane, eczane.  
**Ṭoṭak:** pepûk, reben.  
**Toz:** miqdarek hindik.

## U

**'Umr:** temen, salên jiyana kesekê/î.  
**'Uqba:** axret.

## V

**Vêl:** tişta ne kûr.

## W

**Wîrd:** dubarekirina zikr.

## X

**Xalî:** vala.  
**Xela:** tunetî.  
**Xelex:** qisûr.  
**Xezam:** pelên darê yên zerbûyî.  
**Xîlaf:** dijî.  
**Xirr û xalî:** vik û vala.  
**Xudanê Zulfekar:** xwediye zulfekarê; Hz. 'Elî.  
**Xudaya:** ey Xweda.

**Xwey Zulfeqar:** Îmamê ‘Elî.

**Û**

**Ûafil:** bêhay, bêagah, ji tişteki ne haydar, ne agahdar, ne serwest.

**Ûebr:** ax, xwelî.

**Ûedr:** neheqî, sitem.

**Ûenî:** maldar, dewlemend.

**Ûerb:** alê roj lê ava dibe, rojava.

**Ûesal (Ûessal):** kesê ku mirî dişo re tê gotin.

**Ûewwas:** kesê ku xwe berdide binê deryayê.

**Ûeyb:** nehazirbûn.

**Ûirrane:** pê xapiyan.

**Y**

**Yazûx:** heyf.

**Yexsîr:** êsir.

**Z**

**Zel:** lêdana bi destê vekirî, şeqam û sîle.

**Zelam:** tarî, tarîti.

**Zelîl:** belengaz.


**Zenb:** guneh.

**Zengan:** gundeki Torê ye, li ser qezaya Kerboran a Mêrdînê ye. Ev gund ciyê jidayikbûna Şêx Seyda ye.

**Zir:** 1.sexte, derewîn 2.netemam.


**Zunûb:** pirjimariya gunehan e.





Pêvek 1: Destxeta Seyid Abdurrehman Erzen

PÊVEK-3



Pêvek 2: Wêneyekê Dîwana Seyid 'Eliyê Findikî

## İNDEX

### Navên Taybet

- Bedûzzeman Seîdê Nûrsî, 93  
Behlul Beg, 15  
Celaleddîn ‘Elî, 13  
Cem Dilçin, 29  
Cemaleddîn Yusif, 13  
Cemîl, 106,107  
Cuneydê Beşdayî, 114  
Cüneyt Gökçe, 4, 156  
Dawid, 13  
Dr. Marif Xeznedar, 23, 24  
‘Ebdulkerîmî Muderîs, 23  
Ebû Salih Seyid Muhyedîn, 114  
Ebu Salih Seyyid Musa Cengîdost, 13  
‘Elaeddîn Secadî, 23  
‘Evdillah, 13  
‘Evdillah el-Mahd, 13  
Evdillah-II, 13  
Evdilqadirê Geylanî, 13, 114  
Fatma, 18  
Feqiyê Teyran, 49, 120, 153  
Hasan Çiftci, XI, 155, 156  
Hecî Fettahê Hezroyî, 15  
Hecî Selîmê Xettat, 17  
Hesen el-Musenna, 13  
Hesen el-Xetîb, 13  
Hz. ‘Elî, 13, 14, 142, 143  
Hz.Hesen, 10, 13  
Îmâm ‘Elî, 142, 144, 14  
Îskender Pala, 153, 156, 22, 29  
Komara Tirkiyeyê, 16  
Leylâ, 72, 96, 97, 101, 113  
M. Said Erzen, X, 3, 16, 19, 21, 153,  
155  
Mecnûn, 71, 72, 96, 97, 101, 113  
Mehmet Baba, 17  
Meşwî, 23  
Mela Ehmed Elo, 164  
Mela Hamid, 15  
Mela Huseynê Kiçik, 15  
Mela Îbrahîmê Korikî, 15  
Mela Îsmâîl, 15  
Mela Necmeddînê Kercosî, 15, 103  
Mela Remezan Botî, 16  
Mela Silêmanê Hoserî, 16  
Melâ Yaşûb, 15  
Melayê Cizîrî, 15, 19, 65, 154  
Mel‘unê İblîs, 54, 115  
Mem, 72, 102, 156  
Mesûm, 17  
Miftî Abdurrehman Erzen, XII, 3, 5,  
17, 18, 21, 145  
Miftî Mahmut Bilge, 17  
Miftî Seyid ‘Evdirrehman, 15  
Mihemed, 13  
Mihmedî Mela Kerîm, 23  
Mirarî Xanim, 12  
Muhemmed ‘Eta, 105  
Muşemmed Mustefâ, 17  
Muhyeddîn, 114  
Mûsa el-Cunî, 13  
Mûsa-II, 13  
Nûriye Dêrşewî, 15, 16  
Pêxember, 20, 23  
Qadî el-Beyzawî, 19  
Qurana Pîroz, 19  
Se‘îdê Nursî, 111  
Serdar Sabuncu, 4, 156, 16  
Seydâ, 39, 66, 91, 107, 108, 124, 125  
Seydâyê Zengânî, 50, 96, 113  
Seyid ‘Eliyê Findikî, VII, VIII, 27,  
127, 131, 164  
Seyid Abdurrahman Erzen, 28,29, 33  
Seyid ‘Elî, 4, 5, 10, 12, 13, 14, 15, 16,  
17, 18, 19, 20, 42, 103, 104  
Seyid Evdillah, 12  
Seyid Hesen el-Cunî, 13  
Seyid İbrahîm, 13  
Seyid Mecîd, 15  
Seyid Silêman, 12, 13  
Seyid ‘Umer, 13  
Seyid Zahirê Wanî, 104  
Sultanê Ewliyayan, 114  
Sureya Hûd, 19  
Sureya İbrahîm, 19

Sureya R'ed, 19  
Sureya Tewbê, 19  
Sureya Yunus, 19  
Sureya Yusuf, 19  
Sûriye, 16  
Şaban Karasakal, 20, 156  
Şêrê Kerrâr, 14, 142  
Şêx 'Evdillahê, 15  
Şêx 'Umer, 13  
Şêx 'Alemuddîn, 13  
Şêx Ebdulhakîmê Dêrşewî, 15  
Şêx Ehmed, 13  
Şêx 'Evdillah, 13  
Şêx 'Evdilqadir Geylanî, 13  
Şêx Ferecullah, 13  
Şêx Hesên, 12, 13  
Şêx Hesênê Findikî, 15, 16  
Şêx Îbrahîm, 13, 16, 95, 112  
Şêx Îmameddîn Hesên, 13  
Şêx Îsak, 13  
Şêx 'Îzuddîn, 13  
Şêx Kemal, 13  
Şêx Mihemed, 13, 15  
Şêx Nasreddîn, 13  
Şêx Nasrullah, 13  
Şêx Necmeddîn, 13  
Şêx Salih Zeynel'abidîn, 13  
Şêx Se'id, 15  
Şêx Seyda, 15, 16, 17, 18, 96, 104,  
105, 106, 108, 112, 138, 144, 155  
Şêx Siraceddîn, 13, 15  
Şêx Şehabeddîn, 13  
Şêx Şemseddîn, 13  
Şêx Taceddîn Ehmed, 13  
Tahir-ül Mevlevî, 50, 51, 52, 54, 59,  
70, 78  
Xewsê Geylan, 13, 114  
Xweyzulfeqâr, 14  
Yehya ez-Zahid, 13  
Yekta Saraç, 23, 24, 25, 26, 27, 28, 31,  
32, 51, 55, 56, 58, 59, 60, 67, 68,  
72, 73, 76, 154  
Zahir Ertekin, XI, 4, 44, 88, 155, 156,  
Zeyneb, 18  
Zîn, 72, 102, 156

## Navê Pirtûkan

- Açıklamalı Edebî Sanatlar, 61, 153  
Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü, 22, 153  
Asar-ı Bediyye, 94  
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 44, 155  
Def' u'ş-Şubuhât fi Nezmi't-Turrehât, 9, 19  
Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, 24,  
Dîwan, VII, XII, 1, 2, 3, 5, 17, 19, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 31, 38, 41, 42, 44, 50, 116,  
119, 121, 122, 123, 125, 126, 129  
Dîwanî Mehwî- Lêkdanewey û Lêkolînewey, 23  
Diyaret İslam Ansiklopedisi, 15, 29, 155, 156  
Dünden Bugüne Erzen Ailesi, 3, 13, 153  
Edebiyat Lügati, 50, 154  
El-İnsâf fi Cewâzi'z-Zekati ile'l-Eşrâf, 20  
Ferhenga Biwêjan, 35  
Ferhenga Kamêran, 99  
Gotinên Pêşîyan û Biwêj, 38  
Hewâşî 'elâ Tefsîri'l-Qadî el-Beydâwî, 9, 19  
Hewâşîn 'elâ Şerhi Dîwani'l-Cezerî, 19  
Klâsik Edebiyat Bilgisi Belâgat, 51  
Kulliyât, 4, 19, 20, 94  
Mecmu'âtu'r-Resâil, 4, 20, 21  
Örneklerle Türk Şiir Bilgisi, 29  
Rêzimana Kurmancî, 34  
Risaleyê Nûr, 93, 95  
Risâletu'l-Lem'e fi Î'âdetî'l-Cum'e, 20  
Risâletun fi Cewâzi Def'i'z-Zekâti Ilâ Benî Hâşim we'l-Muţţelib, 20  
Risâletun fi Necâti Ebeweyn'i-Nebî, 20  
Serwa- Lêkolîneweyekê Şikarê Berawerde le Şi'rê Kurdî, 23  
Zûlfîqarû 'Elî fi Reqebeti Munkiri'l-Istimdâdî mine'n-Nebîyyi ew Weliyyin, 21

## Navê Cihan

- Antaqya, 16  
Bafe, 15  
Bağlarbaşı, 16  
Basret, 16, 155,  
Batman, 12, 15  
Beşîrî, 15  
Beğda, 12, 114  
Botan, VII  
Cinibir, 13, 16, 17, 18  
Cizîr, 13, 16, 17, 18, 55  
Cizre, 5, 20, 21, 80, 155, 156  
Diyarbakır, 4  
Enqerê, 17  
Eruh, 12  
Erzen, 12, 13  
Farqîn, 15  
Findik, 13, 16  
Gercüş, 15  
Guvinan, 15  
Güçlükonak, 12, 15  
Harûnan, 15  
Hazro, 15  
Îdil, 15  
Înceler, 16  
İstanbul, 4, 5, 7, 13, 16, 20, 21, 22, 23,  
24, 29, 36, 50, 51, 61, 80, 87, 98,  
115, 152, 153, 154, 155, 156  
Îzâr, 108  
Kercos, 15, 103  
Korik, 15  
Kurtalan, 12,  
Mardîn, 4, 20,  
Mêrdîn, 144, 154  
Misirc, 12  
Qamişlo, 16, 137  
Qubîn, 12, 15  
Ruha, 94  
Serdehl, 15, 16  
Sêrt, 12, 13, 18  
Siirt, 4, 155  
Stenbol, 21, 34, 93  
Sulak, 15  
Tirkiye, 16, 154  
Xerzen, 12  
Xirabbajar, 12  
Yanarsu, 12  
Yeşilyurt, 13

## Navê Têgihan

- Aheng, VII, VIII, 28, 64, 65  
Alfabe, X, 5, 7, 39  
Aliterasyon, 65  
Ayet, 35, 41, 65, 71, 136  
Baweriyên Gel, VII, 97, 119, 120  
Behr, VII, XII, 25, 26, 102, 119, 125  
Bêje, XII, 7, 27, 28, 33, 44, 46, 53  
Berhem, VII, X, XIII, 1, 2, 3, 4, 8, 9, 10, 19, 20, 21, 34, 86, 119  
Bernavk, 10, 114  
Bid'et, 97  
Biwêj, 3, 8, 38, 48, 120, 121, 156  
Cinâs, 60, 61, 62, 63, 64, 65  
Cotpeyv, 44, 157  
Çavkanî, 4  
Daçek, 9, 50  
Deng, 6  
Dengdêr, 9  
Dergah, 157  
Dîdaktîk, 110, 115  
Dostanî, 81  
Edebî, 17, 21, 23, 24, 25, 35  
Edebiyat, 323, 50, 51, 156  
'Eks, 8, 60  
'Emel, 37, 38, 53, 90  
Evîn, 25, 110, 139  
Evîndarî, 25  
Farisî, 3, 16, 35, 40, 42  
Fehmbar, 2, 35, 46  
Ferâiz, 16, 157  
Ferheng, 3, 9, 76  
Gel, 2, 11, 21, 22, 23, 36, 37, 38, 47, 92, 94, 121  
Gotar, 5, 94, 157  
Gotinên Pêşyan, 3, 35, 36, 38, 39, 70, 120  
Helbest, 3, 4, 7, 8, 9, 22, 23, 24, 26, 39, 42, 84, 103, 110, 116, 120, 142  
Hezec, 26, 120  
Huner, 8, 57, 67, 74  
Hunerên Belaxetê, 3, 120  
Husnu't-Te'lîl, 72  
Intaq, 77  
Iqtibâs, 66  
Irsâd, 70  
Irsâla Mesel, 70  
Isti'âre, 56  
Îbare, 8  
Îcazet, 11, 16  
Îştîqâq, 67  
Jêrenot, 7, 8  
Kinâye, 58  
Klasîk, 2  
Kombêje, 8  
Kurdî, 2, 6, 9, 15, 21, 22, 23, 24, 25, 35, 36, 40, 42, 48, 50, 60, 61, 109, 120, 156, 157  
Lâ Yenam, 140  
Lâ Yezalî, 140  
Latînî, 4, 6, 7  
Le'în, 140  
Leff û Neşr, 73  
Lehw û Le'b, 140  
Lîrîk, 110  
Lûtf, 117  
Malik, 4, 11, 25, 32, 67, 84, 94, 120  
Mecâza Mursel, 57  
Menahî, 141  
Meratib, 141  
Mexles, 11, 12  
Mîjar, 2  
Musteqîm, 141  
Muteqarib, 26, 120  
Naverok, 2  
Nîda, 47  
Nuqte, 9  
Osmanlıca, 157  
Pastoral, 110  
Pênase, 8  
Peyv, 3, 7, 9, 38, 42, 50, 68, 73  
Postnişîn, 16  
Qalib, 2, 27

Qertaf, 33, 34  
 Qesîde, 2, 3, 23, 24, 26, 120  
 Qîl û Qâl, 12  
 Rastnivîs, 9  
 Rêbaz, 5  
 Recez, 26, 120  
 Reddu'l-'Acûz 'Ale's-Sadr, 68  
 Redîf, 33  
 Remel, 26, 120  
 Reqîb, 102, 111  
 Saħibê Xar, 143  
 Saħibkemal, 141  
 Satirîk, 110, 117  
 Seydâ, 28, 55, 80, 96, 97, 113, 114  
 Seyid, 2, 3, 4, 5, 7, 10, 11, 12, 13, 14,  
 15, 16, 17, 18, 20, 21, 22, 35, 36, 39,  
 42, 65, 72, 81, 86, 98, 101, 103, 104,  
 105, 106, 107, 109, 115, 116, 117,  
 120, 141, 148, 156, 158  
 Siħra Helâl, 75  
 Siħrebend, 143  
 Sultanê Ewliyayan, 115  
 Şêwaz, VII, X, 2, 34, 46, 47, 119, 120  
 Tatar, 12, 13  
 Tecâhula 'Arif, 70  
 Tefrîq, 74  
 Tehkiye VII, 47, 120  
 Tekrîr, 46, 68, 69  
 Telbîs, 99, 110  
 Telmî', 59  
 Tema, 1, 3, 36, 23, 81, 91, 120  
 Tenâsûb, 70  
 Terdîd, 80  
 Terîqet, 10, 16, 114  
 Te'rîz, 58  
 Tersî', 66  
 Tertîb, 2, 22, 31, 32, 119  
 Tesewif, 16, 19, 24, 41, 86, 89, 91, 99,  
 114, 119, 120  
 Teşbîh, 46, 50, 51, 52, 54, 55  
 Teşeyên Nezmê, 1, 2, 22, 24, 31  
 Teşxîs, 77  
 Tezâd, 73  
 Tezmîn, 64, 65  
 Tîp, X, 3, 5, 7, 8, 22, 27, 60, 61, 62,  
 63, 65  
 Tirkî, 2, 5, 12, 15, 16, 34, 39, 42, 48,  
 119  
 Transkirîpsiyon, X, 5  
 Wezna 'Erûzê, VII, 8, 22  
 Xêzel, VII, XII, 1, 2, 22, 24, 25, 26,  
 32, 99, 119, 120, 123  
 Zanistî, 1, 2, 5  
 Zibâxişâl, 32, 110  
 Ziman, VII, X, 1, 2, 15, 19, 21, 34, 38,  
 34, 36, 39, 40, 41, 42, 44, 46, 52,  
 58, 59, 86, 87, 90, 91, 96, 97, 98,  
 109, 113, 116, 119, 120  
 Zuhd, 86, 91  
 Zûlfiqar, 21



## ÇAVKANÎ

### Pirtûk:

Aydoğan Mistefa, *Rêbera Rastnivîsînê*, weş. Rûpel, Çap.1., İstanbul 2012.

Bolelli, Nusrettin: *Belâgat (Beyan-Meanî-Bedî İlimleri)*, weş. İFAV., İstanbul 2015.

Ceylan, Ömür: *Tasavvufî Şiir Şerhleri*, weş. Kapı, Çap.3., İstanbul 2007.

Çiftci, Hasan: *Uygulamalı Farsça Grameri (Gramer-Metin-Sözlük)*, weş. Eser, Çap.2., Erzurum 2013.

Dilçin, Cem: *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, weş. TDK., Çap.4., Ankara 1997.

Erzen, M. Said: *Dünden Bugüne Erzen Ailesi*, weş. Kilim, İstanbul 2007.

Işık, S. İbrahim: *A'dan Z'ye Kürtler, Kişiler-Kavramlar-Kurumlar*, weş. Nûbihar, Çap.4., İstanbul 2015.

İpekten, Haluk: *Eski Türk Edebiyatı, Nazım Şekilleri ve Aruz*, weş. Dergâh, Çap. 12., İstanbul 2010.

Kocakaplan, İsa: *Açıklamalı Edebi Sanatlar*, weş. Türk Edebiyatı Vakfı, İstanbul 2014.

Komisyon: *Eski Türk Edebiyatı El Kitabı*, weş. Grafiker, Çap.5., Ankara 2009.

Komisyon: *Üniversiteliler İçin Eski Türk Edebiyatına Giriş*, weş. Akçağ, Ankara 2010.

Pala, İskender: *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Akçağ, Çap.3., Ankara 1995.

Pala, İskender: *Divan Edebiyatı*, weş. Kapı, Çap.13., İstanbul 2010.

Sadinî, M. Xalid: *Feqiyê Teyran- Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, weş. Nûbihar, Çap 8., İstanbul 2014.

Saraç, Yekta: *Klâsik Edebiyat Bilgisi Belâgat*, weş. Gökkubbe, Çap.13., İstanbul 2015.

\_\_\_\_\_ : *Klâsik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, weş. Gökkubbe, Çap.9., İstanbul 2015.

Seyid ‘Eliyê Findikî: *Dîwan*, weş. Nûbihar, İstanbul 2012.

Tahir-ül Mevlevî: *Edebiyat Lügatı*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994.

Turan, Abdulkaki: *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, weş. Nûbahar, İstanbul 2010.

Üstüner, Kaplan: *Divan Şiirinde Tasavvuf*, weş. Birleşik, Ankara 2007.

### **Ferheng:**

Bingöl, Abdulkadir: *Gotinên Pêşîyan û Biwêj*, weş. Na, İzmir 2014.

Borak, Mustafa: *Ferhenga Biwêjan*, weş. Enstîtuya Kurdî, Çap.1., Stenbol 2005.

Farqîni, Zana: *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2007.

Karataş, Turan: *Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü*, weş. Yedigece, İstanbul 2001.

*Kürtçe-Türkçe Cep Sözlüğü*, weş. Doz, Çap. 5., İstanbul 2012.

Sami, Şemseddin: *Kamus-ı Turki*, (Osmanlıca Tıpkıbasım), weş. Çağrı, İstanbul 2006.

### **Tez:**

Aykaç, Yakup: *Dîwana Hezîn Metn û Lêkolîn û Ferheng*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Çewlig 2015.

Beyter, Önder: *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013.

İlhan, Ziver: *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013.

### **Gotar û Hevpeyvîn:**

Açar Zafer-Ertekin M. Zahir: “Di Kurmancî de Cotpeyv û Cureyên Wan”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, c.1, j.1, r. 82-92. Çile 2015.

Açıkgenç, Alparslan: “Said Nursî”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c.35, weş. TDV, r. 565-572. İstanbul 2008.

Adak, Abdurrahman: “Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola Wî di Edebîyata Kurdî de”, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul 2012.

Bardakoğlu, Ali: “Ferâiz”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c.12, weş. TDV, İstanbul 1995.

Baz, İbrahim: “Cumhuriyetin İlk Yıllarında Irak ve Suriye’ye Göçen Cizreli Âlim ve Sûfîler”, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul 2012.

\_\_\_\_\_ : “Mevlânâ Hâlid-i Bağdâdî’nin Halifelerinden Şeyh Hâlid-i Cezerî ve Basret Dergâhı”, *Tasavvuf İlmî ve Akademik Araştırma Dergisi*, j.32, r. 139-167. Sibet 2013.

Çiftci, Hasan: “Klasik İslâm Edebiyatında Hiciv ve Mizah I”, *Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, j.10, r. 139-162. Erzurum 1998.

\_\_\_\_\_ : “Klasik İslâm Edebiyatında Hiciv ve Mizah II”, *Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, j.10, r. 172-181. Erzurum 1998.

Durmuş İsmail, Öztürk Mürsel, Pala İskender: “Kafiye” *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c.24, weş. TDV, İstanbul 2001.

Ertekin, M. Zahir: “Naveroka Helbestên Seyid ‘Eliyê Findikî”, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul 2012.

Gökçe, Cüneyt: “Seyyid Ali Findikî ve Divân’ı” *İbrahim Hakkı ve Siirt Uleması Sempozyumu*, weş. Beyan, İstanbul 2008.

Karasakal, Şaban: “Seyyid Ali Findikî ve Kâdı Beydâvî’ye Haşiyeleri”, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul 2012.

Öngören, Reşat: “Tasavvuf ” *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, c.40, weş. TDV, İstanbul 2011.

Özdirek, Recep: “Cumhuriyet Dönemi Cizre Bölgesi Din Âlimleri”, *Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul 2012.

\_\_\_\_\_ : “Cumhuriyet Döneminde Şırnak Bölgesinde Yaşayan Âlimlerin Fıkıhla İlgili Eserlerinin Değerlendirmesi”, *Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu*, weş. Şırnak Üniversitesi, Ankara 2010.

Sabuncu, Serdar: “Seyda Seyyid Ali Findikî’nin Hayatı ve Tasavvufi Kişiliği”, *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, c.8, j.1., 2016.

Tek, Ayhan: “Mem û Zîn ve Hüsn ü Aşk Karşılaştırması Bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar”, *Varlık Dergisi*, j: 1248, r. 10-16. İlon 2011.

Tek, Ayhan: “Klasik Dönem Kürt Edebiyatı Üzerine Notlar”, *Ansiklopediye Daîretu'l-Me'arifi Bozorge İslamî*, Tehran 2013.

**Çavkaniyên Dîjîtal:**

<http://komanubihar.org/kurmanci/?p=926> (10.04.2016)

<http://kulilk.com/portal/node/16718> (01.04.2016)

<http://www.bediuzzamansaidnursi.org/hakkinda/biyografi-kisa>(15.03.2017)

